

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND



ÎQTÎBAS DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DA
(HELBESTÊN MELAYÊ CİZÎRÎ, FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ Û
MELAYÊ BATEYÎ)

AMADEKAR

Veysi İNCİ

VAN-2020

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

ÎQTÎBAS DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DA
(HELBESTÊN MELAYÊ CİZİRÎ, FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ Û
MELAYÊ BATEYÎ)



AMADEKAR

Veysi İNCİ

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2020

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



YÜKSEK LİSANS TEZİ

KLASİK KÜRT EDEBİYATINDA İKTİBAS SANATI
(MELAYÊ CİZİRÎ, FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ VE MELAYÊ
BATEYÎ ŞİİRLERİNDE)



HAZIRLAYAN

Veysi İNCİ

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2020

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Veysi İNCİ tarafından hazırlanan “İQTİBAS DI EDEBİYATA KURDÎ YA KLASİK DA (Helbestên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xani û Melayê Bateyî)” adlı bu çalışma, 13/01/2020 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) :Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.


Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ
Enstitü Müdürü

NAVEROK

KURTE	VIII
ÖZET	X
SUMMARY	XII
DESTPÊK	1
Mijar, Armanc û Giringîya Lêkolînê	1
Rêbazên Lêkolînê	2
1. HÛNERA ÎQTÎBASÊ	4
1.1. Cureyên Îqtîbasê	5
1.1.1. Îqtîbasa Temam	5
1.1.2. Îqtîbasa Naqis (Îqtîbasa Kêm)	5
1.1.4. Îqtîbasa Mustehcen	7
2. HUNERA ÎQTÎBASÊ DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DA	8
2.1. Hunera Îqtîbasê di Dîwana Melayê Cizîrî da	8
2.1.1. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Tewhîd û Senayê Xwedê da .	8
2.1.2. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Muhammed Pêxember da ..	10
2.1.3. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Qur'ana Pîroz da	13
2.1.4. Îqtîbasên Ayetên di Derbareyê Qisseyên Pêxemberan da	14
2.1.5. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Âdem Pêxember da	14
2.1.6. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Îbrahîm Pêxember da	15
2.1.7. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da	19
2.1.8. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ehlê Sebe yê da	21
2.1.9. Ayetên derbarê Qal û Belayê da	22
2.1.10. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Hecê da	24
2.1.11. Îqtîbasên Ayetên Derbarê Melekê. Cibrîl (Melekê Wehyê) da	25
2.1.12. Ayetên Di Derbareyê Stêrkên Asîmanan Da	26
2.1.13. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Bihûştê da	27
2.1.14. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên Di Derbarê Afirandina Ademîyan da ...	27
2.1.15. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Navên Suretê Qur'an ê da	29
2.1.16. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Cehennemê da	32

2.1.17.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ehlê Sidq û Teqwayê da.....	33
2.1.18.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarên Îsmên Xwedê da.....	35
2.1.19.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê ‘Eqil da	36
2.1.20.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Nûra Xwedê da	37
2.1.21.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Du‘ayên Kafiran da	38
2.1.22.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Şeva Leyletul Qedrê da	39
2.2.	Hunera Îqtîbasê di Helbestên Feqîyê Teyran da	40
2.2.1.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Rehmet û Dilovîniya Xwedê da	40
2.2.2.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Afirandina Însanan da	42
2.2.3.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Tewhîda Zatê Xwedê da.....	43
2.2.4.	Îqtîbasên Ayetê di Derbarê Poşmaniya Înkarmedan da	44
2.2.5.	Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da	44
2.3.	Hunera Îqtîbasê di Helbestên Xanî da	46
2.3.2.	Hunera Îqtîbasê di Memû Zîna Ehmedê Xanî da.....	46
2.3.3.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Navê Xwedê da.....	46
2.3.4.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Qur’ana Pîroz da	46
2.3.5.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Qudret û Kiryarên Xwedê da.....	47
2.3.6.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Nasîna Zatê Xwedê da.....	50
2.3.7.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Alîkariya Xwedê ji bo Bawermendan da	52
2.3.8.	Îqtîbasên Ayet û hedîsên di Derbarê Muhammed Pêxember da..	53
2.3.9.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Dilsoziya Evîna Xwedê da.....	56
2.3.10.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê ‘Alema Ruhana da	57
2.3.11.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da	58
2.3.12.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Nûra Xwedê da	58
2.3.13.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Munafiqan da.....	59
2.3.14.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Fermana Xwedê û Nefsa Mutmeînne da	60
2.3.15.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Eshabê Kehf da	61
2.3.16.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Xwe amedekariya ji bo Mirinê da	62
2.3.17.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Halê Kafirên Dojehê da.....	63
2.3.18.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Şeraba Ehlê Bihuştê da	64

2.3.19.	Hûnera Îqtîbasê di Dîwana Ehmedê Xanî da	65
2.3.20.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ke'be da.....	65
2.3.21.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Yusuf Pêxember da.....	65
2.3.22.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Melayêketan da	66
2.3.23.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Afirandina Ademîzadan da	67
2.4.	Hunera Îqtîbasê di Helbest û Mewluda Melayê Bateyî da	68
2.4.1.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Tewhîd û Hakimranîya Xwedê da.....	68
2.4.2.	Îqtîbasên Ayet û Hadîsên di Derbarê Dilovanî û Bexîskarîya Xwedê da.....	71
2.4.3.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Ewsafên Muhammed Pêxember da	73
2.4.4.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Fetha Mekkeyê da.....	76
2.4.5.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Jina Ebû Leheb da	77
2.4.6.	Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Rêya Hîdayetê da.....	77
2.4.7.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Âdem Pêxember da.....	78
2.4.8.	Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Mucîzeyên Pêxember da	80
JÎYANAME	90

Teza Lîsansa Bilind
Veysi ÎNCÎ
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
Berfanbar-Van
ÎQTÎBAS DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DA
(Helbestên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Bateyî)

KURTE

Yek ji wan cih û warên ku wek çincîla şaristanîya mirovatîyê hatîye hesabandin bê şek herêma Mezopotamyayê ye. Yek ji wan cihên ku Qur'ana Pîroz, mûqedes dêra ye ev welatê bimbarek e. Vê erdnîgarîya bi xêr û bêr di dergûşa şaristanîya xwe da gelek pêxember û âlim û edîp perwerde kirîne. Yek ji xelekên zincîra wan âlim û edîbên ku di vî çincîla medenîyetê da hatîne perwerdekîr Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyran e. Melayê Cizîrî, di navbera sedsala XVI –XVII. da li Cizîrê jîyaye. Cizîrî yek ji wan kesayetîyane ku derûnîya xwe, bi merîfet û muhebeta îlahî perwerde kirîye. Li ser vê bingehê bi hibra eşqê dîwaneke ku bûye serekanîya Edebîyata Klasîk a Kurdî ristîye û bi hunera îqtîbasê jî xemilandîye.

Yek ji xelaka wê dergûşa şaristanîyê jî Feqîyê Teyran e. Feqî, sofîmeşreb bûye û di behra edebîyatê da jî wek pira navbera Edebîyata Gelerî û Dîwanî/Klasîk hatîye qebûl kirin. Wî jî beyt û qesîdeyên xwe bi hunerên rewanbêjî û îqtîbasê xemilandî ne.

Yek ji vê xelaka zêrîn jî, Ehmedê Xanî ye ku sembola dengê edebîyata kurdî tê hesabandin. Xanî li ser vê bingehê çar berhemên giranbiha dîyarîyê mîletê xwe kirîye: Nubîhara Piçukan, Eqîdeya Îmanê, Mem û Zîn û Dîwançe. Dema ku em li van berhemên wî mêze dikin em dibîbin ku di bin tesîra Qur'an û hedîsê da maye.

Yek ji tîrêjên şewqa Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî Melayê Bateyî ye. Di sedsala XVIII. da jîyaye. Di alimî û edebîyatnasîyê da bi nav û deng e. Yek ji evîndarên pêxember e, li ser vê eşqa xumalî, Mewlîda xwe yê meşhur nivîsandîye û her wîha gelek helbest û qesîde jî li pê xwe ve hiştine.

Di vî lêkolînê da emê li ser berhemên van her çar stêrgeşên Edebîyata Kurdî rawestin. Emê bi rêya hunera îqtîbasê, bandora Qur'an û hedîsê ya li ser berhemên

wan binirxînin. Her wiha pêwendîya beyt û qesîdeyên wan bi ayet û hedîsên Pêxember bi zimanekî akademik şîrove bikin û li gorî pîvanê rewanbêjîyê di berhemên wan da cureyên hunera îqtîbasê rave bikin.

Peyvên Sereke : Îqtîbas, Ayet, Hedîs, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Mela Ehmedê Bateyî, Edebîyata Klasîk.

Hejmara Rûpelan : 103

Şewirmendê Tezê : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ



Yüksek Lisans Tezi
Veysi İNCİ
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI
Aralık - 2019

KLASİK KÜRT EDEBİYATINDA İKTİBAS SANATI
(Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî ve Melayê Bateyî Şiirlerinde)

ÖZET

Medeniyet beşiği olarak bilinen Mazopotmya diyarı aynı zamanda Kur'an-ı Kerim'in kutsal olarak nitelendirdiği verimli bir coğrafyadır. Bu bereketli coğrafya, medeniyet beşiğinde birçok Peygamber âlim ve edip yetiştirmiştir. Bu medeniyet diyarından yetişmiş sayısız âlim ve edipler silsilesine halka olmuş ve Klasik Kürt Edebiyatının öncüleri olarak kabul edilmiş şahsiyetlerin başında Melay-i Ciziri, Ahmed-f Hani, Fakiy-i Teyran ve Melay-i Bateyî gelmektedir. Melay-i Ciziri, XVI-XVII. yüzyılları arasında yaşamış olup kendi iç dünyasını marifetullah ve muhabbetullah ile terbiye etmiş, tasavvuf ehli bir âlimdir. Bu temel üzerinde aşk mürekkebiyle, Klasik Kürt Edebiyatı'nın kaynağı olan Kur'an ve hadisler ile süslenen bir divan yazmıştır. Bu medeniyet beşiğinden yetişmiş ve Klasik Kürt Edebiyatı halkasına katılmış ikinci Şahsiyet Fakiy-i Teyran'dır. Bu şairimiz XVI. yüzyılda yaşamış ve Divan Edebiyatı ile Halk Edebiyatı arasında bir köprü olarak kabul edilmiş bir şahsiyettir. Zaman zaman, iktibas sanatı vasıtasıyla şiirlerini ayet ve hadis ile süslemiştir.

Medeniyet diyarımızın altın halkalarından ve edebiyatımızın sembolü olmuş diğer şairimiz Ehmed-i Hanî'dir. Ahmed-i Hanî, bu temel üzerinde halka dört eser armağan etmiştir. *Nûbihara Piçukan, Eqîda İmanê, Mem û Zîn ve Dîwan* eserleridir. Bu eserlere bakıldığında ayet ve hadislerin tesiri açıkça görülmektedir. Zira Ehmedê Hanî'nin bu eserlerdeki amacı gelecek kuşaklara Kur'anî unsurları aşına kılmaktır.

Yine Klasik Kürt Edebiyatı'nın öncülerinden biri de XVIII. yüzyılda yaşamış olan Mela-yi Bateyi'dir. Bateyî, dini ilimlerde ve edebiyat alanında şöhret bulmuş bir şahsiyettir. En önemli özelliği peygamber aşığı olmasıdır. Bu bağlamda Mewlûda Bateyî ismiyle meşhur olmuş eseriyle birlikte birçok kaside ve şiir de yazmıştır.

Bu alıřmada, eserlerini iktibas sanatıyla ssleyen bu drt edebiyat dhisinin eserleri ele alınacaktır. Bu řahsiyetlerin řiirlerinde, ayet ve hadis lafızlarını iktibas sanatı olarak nasıl ve ne kadar yansıttıkları sorusuna cevap aranacaktır. Bu baęlamda ayet ve hadis baęlantılı řiirleri akademik bir dil ile incelenecektir.

Anahtar Kelimeler: İqtıbas, Ayet, Hadıs, Mela-yı Cizrı, Ahmed-ı Xanı, Feqi-yı Teyran, Molla Ahmedı Bateyi, Klasik Edebiyat

Sayfa Adedi : 103

Danıřman : Do. Dr. Nesim SNMEZ



Master Thesis

VEYSİ İNCİ

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
KURDISH LANGUAGE AND CULTURE

December - 2020

QUOTATION ART IN CLASSICAL KURDISH LITERATURE

(In Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî and Melayê Bateyî Poems)

SUMMARY

Mesopotamia, which is known as the cradle (center) of civilization, is also a fertile land that the Qur'an calls it sacred. This fertile geography raised many prophets and scholars in the cradle of civilization. Melay i Jiziri, Ehmed i Hani, Fakiy i Teyran and Melay i Bateyi are among the personalities that have been brought up to the public as scholars of this civilization and accepted as the pioneers of Classical Kurdish Literature. A scholar of Sufism, who lived between the 6th and 7th centuries and enjoyed marifetullah and muhabbetullah in his inner world was Cizir. Upon this basis, he wrote a divan, the source of Classical Kurdish Divan Literature which was embellished with the quotations from the Qur'an and Hadith in the ink of love. The second person who grew up in the cradle and joined the ring of Classical Kurdish Literature This civilization was Faki-i Teyran. This is our poet XVI. century and was considered a bridge between Divan Literature and Folk Literature. From time to time he decorated his poetry with verses of Qur'an and hadith.

Ehmed-i Hani is another poet who is one of the golden rings of our country of civilization and has become the symbol of our literature. On this basis, Hani gave four works to the public. These are the works of Nûbihara Piçukan, Eqîda Îmanê, Mem û Zîn, and Dîwan. When these works are examined, the influence of the verses and hadiths is clearly seen. The aim of Ehmedê Hanî in these works is to make the next generations familiar with the Qur'anic elements. Mela i Bateyi is also one of the highlights of Classical Kurdish Literature. Bateti lived in the 8th century. He is a figure of science and literary that has found fame in religious sciences and literature. The most important feature of him is that he is a lover of the prophet

Mohammad(p.b.h). He became famous with the name Mewlûda Bateyi and wrote in this context, many poems and odes.

In this study, the works of these four literary geniuses adorned with art of quotation will be studied. It will seek for answer to the question of how and to what extent these figures reflect verse and hadith words as poetic art in their poems. In this context, verses and hadith-related poems will be examined in an academic language.

Key Words : İqtîbas, Literary, Verse, Hadith Cizîrî, Feqî, Xanî, Bateyî.

Number of Pages : 103

Advisor : Assoc. Prof. Dr. Nesim SÖNMEZ



PEŞGOTIN

Bêguman Edebîyata Klasîk a Kurdî behra hunerên edebî ye. Bi taybetî edebiyata klasîk bi wan huneran rengîn bûye. Yek ji wan hunerên edebî, hunera îqtibasê ye. Kesayetên ku di Edebîyata Klasîk da bûne pêşeng û delil, ev huner di beyt û nivîsên xwe da bikar anîne. Lewra piranîya wan, di bin şewqa medreseya Qur'an û sunetê da perwerde bûne. Ji ber vê yekê tesîra şewqa bêje û hevokên Qur'anî li ser hibr û pênuşa wan bi awayeke zelalî tê xuyakirin.

Ev xebat, ji bo destnîşankirina tesîra Qur'an û hedîsê li ser Edebîyata Klasîk a Kurdî, bi rêya hunera îqtibasê hatîye kirin. Mijara vê xebatê, hunera îqtibasê di Dîwana Melayê Cizîrî, Helbestên Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Bateyî da ye. Ev xebat bi du beşan pêk hatîye. Beşa yekemîn, behsa pênasakirin hunera îqtibas û cûreyên îqtibasê dike. Beşa duyemîn behsa hunera îqtibasê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk da dike. Ev beş jî dibin çar ser navên wek “îqtibas di dîwana Melayê Cizîrî da, îqtibas di helbestên Feqîyê Teyran da, îqtibas di helbestên Ehmedê Xanî da, îqtibas di helbestên Melayê Bateyî da” hatîye sînor kirin.

Nayê înkâr kirin ku encamdayîna vekolînan, bi desxistina çavkanîyan ve girêdayî ye. Lê belê ji bo ku di vê babetê da bi awayeke rêk û pêk xebat nehitine kirin, ev yek bi xwe ra zehmetiyên gihiştina çavkanîyan peyda dike. Lê dîsa wek çavkanîyên sereke, ji kitêba El-Iqdu'l-Cewherî fî Şerhî Dîwani'ş-Şeyxî'l Cezerî ya Mela Ehmedê Zivingî û ji kêtêba M. Xalid Sadinî ya bi navê *Feqîyê Teyran, Jiyana Berhem û Helbestên Wî*, û ji kitêba *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* ku ji hêla Huseyn Şemrexîve hatîye berhev kirin, mifa hatîye girtin. Di tefsîr û şîroveya ayetan da, piranî ji berhemên weke “Tefsîru'l Kebîr we Mefatîhû'l-Xeyb û “Enwar û Tenzil we Esrarul Te'wîl”ê mifa hatîye girtin.

Ji bo ku ji destpêka vê xebatê heya dawîyê bi awayeke dilnizmî bi tecrûbedarî û zanyarîya xwe her dem ji me ra bûye alîkar, ji şêwirmendê xwe birêz Doç. Dr. Nesîm Sönmez ra spasî û şikirandina (şikirandinên) xwe pêşkeş dikim. Her wisa ji birêz Doç Dr. Abdulhadî Timurtaş û Dr. Mezher Tunc spasîyên xwe pêşkeş dikim.

Veysi İnci

Van-2020



KURTEBÊJE

DÎA	: Diyanet İslam Ansiklopedisi
c.	: cild
b.	: bin
k.	: koçî
s.x.l.	: Silawê Xwedê lê be
r.	: rupel
Weş.	: Weşanxane
Mela	: Melayê Cizîrî
Feqî	: Feqîyê Teyran
Xanî	: Ehmedê Xanî
Bateyî	: Mela Huseynê Bateyî
Dib.	: Diyanet İşleri Başkanlığı
ç.	: Çap
b.d.	: Bê dêrok
Bnb.	: Berhema nav bihorî
TDV	: Türkiye Diyanet Vakfı

DESTPÊK

Mijar, Armanc û Giringîya Lêkolînê

Edebîyat bingeha şaristanîyê ye. Mirovan bi rêya edebîyatê xewn û xeyalên xwe fikr û ramanên xwe wek mîrate neqil kirine. Ji helbest destan û çîrokê bigire heya menqêbeyên dînî, ji bo edebîyatê babet in. Bi te'bîrek din, edebîyat sifra hest û helbest, çîrok û destana şaristanîya her milletekê ye. Piştî ku milletê Kurd bi muslimantîyê qayîlbûn, bêguman êdî Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî bi ruhê dînê islamê hate xemilîn. Di dînê îslamê da çavkanîyên esasî Qur'an û sunet e. Kesên di Edebîyata Klasîk da berhem dane, bêguman ew kesayetên 'ilimdar û zanyarên mentîqa rewanîya zimanê Qur'an û sunetê bûne. Berhemên xwe yê pexşanî û helbestî bi hunerên rewanbêjîyê hem qewî kirine hem jî xemilandin e. Ji wan huneran yek jî îqtîbas e. Dema em li dîroka hunera îqtîbasê mêze dikin em dibînin ku ewilîn kesê ku ev huner bikar anîye qasidê Xwedê ye. Di roja Xeyberê da Resulê Xwedê wiha gotîye:

اللَّهُ أَكْبَرُ! حَرَبْتُ حَبِيرًا! إِنَّا إِذَا نَزَلْنَا بِسَاحَةِ قَوْمٍ فَسَاءَ صَبَاحُ الْمُنْذِرِينَ¹

Ev hedîs, îqtîbasa ji gotina Xwedê ye ku Xwedê di Qur'ana Piroz da di Suretê Saffat da wiha gotiye :

“فَإِذَا نَزَلَ بِسَاحَتِهِمْ فَسَاءَ صَبَاحُ الْمُنْذِرِينَ”²

“Êdi dema 'ezaba me dakeve derîzana wanên ku hatine hişyarkirin û guhdarîya hişyarîyê nekirne. Aha siba wan kesên ku wê ezab bi wan dakeve qewî pîs e.”

Her wiha dema ku qasidê Xwedê rojê înfîyan xutbe dida, di xutbeyên xwe da bi teqezî ji Qur'anê îqtîbas werdigirt. Ev yek di dema çaryarên wî û sehabîyên kubar da jî dewam kirîye û heya îro jî berdewam e. Dema ku em dibin têkildarîya vê babetê, li berhemên nunerên Edebîyata Klasîk a Kurdî mêze dikin, em dibînin ku ewan jî bi hunera îqtîbasa ji Qur'an û hedîsê berhemên xwe qewî kirne û xemilandîne.

¹ Ebu'l Huseyn Muslim b. el-Haccac b. Muslim el-Kuşeyrî *Sehihê Muslim* I-V. Darû İhyai't-Turasi'l 'Arabî Beyrut b.d II,r,1043; Newewî, Ebû Zekerîyyâ Yahyâ b. Şeref, *Şerhu Sehihi Mûslim li Newewî*, I-IX, Darû İbn Heysem, Çapa 1ê, Qahîre, 2003, V/1365; Elqurtubî, Ebu Ebdullah Muhammed b. Ehmed el- Ensarî, *Tefsîrû'l-Qurtubî*, I-XXI, Dar'û'l-Kutubî'l-İlmîyye, Beyrût, 2004, XV r, 92.

² Saffat, 37/177.

Di vê xebata xwe da emê li ser hunera îqfîbasê rawestin ka gelo îqfîbas çî ye? Pênaseya wê ya edebî çewa hatîye kirin û cureyên îqfîbasê çî ne? Paşî jî emê di dîwana Melayê Cizîrî, helbestên Feqîyên Teyran, dîwan û Memû Zîn a Ehmedê Xanî, helbestên Melayê Bateyî da bi hurgirî li ser îqfîbasên ku hatine kirin bisekinin. Emê li ser bersiva van pirsên sereke rawestin ka gelo ew kesayetên ku wek sembolên Edebeiyata Klasîk a Kurdî tên zanîn, di dîwan û berhemên xwe da ayetên Qur'anê û hedîsên Pêxember çewa tomar kirine? Armanç û hikmet ji îqfîbasê çî bûye? Emê bi vê awayê, pêwendîya di navbera beyt û îqfîbasa ji ayet û hedîsên ku hatine kirin, lêkolîn bikin.

Rêbazên Lêkolînê

Dema ku em di van dîwan û helbestan da hunera îqfîbasa ji Qur'an û hedîsê hildene destên xwe em tenê li gorî azîneyên berhemên tefsîr û hedîsan tev nagerin. Lewra her çendan ayet û hedîsên ku hatine îqfîbaskirin wê meal û şerha wan bê kirin, lêbelê divê em ji bîr nekin ku ev berhemên edebî ne û ev berhem li ser bingehên tesewuf û evîne hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê emê li ser esasê hûnerên edebî li gorê pêwistîyê hem têgehên azîneyên tefsîr û hedîsê hem jî têgehên tesewufê bikar bînin. Li gorê lêkolîna me ji bilê çend gotaran pêve, xebatekê ber biçav li ser vê mijara îqfîbasa ayet û hedîsê nehatîye kirin. Wek mînak Nurettin Turgay di bin sernavê *“Ahmet El botî El cizirî ve Dîvanda Kur'an' a Yaklasimi”* meqaleyek nivîsandîye. Her wisa Nesîm Sönmez di bin sernavê *“Şeyh Ahmed-i Hanî'nun Mem û Zîn Mesnevisinde Ayetlerden İktibaslar”* gotarek nivîsandîye. Dîsa Abdulcelîl Bilgîn meqaleyek di bin sernavê *“Kur'an'a Divan Durmak: Vahyin Reng ve Tonlarının Cizîrînin Şiirindeki Nicel Yansımalarına Dair Bir İnceleme.”* nivîsandîye

Di vê xebatê da me dîwana Melayê Cizîrî ya ku di sala 2012an da ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî va hatîye berhevkerin û li weşanxaneyê Nûbiharê hatîye weşandin, di helbestên Feqîyê Teyran da kitêba M. Xalid Sadinî ku 2014an da li weşanxaneyê Nûbiharê hatîye weşandin, di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da yê ku ji aliyê Huseyîn Şemrexî ve hatîye berhevkerin û di sala 2009ê li weşanxaneyê Nûbiharê hatîye weşandin, di dîwana Ehmedê Xanî da ku ji aliyê Qedri Yıldırım ve hatîye berhevkerin û li weşanxaneyê Avestayê hatîye weşandin, di helbestên Melayê

Bateyî da jî kitêba M. Xalid Sadinî ku 2010an da li weşanxaneyê Nûbîharê hatîye weşandin, wek bingeh girtîye û nimuneyên beytan ji van berheman hatine girtin.

Di alîyê tefsîrê da wek çavkanîyên sereke me ji Tefsîra el-Qadî el-Beydawî, bi navê *Enwarut-Tenzil we Esrar u t-Te'wîl*, *Tefsîrûl Qurtubî* û ji tefsîra *Fexruddîn Razî* bi navê *Tefsîru'l Kebir we Mefatîhû'l-Xeyb* mifa girtîye.



1. HÛNERA ÎQTÎBASÊ

Îqtîbas bêjeyeke e'rebîye û ji koka lêkera قَبَس yê hatîye dariştin. Di wateya xwe ya ferhengî da bi wateya pêta agir, girtina pizotek agir û di sûd girtina ilmê da hatîye bikar anîn.³

Îqtîbas di zanista rewanbêjî yê da “*ew huner e ku helbestvan an pexşannivîs qismek ji Qur'an û Hedîsê di nêv gotin û helbestên xwe de bikartîne; lêbelê nabêje Xwedê an jî Qasidê Xwedê wiha gotîye*”⁴ hatîye pênasekirin. Di vê danasînê da xala girîng ew e ku nivîskar nabêje Xwedê an pêxember wiha gotîye, lewra eger bibêje ew nabe îqtîbas.

Her çendan me li jor got ku mêjûya îqtîbasê ji Muhammed Pêxember destpê dîke lêbelê yê ku cara ewilîn bêjeya îqtîbasê wek hunera rewanbêjîyê bikar anîye Fexruddînê Razî ye; lewra di pêşîya wî da îqtîbasa jî Qur'anê bi navê tedmînê hatîye bikar anîn.⁵

Di vir da em dixwazin balê bixşînin li ser ferqa navbeyna wateya îqtîbas û tedmînê. Lewra ev tedmîna ku di wateya îqtîbasê da hatîye bikar anîn eynê îqtîbasê yê. Lêbelê ew tedmîna ku ehlê ilmê rewanbêjîyê wek hunera edebî bikar anîne, ji îqtîbasê cuda ye. Di ilmê rewanbêjîyê da hunera tedmînê wiha hatîye pênasekirin: “*Deme ku helbestvan di helbesta xwe da qismek ji helbesta şairekî din bikarbîne jê ra tê gotin hunera tedmînê.*”⁶

Pişt ra hinek alimên ilmê rewanbêjîyê, çarçoveya danasîna îqtîbasê berfireh kirine. Wek mînak ‘Usamûddîn el-Îsfiranî (w. 940/1534) wiha dibêje: “Îqtîbas, ew huner e ku helbestvan an pexşannivîs herê kêrmanîyê ji ayet û hedîsê yan ji

³ Ibn Manzûr, Cemalûddîn, Ebu Fedîl, Muhammed, b. Mukerrem, *Lisanul-‘Arab*, I-X, Darûl-Kutubî'l-‘Îlmîyye, Çapa 2'an, Beyrut, 2013, IV, 269; ez-Zemexşeri, Ebûl-Qasim Mahmud b. ‘Umer, *Esasûl belaxe*, Darû Nefâis, çapa 1'ê Beyrût, 2009, r. 457.

⁴ Teftezanî Sadeddîn Mesud b. ‘Umer, *Muxteserû'l-me'anî*, Weş. Salah Bilici Kitap Evi, İstanbul, b.d.r450; Elxetîb, Elqezwînî, Celaledîn Muhemmed, b.‘Ebdurrahman, b.‘Umer, b.Ehmed, b.Muhammed *el-Îdah fî ‘ulumilbelaxetîl-meanî we-l beyanî, we-l bedî*, Darûl- Kutubî'l-Îlmîyye, Çapa 1ê, Beyrut, 2003, r. 315.

⁵ Abdul Muhsin b. Abdulaziz el-Eskerî, *el- Îqtîbas Enwa ‘uhû we Ehkamuhû*, Darûl- Menhec, Çapa 1ê, Riyad, r. 16.

⁶ Teftezanî, b.n.b, r.451.

qewlê sehabî û tabi‘înan an jî gotinên kesên ku di vî xelekê de cih girtine, di nêv gotin û helbestên xwe da bikarbîne jê ra tê gotin îqtîbas.”⁷

Îqtîbas, bi wateya xwe ya mecazî me‘na feyizgirtina ji ilmê ye. Di vir da pirsek tê hişê mirov: Gelo pêwendîya di navbera her du wateyên iqtîbasê ku yek wateya heqîqî ye, yê duduyan jî mecazî ye, çî ye? Pêwendî ew e ku çawa pêta agir devdorê xwe ronî dike, ew kesê ku ji Qur‘ana Pîroz an ji hedîsên Pêxember îqtîbasê dike ew îqtîbas gotin û helbestên wî qewî dike û dixemilîne.⁸

1.1. Cureyên Îqtîbasê

1.1.1. Îqtîbasa Temam

Ew ayet an jî hedîsa ku di nav helbest û gotinê da hatîye wergirtin eger wateyek bêkêmasî îfade bike ji wê iqtîbasê ra “îqtîbasa tamam” tê gotin. Bo nimûne Melayê Cizîrî di vê beytê da ev cure îqtîbas wiha bi kar anîye:⁹

Kulle yewmin huwe fî şe‘nin nebî xafil jê

Her peyapey ji şu‘ûnan dikirit feyz û meded

(Cizîrî, 2012,r.150)

Melayê Cizîrî di vê beyta xwe da bi ayeta “*Kulle yewmin huwe fî şe‘nin*” îqtîbasa tam bi kar anîye. Lewra îqtîbasa tam yan îqtîbasa tamamê ayetê tê kirin yan jî hevokek ji ayetê bi şertê ku bi hesab îrab wateyê bê kêmasî be, jê ra tê gotin “îqtîbasa tam.” Dema em li vê ayeta ku di vê beytê da derbas dibe mêze dikin, em dibînin ku wateyek bêkêmasî îfade dike, êdî wek “îqtîbasa tam” tê qebûl kirin.

1.1.2. Îqtîbasa Naqis (Îqtîbasa Kêm)

Ji ber hinek zerurîyên wezn û kêşeya beytê ku neyê xira kirin, ji paşxistin û pêşxistin an jî kurtkirina metnê iqtîbasê ra tê gotin “îqtîbasa naqis.”¹⁰

⁷Usameddîn el-Îsfîranî, Îbrahîm bin Muhammed bin Ereşah, *el-Etwel şerh telxîs miftahu‘l ‘ulûm, Darûl kutubi‘l‘ilmîyye Beyrut, b.d.II, r.241*

⁸ Abdul Muhsin b. Abdulaziz el-Eskerî, *el- Îqtîbas Enwa‘uhû we Ehkamuhû*, Darûl Menhec, Çapa1ê, Riyad, r. 17.

⁹ Mustafa Uzun, “Îktîbas”, *Diyanet İslam Ansiklopedi*, Weş. TDV, İstanbul, XXII, 52; Reyhan Keleş, *Divan Şiirinde Ayet ve Hadis İktibasları*. Weş. Kitapevi, İstanbul, 2016, r. 28-30.

Hêja nebûye **rehîqê Mextum**

Hêja neçûye meqamê m'elum

(Mem û Zîn, beyt: 2570)

Ehmedê Xanî di vê beytê da ji ber zerurîyên wezn û kêşeya beytê, bi hevoka “*rehîqê mextum*”ê îqtîbasa naqis bi kar anîye. Lewra ev parçe ayet bi hesep îrab û me'nayê bi serê xwe menayek temam îfade nake. Ji bo ku wateyek temam îfade bike pêdivîya wî bi hevoka berfîya xwe heye. Ayet bi temamî wiha ye: “*Yusqewne min rehîqin mextum*”

1.1.3. Îqtîbasa Mustehsen

Dema ku helbestvan an pexşannivîs di helbest û gotinên xwe da îqtîbas dike, eger munasibê edeba islam û şerî'etê be û tesîrekî baş li ser xwînerên xwe bike, jê ra tê gotin îqtîbasa mustehsen. Ev îqtîbasa hanê di nav xwe da dibe du cure.¹¹

1.1.3.1. Îqtîbasa Ehsen

Ew îqtîbasa ku munasibê şerî'etê be û di hindirê xwe da nesîhetê bihewîne û gotinên helbestvan yan pexşannivîs dijberê wê îqtîbasê nebe, jê ra tê gotin “îqtîbasa ehsen.”

Me bi dil 'urwetê wusqa te di dest

Ji senaya te ser elqabê du'a.

(Cizirî, 2012, r. 50)

Melayê Cizirî di vê beytê da îqtîbas ehsen bi kar anîye. Lewra di hundirê xwe da pend û nesîhetê dihewîne. Ji ber ku meqsed ji *'urwetû wusqa nesîheta 'aşiqê ye. Mela di kesayeta xwe da li 'aşiqan nesîhetê dike û dibêje: Lazim e ji bo her 'aşiqê*

¹⁰ Keleş, *b.n.b.*, 28-30.

¹¹ Keleş, *b.n.b.*, 28-30.

xwe bi qulpek herê qewî bigre ku evîna Xwedê ye. Her wiha di her gav û her halê xwe da zikr û senayê wî bike.

1.1.3.2. Îqtîbasa Hesên

Ew îqtîbasa di nava xwe da şîret û nesîhetê nahewîne; lêbelê munasibê edeba îslamê be jê ra tê gotin “îqtîbasa hesên.”

Hebbeza rewdatu necdin zurtuha ehde seba

Rewdetun yecrî ‘ela ercaîha maun me‘în

(Cizîrî, 2012, r. 260)

Melayê Cizîrî bi hevoka “maun me‘în”ê ku di Suretê Mulk da derbas dibe îqtîbasa hesên bi kar anîye. Lewra ev hevok her çendan di hundirê xwe da şîret û nesîhetê nahewîne, lêbelê ne muxalîfê edeba îslamê ye jî. Gava ku Mela dibêje “*Rewdetun yecrî ‘ela ercaîha “maun me‘în”*” meqsed jê ew baxçeyên ku di kenarên wî da avên carî diherikin. Di Qur’anê da jî di heman me’neyê da wiha derbas dibe:

قُلْ أَرَأَيْتُمْ إِنْ أَصْبَحَ مَاؤُكُمْ غَوْرًا فَمَنْ يَأْتِيكُمْ بِمَاءٍ مَعِينٍ¹²

Bibêje: Eger ku ava we biçike de ka ji min ra bibêjîn kî dikare ji we ra aveke carî bîne.

1.1.4. Îqtîbasa Mustehcen

Ew îqtîbasa ku helbestvan yan jî pexşennivîs di gotinên xwe da bi kar tîne munasibê edeba îslamê jî nîne ji vê cure îqtîbasê ra tê gotin “îqtîbasa mustehcen.”¹³

Wek mînak: Tê gotin ku yek ji milûkên benî Merwanîyan di nameyekê xwe da ji bo cezadana xulamên xwe ji ayetekê wiha îqtîbas kirîye:

إِنَّ إِلَيْنَا إِيَابَهُمْ ثُمَّ إِنَّ عَلَيْنَا حِسَابَهُمْ¹⁴

“Bêguman vegera wan bi bal me ve ye pişt ra hesabê(cezadana) wan jî li ser me ye.”

Ji ber ku nisbeta emrê di ayetê da daye, li bal xwe îqtîbasa mustehcen kirîye¹⁵.

¹² Mulk, 67/30.

¹³ Keleş, *b.n.b.*, 28-30.

¹⁴ Xaşîye 88/ 25-26

2. HUNERA ÎQTÎBASÊ DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DA

2.1. Hunera Îqtîbasê di Dîwana Melayê Cizîrî da

Di bin vê sernavê da ew ayet û hedîsên ku Mela di dîwana xwe da wek hunera îqtîbasê bi kar anîye û li gorê babetên xwe hatine kifşkirin, hatine dayîn.

2.1.1. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Tewhîd û Senayê Xwedê da

Tewhîd peyveke ‘erebî ye, wateya wî yê ferhengî, yek dêran û ifradkirina tiştêkî ye. Di wateya şer‘î da *digel yek dêrana Xwedê bi îbadetê, bawerî anîn û tesdîqkirina ku Xwedê di zat, sîfat û kiryarîyên xwe da jî yek e. Ew pesindayîna li hemberê mezinahîya zat û sîfatên xwedê tê kirin jê re tê gotin sena.*¹⁶

Her wekê tê zanîn yek ji fikr û armancên Qura’na Pîroz jî tewhîd e. Ji ber ku Melayê Cizîrî perwerîyê medreseya Qur’an û sunnetê ye, êdî wî, dîwana xwe li ser xîmê tewhîd û pesnê Xwedê ristîye. Mela, dixwaze vî yekê bi rêya îqtîbqasê bi kar bîne û di dîwana xwe da wiha dibêje:

Kulle yewmin huwe fî şe’nin nebî xafil jê

Her peyapey ji şu’ûnan dikirit feyz û meded

(Cizîrî, 2012,r.150)

Yanê tu nebe xafil ji Xwedê ku her gav û her roj di rewş û halekî ji hev cûda da bi karekî ve mijûle û li gorê halê ‘evdê xwe bi hawar û alîkarîya wî/ê tê. Ew, gav bi gav kar û rewşan zêde dike û alîkarî û hawar û xwestina evdên xwe zêde dike.

Ev ayeta ku Mela îqtîbas kirîye di Suretê Rehman da derbas dibe. Xwedê wiha ferman dike:

”يَسْأَلُهُ مَنْ فِي السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضِ كُلَّ يَوْمٍ هُوَ فِي شَأْنٍ¹⁷.”

“Yên ku li erd û asîmanan hene temamê daxwazîyên xwe ji wî dikin. Ew di her kêlik û lehzekî da bi karekê ve mijûl e.”

¹⁵ es-Suyûtî, Celeleddîn, *el-Îtqan fî-‘ulumil-Qura’n*, Weş: Erisale, çap,1 ê, Beyrut, (2008), r. 236.

¹⁶ el-Bacûrî İbrahîm b. Muhammed b. Ehmed, *Tuhfet ul mûrîd ‘ela cewheret i-tewhîd*, Mektebe tu’ d-Darû Deqaq, Çapa 1ê, Dimeşq, 2002, r. 38.

¹⁷ Rehman, 55/29.

Ehlê tefsîrê li ser tefsîra vê ayetê wiha dibêjin: “Xwedê bi zatê xwe dewlemendê ji hemû afirînerên xwe ye. Ew xwedankerem û dilxwaz e.”

Her çi kesî/ê di erd û asîmanan da hene hemû daxwaz û hewceyên xwe ji Xwedê dixwazin. Bi qasê çevgirtinekî bejî nabe ku tu kes dewlemendê ji hewcedarîya wî bibe.¹⁸

Hinek kes rizqên xwe, hinek bexîşandina xwe, hinek jî hewarî û alîkarîyê dixwazin. Her kî/ê hewcedarê çi bibe ew wî dixwaze. Xwedê her gav bi karekî ji hev cihê mijûle, di her sanîye û lehzeyê da haj ji gilî û gazindeyên her benderuhekî/ê heye. Tu daxwazî men‘a wî ji daxwazîyekê din nake. Ji tewbedaran ra tewbe, ji efûxwzan ra bexîşandin, ji nexweşan ra şifa ihsan dike; dewlemendan vedigerîne xêzanîyê, xêzanan vedigerîne dewlemendîyê. Kesê zordar sernixûm dike, vedigerîne bindestîyê, gelên bindest û jar jî vedigerîne serdestîyê. Hinekan dimrîne, hinekan jî dide jiyên kirin¹⁹.

Cizîrî jî di vê beyta xwe da balê dikşîne ku hemû heyînên di gerdunê de muhtacê Xwedê ne. Tu tiştek bê vîn û qudret û zanîna wî çênabe. Ew her roj di rewş û halên cuda da li gor wan rewşan li ‘evdên xwe dîyar dibe. Bed‘îtî û xaliqtîya wî her daîmî ye, mirandin û jiyandina mexluqan ji şe‘nê Xwedê ye. Rizq û ‘ezîztîya qewman zilet û şifa dayîna nexweşan bi emrê kun (bibe) çêdibe. Bi taybetî jî pêwîst e dildar ji vê rewşê bêxeber nebe û di behra eşqê da nexeniqe û di her merheleyên eşqê da li gorê wî tevbigere.

Her wiha Cizîrî di vê beyta xwe da bi rêya hûnera îqfîbasê felsefa *deîzmê* red dike. Lewra felsefa deîzmê angaşte dike ku Xwedê gerdun afirandîye lêbelê eleqedarî pê nayîne²⁰

Melayê Cizîrî di beyta xwe ya jêr da behsa girngîya hemd u senayê Xwedê dike.

Ya reb ji çi rû leb bi senaya te kuşayem

Subhaneke len uhsîye fi şe‘nîke hemda

(Cizîrî, 2012, r. 30)

¹⁸ es-S‘edî, Abdurahman b. Nasir, *Teyşîrûl kerîmi‘r-Rahman fi tefsîr ê kalamûl menan*, Mektebetûl-‘Ebîkan, ç1ê, Riyad, r. 830.

¹⁹ el-Qurtubî, Ebu Ebdullah Muhammed b. Ehmed El Ensarî, *Tefsîrûl Qurtubî*, I-XXI, Darûl-Kutubî‘l-‘Îlmîyye, Çapa 2 yan, Beyrût, XVII, 2004, r.109.

²⁰ Ahmet Cevzi, *Felsefe Terimler Sözlüğü*, Weş. Paradigma, İstanbul, r. 7-8.

Ya Xwedê! Ezê bi çi rûyê bikarim bi dev û zimanê xwe pesn û senayê te bidim. Bêguman tu ji kêmasîyan pak û dûr î. Ez neşîm bi hejmartinê pesn û wesfên halên te bêjim. Ev yek ji quweta min der e. Lewra heqîqeta mezinahîya zatê xwe her tu dizanî.

Mela di vê beyta xwe da îqtîbas ji hedîsa Pêxember kirîye ku hatîye ragihandin Resulê Xwedê wiha gotîye:

”اللَّهُمَّ إِنِّي أَعُوذُ بِرِضَاكَ مِنْ سَخَطِكَ وَبِمُعَافَاتِكَ مِنْ عُقُوبَتِكَ وَأَعُوذُ بِكَ مِنْكَ لَا أُحْصِي ثَنَاءً عَلَيْكَ أَنْتَ كَمَا أَتَنَّبْتُ عَلَى نَفْسِكَ²¹.”

“Ez xwe ji xezaba te dispêrim razîbûna te. Ez xwe ji e'zabê te dispêrim e'fwa te. Ez xwe ji neqencîyên ku te afirnadîye dispêrim rehmeta te. Ez nikarim bi hejmartinê pesn û senayê te bidim. Te çawa pesnê xwe dayî tu her wisa yî.”

Pêwandîya di navbera beyta Mela û hedîsa Pêxember da eşkere ye. Lewra Resulê Xwedê di vê hedîsê da diyar dike ku hemd û senayê Xwedê bi awayê ku layîqê mezinahîya zatê wî yê ku ji hemû kêmasîyan pake her ew dikare bide. Lewra ev zêdeyê ji quweta insanê ye. Her wiha Mela bi sifetê xwe yê ademîzadî li xwe mukir tê û dibêje ez neşîm tû zemanê pesn û senayê ku layîqê zatê Xwedê ye bidim. Heqîqeta zatê xwe her ew dizane. Wisa xûya dike ku mebesta Mela ji vê hunera îqtîbasê te'kîda gotina Qasidê Xwedê ye.

2.1.2. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Muhammed Pêxember da

Bi remza qabe qewseyn-i ji wan birhan xeberdarin

Fe-ati l-qewse bariha ela ya ramiye l-qewseyn

(Cizîrî 2012, 257)

Di vê beyta xwe yê li jor da Cizîrî dibêje ku bi sirra qabê qewseynê yanê ji ber ku em bi qederê navbera du kevanan nêzikê meşûqê bûne êdî em ji halê birhên wê agahdar in. Em zanayên razên ‘eşqê ne û pisporên eş û jana li hember tîrên ku ji birhên dildarê tîn avêtin. Nexwe, Ey tîravêj! Tu kevantîrê bide kevanjenê. Mela di wateya vê beytê da di beytekî xwe da wiha gotîye:

²¹ Ebû Zekerîyyâ Yahyâ b. Şeref, *Şerhu Sehîhi Mûslim li Newewî*, I-IX, Darû İbn Heysem, Çapa 1ê, Qahîre, 2003, III, r. 486.

Tû jî Melayê her bibirs esrarê işqê hel dikit

Vê mu'amayê çi zanit sed mela û musteîd.

(Cizîrî 2012,r. 154)

Ev ayeta ku Mela di beyta jorê da wek hunera îqtîbasê bikar anîye di Suretê Necm da derbas dibe, Xwedê wiha ferman kirîye: *Qederê mesafa navbera Pêxember u wî da bi qasê serê du kevanan yan jî hê kêmtir mabû.*²² Ev ayet bi çend avayan hatîye şîrovekirin:

Hinek pisporên tefsîrê gotine ku di serdama cahilîyê da dema ku 'Ereban hevpeymanek çêdikirin du kevan didane li ser hev û wek yek kevanê didane xuyakirin paşî her du kevan bi hev ra dikişandin û tîrek jê diavêtin. Bi wî avayê dibû sembola hevpeymandanîne. Hinekan jî gotina di zimanê ehlê hicazê da qews, bi wateya zendê mirovan e ku wateya pîvana dirêjahîyê da hatîye bikar anîn. Hinekên din jî gotine *Qabe qewseyn* di wateya mesafa navbera du kevanan da hatîye bikar anîn. Yanê ew melaîketê ku Qur'an bi Muhammed Pêxember (s.x.l) daye hinkirin wisa nêzikê wî bûye, êdî mesafa nêzikahîya di navbera wan da wekê mesafa serê her dû kevanan yan jî nêziktir bûye.²³

Ev ayet, wek sembolekî nêzikahîya navbera Melekê Cibraîl û Muhammed Pêxember (s.x.l) nişan dide. Her wisa ev nêzikahî nişanê ewlehîya wehya Qura'na pîroz e jî. Wisa xuya dike ku Mela di vê beyta xwe da xwestîye bêje: "Çawa Muhamed Pêxember nêzikê serkanîya wehya Qur'anê bûye ku tu mesafe di navbera wî û Cibrîl (s.x.l) nemaye. Her wiha Mela jî nêzikahîya xwe yê ji bo mehbûbê û pisporîya xwe yê 'eşqê, zanatîya xwe yê bi hemû razên evîne û hevpeymadanîna ji bo dildarê bi vî îqtibasê sembolîze kirîye.

Ger xeberdar î ji sirra "kuntu kenzen" guh bidêr

Da bi sed nurê beyan kit meneyê "lewlaki" rûh

(Cizîrî, 2012,r.136)

Eger tu ji sirr û hikmetê Hedîsa Qudsî xeberdar bî ku wiha dibêje:

²² Necm, 53/9.

²³ Komîsyon, *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsîri*, I-V, Weş. Dib., Çapa 3 yan, Ankara, V, r.161.

“كُنْتُ كَنْزًا مَخْفِيًّا فَارْدَتْ أَنْ أُعْرَفَ فَخَلَّفْتُ الْخَلْقَ لِيَعْرِفُونِي”²⁴

Pêwist e tu guhdarîya wî ruhê pak û paqij bikî ku dibin perda kiryarên beşerî da derketîye da ku bi sed nişanan ji te ra wateya hedîsa qudsî

لَوْلَاكَ لَوْلَاكَ لَمَا خَلَقْتُ الْإِنْسَانَ²⁵

beyan bike. Di vê beytê da Mela du hedîsên qudsî îqtîbas kirin e. Yê yekî hedîsa “*kuntu kenzen*” e ku Xwedê di vê hedîsa qudsî da dibêje: *Ez gencîneyeke veşartî bûm dema min xwest ku ez werim nasîn wî demê min xelk afirand da ku min binasin.* Hedîsa duyem jî ew hedîsa ku behsa afirandina gerdunê ji bo Muhamed Pêxember (s.x.l.) dike. Di wê hedîsa ku sofmêşreb wek hedîsa qudsî qebûl dikin da, Xwedê wiha dibêje: “*Ger tu nebûya, ger tu nebûya min erd û asîman nediafirand.*” Muhyeddinê ‘Erebî hedîsa “*kuntu kenzen*” wiha m’ena kirîye: “*Min xelq afirand da ku bibin eynik, ez di wî eynikê da li cemala xwe temaşe bikim.*”²⁶ Her wiha gelek aliman gotine ev hedîs muwafiqê mena ayeta ku dibêje: *Min ins u cin afirand sirf da ku ji min ra perestîne bikin.*²⁷

Li ser hedîsa “Lewlake”yê Mela Elî el-Qarî (w.1014/1605) weha dibêje: Muhammed Pêxember kamiltirînê benî ademîyan u qencîrînê ‘alemê ye; lewra jî di heqê wî da hatîye gotin: “*Ger tu nebûya, ger tu nebûya, min erd û asîman nediafirand. Ew çav û bînahîya mirovahîyê ye.*”²⁸

Dema meriv herdu hedîsan lihev qîyas dîke û li ber çevan ra derbas dike di navbera wan da hevdijberîyek xuya dike. Lewra li gorê hedîsa pêşî sedemê afirandina xelqê naskirin û hebandina Xwedê ye. Li gorî hedîsa paşî jî sedemê afirandina gerdunê Muhammed Pêxember e (s.x.l.). Lê di rastîyê da Mela di navbera wan da tu dijberiyê nabîne.

²⁴ Mela‘Elî el-Qarî, Nureddin Alî, b. Muahmmed, b. Sultan, el- *Esrar’ul merfû‘e fil-exbarûl mewdu‘e*, Darûl Emâne, Beyrût, 1971,273; Di heman rupelê da dibêje: Ev hedîs mewdu‘e.

²⁵ ‘Eclûnî, *Keşfu’l-xefa*, 2123,r. 491. Di heman rupelê da Xwediyê “*Keşfu’l-xefa*” yê gotinek wiha neqil dike: Îmam es-Saxanî dibêje: “Ev hedîsek mewdu‘e; lêbelê ez dibêjim welew ku ne hedîsbe jî bes m’ena wî sehîh e.”

²⁶ Bediuzzaman Seîdê Nursî, *Îşaretu’l îcaz fi mezanni’l-‘icaz*, Weş. Zehra, İstanbul, 2007,19

²⁷ el-Alûsî Ebûl Fedil Şihabûddîn Esseyîd Mahmûd Elbexdadî, *Ruhu’l me‘anî, fi tefsîrul Qurani’l ‘azîm we seb’il mesanî*, I-XXX, Darû İhya et-Turasûl-‘arebî, Çapa 1ê, Beyrût, 1999, XXVII,32.

²⁸ Mela E’lî el- Qarî, *er-Reddû ‘ela el-qailîne bi wehdet-ul wucûd*, Darû’l- Manun li turas, Çapa 1ê Dimeşq, 1995,r. 69.

Mela bi rêya hunera îqtibasê dixwaze wî dijberîya berbiçavî bibersivîne: Her çendan berçavî hevdişberîyek di navbera wan herdu hedîsan were xuyakirin jî lêbelê di heqîqeta xwe da ne dijberê hev in. Ber'eksê vê dijberîyê hev tamam dikin. Lewra Hedîsa ewil dest nîşan dike ku însan ji bo Xwedê nas bike û jê ra perestînê bike hatîye afirandin. Hedîsa duyem jî îşaret dike ku bînahîya Îsanîyetê nûra Muhammed Pêxember e. Bi wî nûra xwe bûye serzincîra hemû pêxemberan û şîrovekarê Qur'ana Pîroz ku ji bo ins û cinan hatîye hinartin da ku ins û cin wî nas bikin û her wî bihebînin. Wê demê munasebetekî mezin di navbera wan da heye.

Seîdê Kurdî vê heqîqetê wiha tîne ziman *“Muhemmed Pêxember mohra tamamê pêxemberan e wesfê hemu enbiyan di xwe da dihewîne. Ew navenda gerdunê ye. Ger ew âlema mezin wek giredarek were xeyal kirin nura Muhammed him dibe dendikê wî him jî dibe semera wî. Ger dunya wek cismek zindî were hesibandin ew nûr rûhê wî ye.”*²⁹

2.1.3. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Qur'ana Pîroz da

Mushefa husn û cemalê sûreta xal û xetan

*Ma telewna xeyre herfin la **we-Qur'anin mecîd***

(Cizirî, 2012, 153)

Mela dibêje ku ez bi Qur'an'a bi rûmet û qedirbilind sond dixwum ku ji mishefa cemala rûyê mehbûbê ku wek Qur'anê tamamê rengên delayê di xweda dihewîne û ji sûretê xal û xetên rûyê wê ku wek Suretê Qur'anê jihev qetandî û bedewe, ji bilê herfa “la”yê ku bi maneya “na” pêve me tiştek nexwend. Yanê em ji cemal û kemala wê mishef û suretê bê qismet û mehrum man. Ev ayet di Suretê Qaf da derbas dibe û Xwedê wiha ferman kirîye:

ق وَالْقُرْآنِ الْمَجِيدِ³⁰

Qaf. Sond bi Qur'ana bi rûmetdar û qedir bilind be.

Di tefsîra Qadî el-Beydawî da têgeha “*el-Mecîd*”ê wiha hatîye şîrove kirin: “*El-Mecîd*” wesfê Qur'anê ye ku bi wateya Qur'ana bi rûmet an kelmê Xwedê ye

²⁹ Bedîuzzaman Seîdê Nursî, Mesnewîya Nûriye, I, Weş. Zehra, Stenbol 2003, r. 127.

³⁰ Qaf, 50/1.

yan jî wesfê wî/ê kesê/a ku weteya Qur'anê hîndibe û li gor hukmê wî tevdigere bi pê paye bilind û şerefyar dibe.³¹

Cîzîrî di beyta jorê da destnîşan dike ku çewa heta kesê/a ku hînî Qur'an û Suretên wî nebe û li gorê hukmên ku di ayet û suretan da hatîye beyan kirin tev negere ew nabe xwedan rûmet û şerefa mezin. Her wisa ew kesî/ê ku de'wa 'eşqa heqîqî bike, heya mishefa 'eşqê nexwîne û şerha xal û xetên ku di quwa suretê Qur'anê dane neke û li gorê hewceyên wî tevnegere, ew nabe ehlê 'eşq û evînê.

2.1.4. Îqtîbasên Ayetên di Derbareyê Qisseyên Pêxemberan da

Qur'an Pîroz di gelek cîyan da mînaka serpehatîyên pêxemberan dide. Armanc ji qalkirina qisseyên Pêxemberan ewe ku aşîtxwaz û gazîkerê dînê Xwedê rêya xwe bi tîrêjên nûra wan ronahî bike. Melayê Cîzîrî jî bi îqtîbasa ji ayetên derheqê pêxemberan da rêya xwe ronîdar dike.

2.1.5. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Âdem Pêxember da

Barî ji "we- 'ellem" ku xeberdar kirin

Îro tu bizan âdemê esmayim ez

(Cîzîrî, 2012, r. 168)

Xwedayê Barî bi sîrrê ayeta ku وَعَلَّمَ آدَمَ الْأَسْمَاءَ كُلَّهَا "wî Âdem hînê hemî nav û wateya tiştan kir." min gerenad âlim û zana, nexwe tu min wek Âdem Pêxember zanayê temamê navên tiştên heyî û sîrrên gerdunê bizane.

Mela di vê beytê da ji ayeta ku di Suretê Beqere da derbas dibe îqtîbas wergirtîye. Xwedê Te'âla wiha gotîye:

وَعَلَّمَ آدَمَ الْأَسْمَاءَ كُلَّهَا ثُمَّ عَرَضَهُمْ عَلَى الْمَلَائِكَةِ فَقَالَ أَنْبِئُونِي بِأَسْمَاءِ هَؤُلَاءِ إِنْ كُنْتُمْ صَادِقِينَ³²

"Xwedê, Âdem (Pêxember) hînê navên hemû tiştan kir. Paşî jî wan navan nişanê ferîşteyan da û ji wan ra got: De ka navê van tiştan ji min ra bibêjin eger hun (di wî doza xwe da) rastbêjin".

³¹ el-Qadî el-Beydawî, Ebu Seîd Abdullah b. 'Omer, b. Muhammed, *Enwaru't-tenzil we esraru't-te'wil*, I-II, Darûl- Kutubî'l- 'Îlmîyye, Çapa 1ê, Beyrut, 2003, II, r. 420.

³² Beqere, 2/31.

Seîdê Kurdî di kitêba xwe yê bi navê Îşaretû'l-Î'caz da dibêje: “*Ev ayet mucîza Âdem Pêxemberê ku bi wê ji ferîşteyan ra meydan xwendîye û heta di doza xîlafetîyê da mucîza benî beşerê ye.*”³³

Mela di vir da bi rêya hunera îqtîbasê angaşte dîke û dibêje: Xwedê, Te'âla Âdem Pêxember bi qabilîyeta ilmê gerandîye xelîfe li ser rûyê erdê û hînî temamê tiştên ku di gerdûnê da bi wan esmayan ve gêrêdayî ye. Her wisa ez jî mezherê mucîza Âdem (s.x.l.) bûme û ez zanayê mertebeyên ‘eşqa Xwedayî me. Nexwe min ‘eybdar nekin. Her wekê Mela jî dibêje; “mucîzeyên pêxemberan ji ademîzadeyan re mînak in.”

2.1.6. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Îbrahîm Pêxember da

Husn û surra sûretê kes didêrit qudretê

Lew di eslê dûrre ji te'neyê lemma efel

(Cizîrî 2012,r. 241)

Spehîtî û bedewîya rûyê dildarê ji quwet û qudereta kesan dere. Ma qey tu kes dikare delalî û di newazîya rûyê dildarê biafirîne? Nexêr ne qabile ku kesekî bikare şemal û cazîbetîyê bidete rûyê mehbubê. Lewra neqş û spehîtîya sûretê dildarê ne adetî ye. Ew husna zatê îlahî ye, ne îmkanî ye ku destekarîya benî âdemîyan tê da hebe. Her wisa ji tehma ku di buyera Ibrahîm Pêxember da ji bo stêrk û roj û heyîvê ra hatî gotin dûr e.

Ev ev hunera îqtîbasê ku Mela di vê beyta xwe da bikar anîye di Qur'ana Pîroz da di behsa Qisseyaya Îbrahîm Pêxember da derbas dibe. Dema Îbrahîm Pêxember li dunyayê çavê xwe vekir venekir xwe di nêv şaristaniya qewmekî putperest da dît. Ev putperestî wek xîmê hebûna wan ê maddî û menewî hatibû qebûl kirin. Aha di vê rewşê da Îbrahîm Pêxember li hember vê putperestîya wan derket. Lêbelê xwest ku bi rê û ribazeke eqlî vê şaristanîya pûç bes li ber çavê wan muqeddes, bêwate derixine. Qur'an a Pîroz wî têkoşînê wiha tîne ziman:

فَلَمَّا جَنَّ عَلَيْهِ اللَّيْلُ رَأَى كَوْكَبًا قَالَ هَذَا رَبِّي فَلَمَّا أَفَلَ قَالَ لَا أُحِبُّ الْآفِلِينَ³⁴

³³ Bedîuzzaman Seîdê Nursî, *Îşaretu'l-îcaz fî mezanni'l-îcaz*, Weş. Zehra, Stenbol, 2007,r.244.

³⁴ En'am, 6/76.

“Her çi dema tarîya şevê da ser Îbrahîm wî stêrkek dît û got: Ev stêrk rebbê min e; lê dema stêrk çû ava. Îbrahîm got: Ez nahebînim wî tiştê ku biçe ava.” Hinek tefsîr dibêjin: “Ev stêrk yan stêrka Gelavêjê yan jî Jupîter bûye.”³⁵

Qur’ana Pîroz di ayeta piştê vê ayetê da wiha ferman dîke:

فَلَمَّا رَأَى الْقَمَرَ بَازِعًا قَالَ هَذَا رَبِّي فَلَمَّا أَفَلَ قَالَ لَأُنَبِّئُكَ إِنَّهُ كَانَ صَوْنًا مِّنَ الْعَمَلِ الصَّالِحِينَ³⁶

Paşî dema dît ku heyîv derket û ji wê stêrkê bi şewq û rewneqtir e, got: Rebbê min ev e. Dema ku ew jî wek stêrkê çû ava. Got, ez sond dixwum eger Xwedayê min rêya rast nîşanî min nede helbet ezê bibim ji wan kesên ku rêya rast şaşkirine. Piraniya Zanayên tefsîran dibêjên ku pêşîya van gotinan da jî Îbrahîm Pêxember Rebbê xwe nas dîkir. Delîlê vî qasê ew e ku îbrahîm Pêxember di berîya vê qewimînê da ji babê xwe Azer ra wiha gotibû: Ma qey tu jî ew putên ku bêçare û bêkêrin ji xwe ra digerin îlah? Birastî ez te û gelê te di rêwinda bûnîyek eşkere da dibînim³⁷.

Mela di vê beyta xwe da angaşte dîke ku di bingeha eşqa wî da merîfet û muhebbet heye. Doza evîna wî durê ji ‘eybdarkirina ku îbrahîm Pêxember ji bo stêrk, heyîv û rojê bikaranîye da ku doza putperestîya qewmê xwe vala derîne. Yanê Mela dibêje di bingeha doza putperestîya qewmê Îbrahîm Pêxember da şîrk û cehalet hebûye. Lê belê di bingeha evîna min da muhebet û merîfet heye. Şewq û şemala eşqa min ne wek stêrka ne ku bi derketina heyîvê wînda bibe; ne wek heyîvê ye ku bi derketina rojê xef bibe, ne jî wek rojê ye ku bi hatina şevê biçe ava, lewra şewq û şemala wî tewhîd û beqa ye.

Lî yetmeînne qelbî eynû l-yeqîn dibexşit

‘Eynu l-‘eyan divêtin kafî nehîn dirayet

(Cizirî, 2012,r.115)

Dildar bi zanîna yeqînî dixwaze ku dilêmin ê bi xwişîş li ser rewşa merheleyên eşq û razên evînerestîyê razî û rehet bike. Lê belê ev zanîn çendan yeqînî û bê şik û şibhe be jî, lê dîsa pêwistîya wî bi delîlên eqlî heye. Her wiha

³⁵ el-Qadî el-Beydawî, b.n.b, I, 308.

³⁶ En ‘am, 6/77.

³⁷ er-Razî, Fexruddîn Muhammed b. Omer b. Huseyn b Ali Eteymî, *Tefsîr ul kebir we mefatihul xeyb*, I-XVI, Darul Hedîs, Qahîre, 2012,VII, r.46.

delîlên eqlî jî pêdivîya wî bi fikrandina zêde heye. Ev rewşa ha têra razîbûna dilê min nake. Ji bo dil aramîya min hewcedarî bi dîtina çavan heye.

Di vê beyta Mela da ji du ayetan hunera îqtibasê hatîye pêkanîn. Yek di Suretê Beqere da derbasdibe ku Xwedê wiha ferman kirîye:

وَأَذَّ قَالَ إِبْرَاهِيمُ رَبِّ أَرِنِي كَيْفَ تُحْيِي الْمَوْتَى قَالَ أَوْمَأَ نُوْمِنُ قَالَ بَلَىٰ وَلَكِنْ لِيَطْمَئِنَّ قَلْبِي³⁸

“*Bîne bîra xwe! Dema ku Îbrahîm Pêxember ji Xwedayê xwe ra got: Ey Rebbê min! Nîşanê min bide ka tu mirîyan çewa sax dikî. Xwedê got: Qey te bawerî neanîye (ku ez qadirê mirî saxkirinê me?) Îbrahîm got: Min ji dil bawer anîye (ku tu mirîyan sax dikî) (lê ez dixwazim tu nîşanê min bidî) daku dilê min qenctir rihet be.*”

Ayeta duduyan jî di Suretê Tekasur da wiha derbas dibe:

ثُمَّ لَتَرُوْنَهَا عَيْنَ الْبَاطِنِ³⁹

“*Piştira hûnê dogehê bi dîtinekê yeqînî bibinin.*”

Meriv dikare pêwendîya beyta Mela di gel her du ayetan wiha binirxîne: Di bawerîya dînê Îslamê da zanîna esehî, bi gelemperî li ser sê şaxan hatîye sinifandin:

- ✓ **‘İlmel yeqîn:** Zanîna ku bi delîlên nazarî û eqlî yan jî bi delîlên wehyî tê qebul kirin.
- ✓ **‘Eynel yeqîn:** Zanîna ku bi delîlên berbiçav tê dîtin.
- ✓ **Heqel yeqîn:** Jiyan û zewq kirina wî zanîna ku bi delîlên nezerî û berbiçav hasilbuye⁴⁰.

Di nêv ehlê ‘ilm û qelemê da ev mînaka meşhur tê dayîn: “Zanyarîya her aqilmendê bi hebuna mirinê ‘ilmel yeqîn e, dîtina melekê mewtê dibe ‘eynel yeqîn, zewqkirina mirinê dibe heqel yeqîn”.

Li ser vê bingehê Mela bi hûnera îqtîbasa “lî yetmeînne qelbî” dilê aşîqê şibandîye agirê Îbrahîm Pêxember. “*Dema ku Nemrud dibêje: Ez jî dikarim sax bikim û bimirnim. Lêbelê Îbrahîm Pêxember got: Xwedê miriyan bi vegerandina ruh bi bal bedenê wan ve sax dike. Nemrud got: Qey te bi berbiçev dîtîye? Li ser vê Îbrahîm*

³⁸ Beqere, 2/260.

³⁹ Tekasur, 102/7.

⁴⁰ Ehmed Şihabûddîn, elxefacî, elMisrî, *Nesîmu-r Riyad fî Şerhê ş-Şîfa, li qadî'iyad I-IV, el-Metbe'etul Ezherîyye, Çapa1ê, Qahîre, 1328 k, IV,r. 4.*

*Pêxember jî jibo ku dilê wî li ser bersivdanê qencîr rûne ji xweda daxwaz kir got, nîşanê min bide ka tu bi çî awayê miriyan sax dikî*⁴¹.

Ev tetmînkarîya dil, bi gotinan an bi rêbazên eqlî nayê şirovekirin; tenê bi dîtina delîlê berbiçev tê ferq kirin. Her wiha Mela jî rewş û razên îşqê bi yeqînî bawer kirîye û jê dizane; lêbelê ji bo ku qencîrîn dile wî rahet û razî bibe pêwîst e ku dildar wan raz û rewşên eşqê bi delîlên berbiçev nîşanê aşîqê bide. Lewra di berîda pêşîyên me gotine: “Dîtina çevan qinyeta dilan”.

Ger ji wê horî siriştê ‘işweyek izharî bit

Dê bi bit narê xelîlulah û dojer sarî bit

(Cizirî, 2012, r. 103)

Eger yek nazî û delalî ji dildara tebîethorî xûyabe wê ew dojecha ku ez tê da me dê wekê agirê Îbrahîm Xelîl sar û hênîk be. Yanê çewa ku Xwedê ew agirê ku Nemrud hilkir û Îbrahîm Xelîl avête navê sar kir û jê ra gerande ewlehî wê agirê evîna min jî li min sar û xweşîbe. Di vê beyta Mela da hem telmîh heye hem jî îqtibas heye. Telmîh jî wek îqtibasê têgehekî ilme bed’î ye. “*Telmîh, ew e ku fehwa gotina helbestvan an pexşannivîsê îşaretê bal qisse, helbest an jî meseleyekê ku di navbera insanan da meşhur bi ku zikra her yek ji wan bike.*”⁴²

Mela îqtibas ji du ayetên ku di Qur’ana pîroz da derbas dibin kirîye. Her çendan îqtibasa kelîmê be jî, lêbelê mebest jê kelim e. Yek ji wan ayetan di Suretê Nîsa da derbas dibe:

وَأَتَّخِذَ اللَّهُ إِِبْرَاهِيمَ خَلِيلًا⁴³

“*Îbrahim ji xwe ra kirîye dost*”. Yê duyem jî di Suretê Enbîya da derbas dibe:

قُلْنَا يَا نَارُ كُونِي بَرْدًا وَسَلَامًا عَلَىٰ إِِبْرَاهِيمَ⁴⁴

“*Me got Ey agir! Tu li ser Îbrahim bibe sar û selametî*”.

Mela ew agirê bi rastî ku taybetmendîya wî şewitandine, çewa ku di ayetê da jî di wî wateyê da hatîye bikaranîn, di wateya mecazî da bi karanîye; lewra Mela dilê

⁴¹ el-Qadî el-Beydawî, b.n.b, I,r.137.

⁴² Teftezanî b.n.b,r. 455

⁴³ Nisa, 4/125.

⁴⁴ Enbîya, 21/69.

evîndarê şibandîye agir û dojhê nazî û delalîya dildarê şibandîye sarbûna bi hênikayî. Yanê eger dildar rindî û narînîya xwe nîşanê evîndarê xwe bide wê agirê dile wî sar û hênik bibe.

2.1.7. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da

Lami ê sirra tecella ser li Torê dil di dit

Debt-i nakit wî mecalê sedhezâr eflak -i rûh

(Cizirî, 2012, r. 136)

Eger ronahîya birqa sirra tecelîya Xwedê li wî dilê wek çîyayê Torê Sîna bikeve wî gavê sed hezar felekên asîmanan jî nikarin ku nehilîn ew ruh ber bi meqseda xwe ku her Xwedê pê dizane bilind bibe.

Ev ayeta ku di vî beyta Mela da hatiye îqtîbas kirin di Suretê E'raf da derbas dibe.

وَلَمَّا جَاءَ مُوسَى لِمِيقَاتِنَا وَكَلَّمَهُ رَبُّهُ قَالَ رَبِّ أَرِنِي أَنْظُرْ إِلَيْكَ قَالَ لَنْ نَرَاكَ وَلَكِنْ نَنْظُرُ إِلَى الْجَبَلِ فَإِنِ اسْتَقَرَّ مَكَانَهُ فَسَوْفَ نَرَاكَ فَلَمَّا بَهِجَى رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَى صَعِقًا فَلَمَّا أَفَاقَ قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ إِلَيْكَ وَأَنَا أَوَّلُ الْمُؤْمِنِينَ⁴⁵

“Dema Musa di wî wexta ku me jê ra qewilkirî, hate (Torî Sîna) Xwedayê wî pêra xeber da. (Musa) Got: Xwedayê min! Zatê xwe nîşanê min bide; ku ez (bikarim) li zatê te temaşe bikim. (Xwedê) got: tu yê qet zatê min (bi wan çavên fanî nebînî); bes li vî çîyayî (ku ji te qewîtir e) binere, eger ew çîya (dibin tecelîya min da di cêhê xweda) xwe ragre; paşî dibe ku tu min bibînî. Dema ku Xwedê ezameta xwe li çîyê zahirkir çîya û hilweşa û bi erdê ra bû yek. Musa jî bêhiş ket. Êca dema hiş hate serî got: Xwedayê min! Ez te ji hemû kêmasîyan pak didêrim. Min tewbe (be li ber ezameta te ku cerekdin wan daxwazîyên nekim), ez ewilê wan xwedabaweran im (ku min bawerî anî bi çavê dine ne pêkane dîtina te)”.

Hinek alimên ehlê dil, bi rêya tefsîra îşarî dibêjin: Xwedê Te'âla xwest ku Musa (s.l x.) ji bin perda kiryarî, sifet û zatê beşerî da xilas bike. Peyman da ku bi sih şevan li çîyayê Torê Sîna ji bo wî îbadet bike û paşî wî sih şevê bi deh şevên din tamam kir. Di wî deh şevên dawî da Xweda Tewrat jê ra nazil kir. Bi vê avayê Xweda peyman xwe bi çil şevan tamam kir. Tê gotin ku Musa Pêxember di şeva

⁴⁵ E'raf:7/143

sihan gihişte meqamê şûhûda Zatê Xwedê digel ku ezîfîya xwe fena nekirîye, Xweda ji Musa ra got: لَنْ تَرَانِي: وَلَكِنْ انظُرْ إِلَى الْجَبَلِ فَإِنَّ اسْتَقَرَّ مَكَانَهُ فَسَوْفَ تَرَانِي. yanê bes tû binere wicûda xwe yê wek çîyayê; eger ew di cî yê xwe da bisekine hingê tu yê min bibînî. فَلَمَّا نَجَّى رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَى صَعِقًا. Dema xweda tecelîya xwe nişanê çîyayê da çîya li holê rabû hilweşa û Musa jî xwe çû kete halê fenabûnê, فَلَمَّا أَفَاقَ gava hate ser hişê xwe got: قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ إِلَيْكَ وَأَنَا أَوَّلُ الْمُؤْمِنِينَ: Tu ji wan daxwazîyên min pak û mûnezzezh î. Ez bi îlm û şuhudê vegeşîyame li bal te her tû heyî. Ji keynê heyîna te tû heyîn tûneye. Ez di merteba erwahanda di sefa ewilda me ku meqamê ehlê şehudê ye.⁴⁶

Di bin vê menaya îşarî da Mela jî her wekê wiha dibêje: Heya enanîyeta wek çîya yê Torê Sîna, li bal aşiqê hebe, nabe qabilê dîtina meşuqa xwe ku Xwedê ye. Ji bo ku Me'suq xwe nişanê aşiqê bide pêwîste aşiq hebûna xwe ji bo meşûqê mehû bike. Di fenabûyîna aşiqê da tecelîya xwenîşandana me'suqê heye.

Heta aşiq nebe fenafîllah ne îmkane ku mezherê tecelîya nura Xwedê be. Ev fenabûn destêpaka meqamê gihiştina Xwedê ye. Çi gava aşiq gihişte vê meqamê sed felekên asîmanan jî hebin wê nîkarîbin wê wesletê asteng bikin. Tê gotin ev ayet bi maneya îşarî dibe delîlê wehdetê şihudê.

Wer ji ber perdê yedê beyda bi mucîz bête der

Şems û kewkeb dê hilên 'âlem teji enwar bit

(Cizirî,2012,r.103)

Eger bi rêya mûcîzekî destê spî û bi şemal ku mebest jê dildare ji pişt perdê derkeve wê roj û stêrk bi nura wî rohnîdar bin û alemê teji nurkin.

Di Qur'ana pîroz da *yed ê beyda* di çend suretan da wek mucîze yê Musa Pêxember derbas dibe. Yek ji wan suretan Suretê E'rafe ku Xwedê wiha ferman kir ye:

وَنَزَعْنَا يَدَهُ إِذَا هِيَ بِيضَاءَ اللَّيْلِ نَاطِرِينَ⁴⁷

⁴⁶ e1-Alûsî Ebûl Fedil Şihabûddîn esSeyîd Mahmûd Elbexdadî, *Ruhul me'ani, fi tefsîrul Quran il 'azîm we seb'il mesanî*, I-XXX, Dar û İhya Et-turasûl- Erebi, Çapa1ê, Beyrût, 1999, IX,r. 74.

⁴⁷ E'raf, 7/108.

Destê xwe ji cêb an ji paşkê xwe deranî destê wî ji bo bîneran ra spî bu wek rojê dibiriqîya. Tê ragihandin ku rohnîya destê Musa Pêxember ji adetê derbûye, lewra dema destê xwe ji paşkê xwe dertanî wisa spî û rohnîdar dibû ku rohnîya wî ji ronahîya rojê zehftir bûye.⁴⁸

Mela di vê beyta xwe da bi hunera îqtîbasa naqis şewq û şemala hebîba xwe bi destê Musa Pêxember sembolîze kirîye.

2.1.8. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ehlê Sebe yê da

Min dîlberek wek durr heyê mehbûb û şîrîn sur heyê

Husn û cemalek pur heyê belqîs sifet mesken seba

(Cizirî,2012,r.37)

Dildara ku min hebandî wek durrê dêmnûr û bedew e. Her wiha dilrûba û nazenîn e. Di spehîfî û ihtîşama xwe da mîna delalî û ihtîşama Belqîsayê ku melîkê Sebeyê ye bûye.

Di vê beyta Mela da digel hunera îqtîbasê telmîh jî heyê. Lewra îşaretê hîkayeta Sûleyman Pêxember û Belqîsayê kirîye. Her wisa Mela îqtîbasa bêjeya mesken û Seba yê kirîye. Ev herdu bêje Qur'ana Pîroz da di Suretê Sebe da wiha derbas dibin:

⁴⁹ لَقَدْ كَانَ لِسَبَإٍ فِي مَسْجِدِهِمْ آيَةٌ جَنَّتَانِ عَنْ يَمِينٍ وَشِمَالٍ كُلُوا مِنْ رِزْقِ رَبِّكُمْ وَاشْكُرُوا لَهُ بَلَدَةٌ طَيِّبَةٌ وَرَبُّ غَفُورٌ

“Bi Sond be di cihê sekna ehle sebê da delîleke mezin a ku qudereta me nîşandide hebû. Ew delil ev e ku hem li alîyê rastî hem li alîyê çepê (newalê) du bostanên gelek geş hebûn. (Ji wan ra hate gotin) ji wî rizqê ku Xwedayê we daye we bixwin û şikir bikin. (Ev bajar) bajerek gelek xweş e. (Xwedayê we yê ku nimet dayî we û ji we şikirandinê dixwaze Xwedayekî ‘efwûkar e.”

Hinek tefsîrzan dibêjin Sebe, navê ‘eşîrekê bûye, hinek din jî dibêjin navê mirovekî ye. Hineke jî dibêjin navê bajarê wan bûye. Serokê vê eşîrê Belqîsa bûye.⁵⁰ Tê gotin ku Xwedê qencîyek wisa li welatê ehlê Sebeyê kirîye ku bi saya berekata av

⁴⁸ el-Qadî El-Beydawî, b,n,b.I, r.352.

⁴⁹ Sebe, 34/15.

⁵⁰ ez-Zemexşerî Ebûl Qasim Carullah Mahmud b.‘Umer, *Tefsîrul Keşşaf*, Darûl Me‘arif, Beyrût, 2009, r.780.

û ax û hewayê paqij, temamê welatê wan bi bostan û dar û ber bûye. Dema jinek ji ehlê Sebeyê zembîla xwe dida li ser serî xwe û di bin darên fikîyên bostanan da dimeşîya fêkî bi xwe diketin nav zembîlê û bê zehmetî zembîla wê tejî dibû. Her wiha tê gotin ku bajerekî wisa paqij bûye ku mar û morên zîyankar wek kêç, mêş, kermêş û dupişk li wir nedijîyan⁵¹.

Mela bi hunera îqtîbasa naqis mehbûba xwe ji aliyê mesken û sifet ve şibandîya Belqîsa yê; ku sultanê qebîla Sebeyê bûye. Di vir de dîyar e ku Mela, îqtîbas di wateya wî yê eslî da bika ranîye, lewra Mela bi wê îqtîbasê behsê ji delalî û mezinahîya dilbera xwe dike. Her wisa ayet jî behsa xweşî û bextewarîya ehlê sebayê dike.

2.1.9. Ayetên derbarê Qal û Belayê da

Min diber qalû bela batin vi wêra bû evîn

Hêj li ser 'ehdda elestim ta bi roja axirîn

(Cizîrî, 2012, r. 259)

Di berîya roja qalû belayê da jî dil û derûnîya min bi evînê ra bû. Hêjî ez li ser peymanî roja ku Xwedê ji erwahan ra gotibû : “*Ma qey ez ne Rebbê we me? Wan jî gotîbûn: Belê tu Rebbê me yî.*” Ezê heya qîyame tê jî li ser ehda xwe bim. Mela heman îqtîbasê di van beytan da jî dubare dike.

Hê di ber qalû belayê belko ev 'âlem nebû

Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbetê mîna nebû

(Cizîrî, 2012, r.344)

'Erş û kursî hêj dimexfî bûn di kenza qudretê

Hûsnê heq bû istîwayê lami 'a 'işqê hebû

(Cizîrî 2012, r. 344)

Hêj berya ku Xwedê Te'âla erwah neafirandibû û peymanî ku “*Belê Tu rebbê me yî*” ji wan negirtibû belkû hêj berya afirandina vî cîhanê û çerx û feleka

⁵¹ Ebû Hayyân Muhammed b. Yûsuf b. Alî b. Hayyân el-Endelûsî, *Behrûl el-Mûhît*, I-V, Darûl - Wefâ, Çapa1ê, Mısır, IV, 2014, r. 22.

zemanê û zivirandina gerdûnê û banê esmanan heta hêj berê ku erş û kursî jî di xezîna qudreta Xwedê da veşartîbûn, dîsa hisn û cemala Xwedê di kemalêda bû û pertewa işqê jî hebû.

Mela di gelek beytên xwe da ji ayeta “ أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ قَالُوا بَلَى ” yê îqtîbas kirîye. Di hemû cîyanda jî di heman wateyê da bikar anîye. Ev ayet di Surete‘Eraf da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

وَأِذْ أَخَذَ رَبُّكَ مِنْ بَنِي آدَمَ مِنْ ظُهُورِهِمْ ذُرِّيَّتَهُمْ وَأَشْهَدَهُمْ عَلَىٰ أَنفُسِهِمْ أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ قَالُوا بَلَىٰ شَهِدْنَا أَنَّا نَقُولُوا يَوْمَ الْقِيَامَةِ إِنَّا كُنَّا عَنْ هَذَا غَافِلِينَ⁵²

“Wî gavê bi bîra xwe bîne! Dema ku Xwedayê te ji pişta Ademîyan zurrîyeta wan girt û ew gerandin şahid li ser nefsa wan bi xwe û (ji wan ra got): Ma qey ez ne Xwedayê we me? Hemûyan gotin: Belê em şehdeyî didin (ku Tu Xwedayê meyî). Ev şehdeyî ji bo weye; da ku roja qîyametê hun nebêjin: Em haj jê nebûn.”

Di heqê tefsîra vê ayetê da du qewlên mufesîran hatîye ragihandin:

1. Dema Xwedê Âdem Pêxember afirand, zurrîyeta wî yê ku hêj wek zerreyan bû ji pişta wî deranî û peyman ji wan girt ku ew Xwedayê wan e, wan jî vê yekê iqrar kirin û bûne şahid. Ev maneya ha bi gelek rêyan ji Pêxember (s.x.l) hatîye rîwayet kirin û ciwatek ji sehabîyan jî wisa gotine.⁵³

2. Ev peymana han di wateya mecazî da hatîye bikar anîn. Ev ne ku di ‘alema erwahan da, belkû di dema afirandina bedena ademîyan da pêk tê. Piştê ku insan di malzara dayîka xwe da dikemile, Xwedê di fitreta wî da delîlên ku Rebbîtiya xwe nîşanê wî bide di afirîne paşê ew jî bi eqlê xwe dibe şahidê wan delîlan.⁵⁴

Mela vê ayetê li gor maneya ku di cîhana erwahan da Xwedê ji ademîyan ra xeber daye tefsir kirîye. Di van beytên xwe da balê dikşîne li ser qedîmtîya ‘eşq û muhebbetê. Lewra dibêje berîya qalû belayê ku hêj erwahan ne gotibûn “*Belê Tu Xwedayê me yî*” pertewa işqê hebû.

Ev spehîti û hebandin hêj ku neketibûn di hûkmê sifatan di zatê Xweda da yekbûn. Bi raza hedîsa qudsî ku Xwedê dibêje: “*Ez gencîneyek e veşartî bûm dema min xwest ku ez werim nasîn wî demê min xelk afirand da ku min binasin.*” Xwedê ji

⁵² ‘Eraf:7/172.

⁵³ İbn Cuzeyy, Ebulqasim Muhammed b.Ehmed el-kelbî, *et-Teshîl li ‘ulûmî-tenzîl*, I-II, Dar’ûl-Kutubîl-‘İlmîyye. Çapa 1ê, Beyrût,1995, I, r. 328.

⁵⁴ İbn Cuzeyy, b.n.b, r. 328.

erwhan ra got: “Ma qey ez ne Xwedayê we me?” Ruhan gotin: “Belê tu Xwedayê me yî.” Piştê afirandina mexluqan hisn û evîn ji zatê Xwedê cûda bûn ketine hûkmê sifatan. Êdî bi navê hudûsê xwe bûyeran ve girtin. Mela jî li ser gotina sofîmeşrebên rêwîyên heqîqetê ye ku dibêjin: “*Havîna gerdunê muhabbet û evîna Xwedê ye*”.⁵⁵

Xwedê bi vîn û heskirna xwe mexlûq afirandin û bi ruhên benî ademîyan da îqrar kirin û wan jî gotin belê. Paşî Mela wiha dibêje ez hêjî li ser wî iqqar û peymanê me û heya roja qîyametê jî ezê li ser wî peymanê bim.

2.1.10. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Hecê da

Sunbulên re'na li ber taqê helal

Wê dîkin se'yê li merwe w sefa

(Cizirî, 2012,r.55)

Ew gulîyên ku di xweşikahiya xwe da wek sinbulan nazik in û li ber herdû girikên birûyan mîna girikên Sefa û Merweyê ku hecî di navbera wan da se'î dîkin ku mebest jê enî û rû ye.

Di Qur'ana Pîroz da Sefa û Merwe di suretê Beqere da derbas dibe.

إِنَّ الصَّفَا وَالْمَرْوَةَ مِنْ شَعَائِرِ اللَّهِ فَمَنْ حَجَّ الْبَيْتَ أَوْ اعْتَمَرَ فَلَا جُنَاحَ عَلَيْهِ أَنْ يَطَّوَّفَ بِهِمَا⁵⁶

Bêguman Sefa û merwe ji nişanên Xwedê ne. Kesê/a ku bi nîyeta hec û u'mre yê Ke'beye ziyaret bike tu guneh li ser wan nîne ku Sefa û Merwayê jî ziyaret bikin.

Sefa û Merwe du girikên ku berê xwe didin Ke'ba pîroz. Tê gotin ku Se'ya di navbera Sefa û Merwa yê da ji 'adetên dewra cahilîyê bûye. Di vî serdemê da li ser gire sefayê pûtek bi navê Isaf hebûye û yek ji li ser girê Merwa yê bi navê Naîle hebûye. Ehlê Cahilîyê dema di navbera sefa û merwayê se'î dikirin bi destên xwe wan herdû putan jî mesih dikirin.

Dema Îslam hat, temamê pûtan hatin şikandin. Xwedê bi nazilkirina ayeta:

“Bêguman Sefa û Merwa ji nişanên Xwedê ne”⁵⁷ adetê serdema cahilîyê guherand.

⁵⁵ Seîd Nursî, *Sözler*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, r. 784.

⁵⁶ Beqere, 2/158.

⁵⁷ el-Qadî El-Beydawî, b.n.b,I, r.96.

Mela ev kelîmeyên ku Qur'ana Pîroz gerandîye nîşanê Xwedê bi rêya hunera îqtîbasê di wateya mecaz da bikar anîye. Lewra enîya mehbûba xwe şibandîye Sefa yê, rûyê wê jî şibandîye Merwa yê, gulyên wê jî şibandîye hecîyên ku di nav bera sefa û merwayê se'î dikin. Di ayetê da Sefa û Merwa nîşanên perestin û evîna Xwedê ye. Mela jî di wateya nîşanê pîrozîya dildarê da bikar anîye.

2.1.11. Îqtîbasên Ayetên Derbarê Melekê. Cibrîl (Melekê Wehyê) da

Husnek munezzeh sewirrand nura hebîb jê afirand

A'lem di kunhê heyirand ruh il- qudus can nefxe da

(Cizirî, 2012,r.67)

Xwedayê Te'ala bi sirra navê xwe yê “Elcema” ewil nûr û husnek ku pakê ji her kêmasîyê çêkir. Ji wî nûrê jî nûra heqîqeta Muhammedî ye afirand. ‘Âlem hemû di heqîqeta wî da heyirî hişt. Bi fermana Xwedê Cebraîl (a.s) jî ji wî husna pak pîfkire ruhê her benderuhê.

Di Qur'ana Pîroz da ev parçe ayet ku Mela îqtîbas kirîye di çend suretan da derbas dibe. Di hemû cîyên ku derbas dibe jî wek navê Cebraîl (a.s) hatîye bikar anîn. Bo nimûne Xwedê di Suretê Beqere da wiha ferman kirîye:

تِلْكَ الرُّسُلُ فَضَّلْنَا بَعْضَهُمْ عَلَى بَعْضٍ مِنْهُمْ مَنْ كَلَّمَ اللَّهُ وَرَفَعَ بَعْضَهُمْ دَرَجَاتٍ وَآتَيْنَا عِيسَى ابْنَ مَرْيَمَ الْبَيِّنَاتِ وَأَيَّدْنَا بِرُوحِ الْقُدُسِ⁵⁸

“Ev pêxemberên ku me behsa wan ji te ra kirî me hinek ji wan li ser hinekên din ra çêtir dêrane. Ji hinek ji wan ra Xwedê raste rast bi wan ra xeberdaye. (Her wekê Musa û Muhammed Pêxember) Xwedê di cihet derecan da hinekan jî bilind kir. Hem me mucîzeyên eşkere daye Isayê kurê Meryemê û me bi ruhû'l-qudûs piştevanîya wî kirîye.”

Di tefsîra Fexruddîn er-Razî da li ser vê ayetê gotinek wiha derbas dibe: Çima Cebraîl (a.s.) ra tê gotin “Ruhu'l-Qudûs” lewra çewa vejandina bedenê bi ruh çêdibe, îhyaya dîn jî bi Melekê Cibrîl çêdibe. Ji ber ku ew melekê wehyê ye. Dîn jî bi wehyê tê zanîn.⁵⁹

Xwedê Te'ala îhyaya dîn bi “Ruh'ul-qûdus” ku melekê Cibrîle çêkirîye; çûnkî melekê wehyê ye û dîn ji bi wehyê tê zanîn. Her wisa Xwedê vejîna ademîyan

⁵⁸ Beqere, 2/253.

⁵⁹ er-Razî, Fexrûddîn, b.n.b, II,r. 204.

jî bi wî daye çêkirin lewra dema Xwedê Âdem Pêxember şekiland paşî ferman kir (Ruhu'lqudus) bi nûra Muhammed Pêxember pifkire cesedê Âdem Pêxember kû bavê mîrovahîyê ye.

2.1.12. Ayetên Di Derbareyê Stêrkên Asîmanan Da

Zuhre bi qeranê qabê qewseyn

We-n-necmê iza hewa bi- midrac

(Cizirî, 2012,r.128)

Wateya vê beytê bi wateya beyta beriya xwe girêdayî ye. Sond be bi wî stêrka li rûyê ezman ku dema sibe dibe diçe ava. Ev dem dema kêfxweşîya hemû melek û felekan in ku li hember şewqa taca dildarê ketine û reqs û gerê. Roj û stêrk û bircên esmanan jî ketine xelesa reqsê û stêrka qurixê jî bi nêzikahî li pêşberê herdû birhan, govend girtîye.

Melayê Cizirî di vê beytê da bi vê ayetê hunera îqtîbasa tamam bi kar anîye ku di Suretê Necm da derbas dibe. Xwedê wisa ferman kirîye.

وَالنَّجْمِ إِذَا هَوَىٰ⁶⁰

“Sond be bi stêrkê ku dema diçe ava”.

Tefsîrzan di vê ayetê da li ser têgeha والنَّجْمِ rawestîyane. Hinek ji wan gotine Xwedê di vir da bi tamamê stêrkan sond xwarîye, hinekan jî gotine mebest jê stêrka Sureyayê ye.⁶¹ Di her halê da, Xwedê li ser rastîya wehyê ku ji resulê xwe ra şandîye bi stêrkan sond dixwe. Di vir da munasebetek pir ecêb heye: Çewa Xwedê stêrk gerandîye delil ji bo rêwîyên şevê, xeml û zînet ji bo asîmanan, wisa jî wehya pêxemberan jî gerandîye xemla rûyê zemînû. Ger mîrateya pêxemberan nebe rûyê erdê reş û tarî dibe.⁶²

Di vê beyt da Mela sond dixwe ku ev gerr û reqsa stêrkan digel şewq û ronahîya wan hemî jî, ji ber şewq û şemala mehbûbê ye. Yê ku ronahîyê dide wan mehbûb e, ew fanîne yanê diçin ava bes mehbûb baqî ye.

⁶⁰ Necim, 53/1.

⁶¹ el-Qurtubî, b.n.b,IX, r.55.

⁶² es-S'edî, Abdurahman b. Nasir, b.n.b, r.818.

2.1.13. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Bihûştê da

Berderê baxê wisaleş hatife awaz-î dad

Hazîhî cennatu 'ednin fe-dxuluha xalidîn

(Cizîrî 2012, r. 260)

Dema çavê min bi nûra ser û çavên dildarê ket ku wek heyîva çardehşevî şewq dide hema ez çûme secdê. Lewra dilê min di nêv xwînê da werbû. Hingê li ber derê bax û bexçeyê gihiştina dildarê dengê hat ji xeybê û wiha got Ev bihûştê cihê lê mayîn û bexçeyê lê rûniştinê ye û keremke bikevê û heta bi hetayê tê da bimîne.

Di Qura'na Pîroz da ev parçe ayeta ku Mela îqtîbas kirîye di Suretê Zumer da derbas dibe. Xwedê wisa ferman dike:

وَسِيقَ الَّذِينَ اتَّقَوْا رَبَّهُمْ إِلَى الْجَنَّةِ زُمَرًا حَتَّىٰ إِذَا جَاءُوهَا وَفُتِحَتْ أَبْوَابُهَا وَقَالَ لَهُمْ خَزَنَتُهَا سَلَامٌ عَلَيْكُمْ طُبِّئَ مَا قَادَخُلُوهَا خَالِدِينَ⁶³

“Bawermendên ku xwe ji binpêkirina hûkmên rebbê xwe parastine, wê kom bi kom bêne sewqkirin ber bihûştê ve. Derîyên bihûştê bi temamî tîn vekirin, dergevanên bihûştê ji wan ra dibêjin: Silaw li ser we be! Hûn pak paqij in ji gunehan êdî bikevin bihûştê û tê da bi ebedî bimînin.”

Ayet destnîşan dike ku bawermend bi sedem kiryarîyên wan ê qenc tîn sewqkirin bi bal bihûştê ve. Dergevanên bihûştê wan bi silav û mîzgînî pêşwazî dikin û dilê wan bi evîna Xwedê paqij û xweş dibe. Her wiha Mela bi rêya hunera îqtîbasê gihiştina dildarê şibandîye bihûştê ku cîyê lêmayîna bawermendan e. Piştî ku Mela ji bo ku gihiştina dildarê noqê deryaya xwînê bû yanê piştê ku xwe ji bo dildarê fenakir ew mezherê ayeta “fe-dxulûha xalidîn” bû.

2.1.14. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên Di Derbarê Afirandina Ademîyan da

Bi husna ehzeni t- teqwîm û zahir sorêtê zat î

Nezer dî elleme l- esma we batin 'eyn î mir'atî

(Cizîrî, 2012, r. 353)

Eya dildar! Bedewiya te ji raza ehzenê teqwîmê ye ku Xwedê di ayetê da gotîye, “Me insanê di şekl û awayê herî spehî da afirandî ye”. Tu nîşanê suretê Zatê Xwedê yî. Her wiha eger tu bi sirra ayeta “*Me Âdem hînî hemû navên tiştan kir.*”

⁶³ Zumer, 39/73.

binêrî xwe, wî demê tu neynika hûnera cemala Xwedê yî. Lewra tu jî yek ji wan ademîyan î ku fêhrîsta gerdunê ye û zanayê hemû esmayên Xwedê ye.

Mela di vê beyta xwe da ji du ayetan îqtibas kirîye; yek di Suretê Tîn da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

لَقَدْ خَلَقْنَا الْإِنْسَانَ فِي أَحْسَنِ تَقْوِيمٍ⁶⁴

“*Me insan bi hiş û tûjefehm û qabilîyetên bedenî ji hemû aferîdeyan delaltir afirandîye.*”

Îqtîbasa ayeta dûyem jî di Suretê Beqere da derbas dibe. Xwedê wisa ferman kirîye:

وَعَلَّمَ آدَمَ الْأَسْمَاءَ كُلَّهَا ثُمَّ عَرَضَهُمْ عَلَى الْمَلَائِكَةِ فَقَالَ أَنْبِئُونِي بِأَسْمَاءِ هَؤُلَاءِ إِنْ كُنْتُمْ صَادِقِينَ⁶⁵

“*Xwedê, Âdem hînê navên her tiştê kir. Piştra ew nav nîşanê melaîketan da û ji wan ra got: De ka navê wan tiştan ji min ra bibêjin heke hun di doza xwe da rast dibêjin.*”

Di tefsîranda wateya “*ehsenî teqwîm*” wiha derbas dibe: Xwedê bi înayeta sifetê xwe yê rehman însanê bi hiş û jîr û qabilîyetên bedenî bi şîkl û awayekî herî spehî bêkêmahî da) afirandîye. Jêdera vê şîkl û suretê bedew, Xwedê ye.⁶⁶

Di Suretê Sad da derbarê çêkirina Âdem da Xwedê wiha ferman dîke:

“(Bîne bîra xwe) *Dema Xwedayê te ji ferîşteyan ra gotibû bêguman ezê mirovek (Âdem) ji herîyê biafirînim. Gava ku min (afîrnadina wî yê bi suretê beşerê) tamam kir û min ji ruhê xwe pîfikir e cesedê wî. Hun (hemî melaîket) jê ra secde (hurmetê) bibin. Êdî hemu melake jê ra secde (hûrmetê) birin. Lê belê Îblîs secde nebir, xwe mezin kir û bû ji kafîran.*”⁶⁷

Mela bi te’bîra “suretê zatî” îşaretê bal wî hedîsa Pêxember dibe ku wiha gotîye:

إِنَّ اللَّهَ خَلَقَ آدَمَ عَلَى صُورَةِ الرَّحْمَنِ⁶⁸

“*Bêguman Xwedê Âdem li ser suretê rehman afirandîye.*”

⁶⁴ Tîn, 95/4.

⁶⁵ Beqere, 2/31.

⁶⁶ Komisyon, *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsîr*, I- V, Weş, TDV, Çapa 6’ an, Ankara, 2017, V, r. 646.

⁶⁷ Sad, 38/71-74.

⁶⁸ İbn Hecer, el-Esqelanî, Ehmed, b.‘Elî, *Fethul-Barî Şerhû Sehîhûl-Bûxarî*, XIII, Mektebet Darû Selam, Çapa 3yan, Riyad, 2000, II, r.226.

Xwedê, Âdem bi awayê ku seh dike, dibine û xeber dide afirnadiye. Ev jî wesfên Xwedê ne. Lêbelê sehkirin ditin u xeberdana aferîdeyan ne wek yê Xwedê ye.⁶⁹

Mela bi vê beyta xwe di nav pêlên tewhidê da winda bûye. Cizîrî, afirnadîna insanê wek neynika ku cemala Xwedê nişan dide destnîşan dike. Lewra insan bi sûret û derûnîya xwe ferhenga wehdanîyeta zat û sîfatên Xwedê ye. Mela van angaşteyên xwe bi rêya hunera îqfîbasa van herdu ayetan bi her du ayetên piştras dike.

2.1.15. Îqfîbasên Ayetên di Derbarê Navên Suretê Qur'an ê da

Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dit

Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê di gavê da

(Cizîrî, 2012,r. 42)

Bêgumanew tîra ku ji ber veqetîna ji dildarê peyda dibe wek xurmîn û dengvedana asîmana ye. Dema ew tîr li wî dilê xafil bikeve, ez dibêjim eger ku ew dil çîyayek bi zinar û asê be jî, wê di heman gavê da ew dil qet û parî be.

Di Qur'ana Pîroz da “re'd” li du cîhan derbas dibe, yek di Suretê Beqere ayeta 19 an da derbas dibe. Yê duduyan jî di “Suretê Re'd”ê di ayeta 14 an da derbas dibe ku suretê jî navê xwe ji wî ayetê girtîye.

Ev têgeh di Suretê Re'd da wiha derbas dibe:

⁷⁰ *وَيُسَبِّحُ الرَّعْدُ بِحَمْدِهِ وَالْمَلَائِكَةُ مِنْ حِيفَتِهِ وَيُرْسِلُ الصَّوَاعِقَ فَيُصِيبُ بِهَا مَنْ يَشَاءُ وَهُمْ يُجَادِلُونَ فِي اللَّهِ وَهُوَ شَدِيدُ الْمِحَالِ*

“Xurmîna ku ji asîmanan tê tesbîh û hemdê Xwedê dike. Ferîşteyên Xwedê jî ji ber tîrsa dengê wî tesbîh û hemdê Xwedê dikin. Hem jî Xwedê Te'âla deng û agirê biruskan dişîne ji bo kesê ku bixwaze bibe helakê. Di halê ku kâfir hêjî di yekîtiya Xwedê da cedelê dikin.”

Mufesîr li ser têgeha “er-Re'd”ê ixtilaf kirine. Hinekan gotine navê ferîşteyekî Xwedê ye ku ewran diajo. Hinekan jî gotine tesbîhkirina xurmîna

⁶⁹ el-Qurtubî, b.n.b, X,r. 77.

⁷⁰ Re'd, 13/13.

asîmanan mecazî ye. Di eslê xwe da ew kesên ku dengvedana ewran sehdkin ew tesbîh û hemdê Xwedê dikin.⁷¹

Her wekê ku ji meal û gotinên tefsîrzanên tê fêmkirin “re’ d” delîlê mezinahî û hûkimranîya Xwedê ye. Her wiha nîşanê zikir û pak dêrana Xwedê ji her kêmasîyan e. Çewa ku Xwedê ew deng û biruskên ewran ji bo cezakirina wan kesên ku xafilên ji mezinahî û yekîtiya Xwedê dişine. Her wisa Mela bi rêya vê hunera îqtîbasê ew tîra ku ji firqeta mehbubê peyda dibe wekandîye bi wî dengvedan û biruska asîmanan. Yanê pêwîst e dilê aşîqê tu car ji zikir û pesindayîna meşûqê xafil nebe. Lêbelê gava ku dil xafilê ji zikir û bîranîna mehbubê wê bi wî tîra ku mînanê “re’ dê” ye bê tar û mar kirin.

Xeymeta Nûra i ‘nayet zillê memdudê te bit

Sûreyê Ummul kitap madarê hedret sûr i bî

(Cizirî, 2012,r. 365)

Em du‘axwaz in ji Xwedê ku çadira nûra alîkarîya xwe li ser serê te vede û te bi siha çadira nûra xwe xwedan sih bike. Her wisa bila Suretê Fatîheyê ku jê ra tê gotin maka Qur’anê, wek surekî li domedarê cenabê te yê paye bilind û civata te yê şerefyar be, da ku we ji derd û kulan û afat û bobelatan biparêze.

Mela di vê beyta xwe da hem îqtîbasa navê suretê kirîye ku Suretê Fatîhe ye. Ev Suretê Pîroz meqsed û armancên Qur’ana Pîroz di xwe da dihewîne. Hem jî îşaretê hedîsa Pêxember kirîye ku derheqê vê suretê bimbarek da wiha gotîye: Ev sure maka Qur’anê ye ji her nexweşîyekî ra şîfa ye.⁷²

Ji Hedîsê tê fêmkirin ku hem şîfaye ji bo nexweşîyên cismanî hem jî ruhanî û bi vê munasebetê xwestîye ku ew mîrê mîran mezherê înayeta suretê Fatîhayê bibe.

Ey şehîn şahê mu ‘ezzem heq nîgah darê te bî

Sûreyê Inna Fetehna dor u madarê te bî

(Cizirî, 2012,r. 360)

⁷¹ Komisyon, *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsîr*, III,r. 278.

⁷² er-Razî, *Fexruddîn*, b.n.b, I,r.199.

Ey şahê mîrên li dinyayê! Ez du‘a xwazim ji Xwedê ku te ji êş û bela û karesatên dine biparêze. Bila li hember neyarên te *sureyê Inna Fetehna* hawirdor û alîkarê te bibe.

Suretê Fetih navê xwe ji peyva fetih girtîye ku di ayeta ewil da derbas dibe. Xwedê Te‘âla wiha ferman kirîye:

إِنَّا فَتَحْنَا لَكَ فَتْحًا مُّبِينًا⁷³

“*Bêgumanme ji te ra bi awayek eşkere rêya fetihkirna Mekke yê vekirî ye*”

Hinek tefsîrzan dibêjên meqsed ji “Fethen mûbînen”ê hevpeymanî sulha hudeybîyê ye ku bûye sebebê Fetha Mekkeyê.⁷⁴

Her wiha ev Sureta Fethê behsa sekînet û quweta me’newîyê dike ku Xwedê ji bawermend û hevrêyên Muhemmed Pêxember ra îhsan kirîye da ku li hember inkarmendan serkeftîbin. Wisa xuya dike ku Mela di vê beyta xwe da bi awayek du‘awarî xwestîye ku Mîrê Cîzîrê bi rêya sulhê bibe fetihkerê welatên neyarên xwe.

Ayet ûl kursî û En‘am heykela tuxa tebin

Bê nihayet pir mûrad û bê eded mensur i bî

(Cizîrî, 2012, 364)

Em hêvî û zarî dikin ji Xwedê ku Ayetûl Kursî û Suretê En‘am bigerîne heykel û hemaîla serfirazîya te û bigerîne wesîla destegîrî û pêkanîna mirazên te yên bê tixûb.

Ayetûl Kursî û Sûretê Ena‘m behsa yekîtî û mezinahî û ezeli û ebedîbûna Xwedê dike. Her wisa behs dike ku îlm û qudreta wî temamê gerdunê dorpêç kîrîye. Hukimranîya erd û asîmanan her bi destê wî ye. Mifta xezîneyên erd û ‘esmanan bi destê qudreta wî ye. Yê şivanîya ku kar û barê afîrînerên xwe dike her ew e.⁷⁵

Bi wê munasebetê Mela hêvî û lava dike ku Xwedê Te‘âla bi Sureyê Ena‘m û Ayetu‘l Kursîyê kar û barên Mîrê Cîzîrê rastbîne û ji bobelat û zilma neyaran biparêze.

⁷³ Fetih, 48/1.

⁷⁴ Komisyon, *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsir*, V,r.63.

⁷⁵ Muhammed A‘lî Sabûnî, *Safwetut Tefasîr*, I-III, Weşanên Mehmet Nurî Nas İslami Kitaplar Naşiri, Mîdyat, b.d, I, r.163, 376.

Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Nişanên Mezinahîya Xwedê da

Sufîyên pir le'îlû mercanan bi mujanan heta

Dîde rewşen bûn bi dîna dêm durê sîmînxebxeb

(Cizirî, 2012, r. 91)

Me mîna morî û mircanên sor ku pê heve hatine ristîn gelek stêrkên xwînrej ji çav û bijangên xwe herikandin. Heya dildara dêm wek dûrê û gerdan û xebxebka wê wek zîvê li me hata rehmê û me bi dîtîna xwe kêfxweş kir.

Ew ayeta ku Mela di vê beyta xwe da wek hunera îqtibas wergirtîye di Suretê Rehmen da wiha derbas dibe:

مَرَجَ الْبَحْرَيْنِ يَلْتَقِيَانِ بَيْنَهُمَا بَرْجٌ لَا يَبْعِيَانِ فَأَيُّ آلاءِ رَبِّكُمَا تُكَذِّبَانِ يُخْرِجُ مِنْهُمَا اللُّؤْلُؤَ وَالْمَرْجَانَ⁷⁶

“Xwedê ava du behran (ku yek şirin e ya dî jî şor e) gihandîye hev. Êca hûn kî jan nimetên Xweda yê xwe derew didêrîn. Di navbera wan herdu behran da perdeyek ji Qudreta Xwedê heye nahêlê bi temamî bikevin navhev. Ji herdu deryayan jî la'îl û mercan derdikevin.”

Qur'ana 'Pîroz di van ayetan da nimetên ku nişanê qudret û wehdanîyeta Xwedê ne dest nişan dike Yek ji wan nimetan ew e ku du avên deryayan li rastê hev anîye lê nêvhev êxistîye. Ji ber ku taybetîya awa deryayan ji hevcuda afirandîye tevlêhev nabin. Yek ji wan nimetan ew e ku ji herdu derya yan jî le'îl û mercanan derdîxîne û însan jîyana xwe bi wan morî mircanan dixemlînin.⁷⁷

Melayê Cizîri çavên xwe şibandîye deryayeke şor û hêstirên çavên xwe jî şibandîye la'îl û mircanan ku ji bo kêfxweşîya xemla jîyana insanê le'îl û mercan nimetên giranbihane. Her wisa Mela barandina stêrkên çavên xwe jî şibandîye morî mercanan ku dibin wesîla dîtîna dildara xebxebzîv a dêm dûr.

2.1.16. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Cehennemê da

Kî xilas ez duzexê hecrê tu yabim ey cuwan

Her nefes dared sela û ne'reê hel min mezîd

(Cizirî, 2012, r.153)

⁷⁶ Rahman, 55/19-22.

⁷⁷ er-Razî, Fexruddîn, b.n.b, XV, r.107.

Ey dildar ezê çewa xilasbim ji agirê veqetîna te yê ku wek agirê dogehê bi şewat e û di halê ku her gav diqîre û gazî dike: Ma gelo hinekî dîtir jî nînin ku bêne şewâtîn?

Ev hunera îqtibasa ku Melayê Cizrî di vê beytê da bikar anîye di Suretê Qaf da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

يَوْمَ نَقُولُ لِجَهَنَّمَ هَلْ امْتَلَأْتِ وَتَقُولُ هَلْ مِنْ مَزِيدٍ⁷⁸

“Wî roja ku em ji dogehê ra bibêjin ma tu teji nebûyî? Wê dogeh jî bêje: Ma gelo jî cin însanan hinek di jî tune ku hun li min zede bikin?.”

Mela di vê beyta xwe da agirê firqeta mehbûba xwe şibandîye wê dojeha ku ji şewatê têr nabe û her gav daxwazîya zêdekirna êzingan dike ku ins û cin in. Yanê çewa agirê dogehê sar nabe û her gav bi pête û xilasîya inkarmendan jê ne pêkan e. Her wisa agirê eşqê jî sar nabe û natefe û ji şewata aşiqê jî naweste. Her wiha ne îmkan e ku aşiq jî ji agirê evînê xilas bibe.

2.1.17. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ehlê Sidq û Teqwayê da

A'rifê cewher şînasî ê bi vî wesf û libasî

Dê qedir bihtir binasî meq'edê sidqê ceza ye

(Cizirî, 2012, r.306)

Ey dildara xeberdarê hîmetê! Tu arifê pîvana her tîştê yî û gewhera nirxdarî û erzanî baş dinasî. Her wiha tu zanayê evîna mecazî û heqîqî yî. Êdî ew kesê ku ji evîna bedenî derbas bûye û dilê wî bi evîna manewî bûye parêv. Tu qîmet û giranbahatî ya wî baştirîn dinasî. Jiber ku evîndarê di rêya evîna heqîqî ya ku li ser bingeha rastîye hatîye danîn xwe feda bike, ew babetê perîkirin û mukafatê ye ku meqamê bilind û razîmend e.

Melayê dil parêvê eşqa heqîqî, di vê beyta xwe da hunera îqtîbasê ji ayeta ku di Suretê Qemer da derbas dibe hilgirtîye. Xweda di wî ayeta ku hatî îqtibaskirî da wiha ferman kirîye:

فِي مَعَادِ صِدْقٍ عِنْدَ مَلِكٍ مُّقْتَدِرٍ⁷⁹

⁷⁸ Qaf, 50/30.

“Bêguman ew kesên di dunyayê da teqwadarî kirine, di nêv devçem û bostanan da nin. Li dîwana Xweda yê hêzdar di meqamê bilind û jê razî da nin.”

Dema ku em li wateya ayeta pêşî û paşîya vê ayetê mêze dikin, em dibinin ku ev ayet mûkâfata wan kesên ku di dunyayê da teqwadarî kirine û dilê xwe bi têştên fanî û bêqîmet neherimandine û qiblegaha dilê wan her hebandina Xwedê bûye. Xwedê pesnê cihê wan rastgo û teqwadaran dide û tenê wan layîqê rûniştina wî textepayê dibîne. Xwedê Te'âla wan di wê meqamê heq û bilind da bi menzereya cemala xwe xelat û perîdar dike.⁸⁰

Mela bi vê hunera îqtîbasê her wekê wiha dibêje: Ew Xwedayê ku zana û qadirê li ser her tiştê ye di temamê ferman û kirinên xwe da li gorê pîvana navê xwe yê e'dil û hekîmtîyê tevdigere. Bêguman ew kesê ku di rêya evîna Xwedayê ku hêzdarîya wî bê tuxîb da ezîtîya xwe yê beşerî gorî kirîbe, wê ew Rebbê adil di dîwanek heq da bi sezayê temaşakirina cemala xwe wî/ê dîderewşen bike.

Me bi dil 'urwetê wusqa te di dest

Ji senaya te ser elqabê du'a

(Cizirî, 2012,r. 50)

Me bi destê dilê xwe, bi qulpeka qewî bi 'eşqê girtîye. Lewma jî di serê hemû du'a û niyazên xwe da medh û senayê te dikim. Bi pesn û senayê te, şirîta muhebeta te di dilê min da qewî dibe.

Mela di vê beyte da îqtîbas him ji Sûretê Beqera ayeta 256an him jî ji vê ayeta ku di Suretê Loqman da derbas dibe kirîye:

⁸¹ وَمَنْ يُسْلِمْ وَجْهَهُ إِلَى اللَّهِ وَهُوَ مُحْسِنٌ فَقَدِ اسْتَمْسَكَ بِالْعُرْوَةِ الْوُثْقَىٰ وَإِلَى اللَّهِ عَاقِبَةُ الْأُمُورِ

“Her çi kesê qencîkar be û bi temamî berê xwe bide Xwedê; nexwu ewî xwe bi qulpek herê qewî ve girtîye. Ji xwe encama her tiştê vedigere li bal Xwedê.”

Dema em temaşe pêwendîya di navbera ayet û beyta Mela dikin, em dibinin ku mufesiran di tefsîra “urwetê wusqa” da gotine îstîfareya temsîlîye he ye. Halê wî kesê/a ku berê xwe daye Xwedê, karên xwe sipartîye wî, tewekula xwe her daye li

⁷⁹ Qemer, 54/55.

⁸⁰ el-qurtubî, b.n.b,XVII,r. 97.

⁸¹ Loqman, 31/22.

ser Xwedê, şibandîye wî mirovê/a ku dixwaze ber çîyayêk bilind û asê ve hilbikişe. Wî/ê êdî xwe bi kapikekî herê qewî ku naqete girêdaye û ber bi çîyayê ve hildikêşe.⁸²

Mela jî bi hunera îqtîbasê îstîara temsîlîye bikar anîye. Lewra evîn û dilsozîya xwe yê dildarê şibandîye wî kapika zexm û qewî. Her wiha di bin pertewa îqtîbasê da destnîşan dike ku rêya eşqê rêyekê bi zehmete pêwîst e ku rêwîyên rêya ‘eşqê dilê xwe bi qulpekî qewî girêbidin da ku neqete ew jî eşqa Xwedê ye.

2.1.18. Îqtîbasên Ayetên di Derbarên Îsmên Xwedê da

Huwe l- ewwel huwe l- axir huwe z-zahêrû huwe l- batin

Huwe l- me‘budu we l- meşhudu fî kulli l- huwîyyat

(Cizirî, 2012, 355)

Ew hebîba ku min xwe fîdayê evîna wî kirîye serwer û ferman rawayê hemû heyînan e. Ewe yê ewil û axir yê zahir û batin yê ku layîqê perestin û hebandinê ye. Her tişt şehdeyî dide ku ew yeke bê hevrê û bêşerik e. Her zîrûhek hewcedarê wî ye, ew hewcedarê kesê nîne.

Ev ayeta ku Mela îqtibas kirîye di Suretê Hedîd da wiha derbas dibe:

⁸³ هُوَ الْأَوَّلُ وَالْآخِرُ وَالظَّاهِرُ وَالْبَاطِنُ وَهُوَ بِكُلِّ شَيْءٍ عَلِيمٌ

“Her Xwedê ye yê ewil û yê dawî yê xûya yî û yê veşartî. Ew bi her tiştê dizane.”

Ehlê tefsîrê dibêjin ev ayet behsa çar sîfatên Xwedê dike:

el-Ewel (Pêşî): Berîya ku tişteke tunebû ew hebû ji bo hebûna wî ra destpêk tune, yanê qedîm e, lewra eger tişteke berîya wî hebe ew dibe mexluq yê ku kaînatê ji tune yê anîye heyî yê her ew e.

el-Axir (Dawî): Yê ku piştê helakbûna gerdunê ku hey hebe û fenabûn jê ra tune be, her ew e. Di istilaha ehlê kelmê da ev têgeh sîfetê baqîmayîna Xwedê destnîşan dike.

⁸² ez-Zemexşerî Ebûl Qasîm Carullah Mahmud b.‘Umer, *Tefsîrul Keşşaf*, Darûl Me‘arif, Beyrût, 2009, r.838.

⁸³ Hedîd, 57/3.

ez-Zahir”(Xuyayî): Delilên heyîna Xwedê pirê ku zêde ne her wekê ber çehvan xuya ye.

el-Batin (Veşartî): Hiş û aqil nikare çawanîya zatê wî idrak bike heqîqeta zatê wî bi hiş û aqilê nayê zanîn⁸⁴

2.1.19. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê ‘Eqil da

Di işqê şeyxê sanî me bi dil behrê me ‘anî me

Li zî hicrin we zî qelbin şifa ‘un fî îşaratî.

(Cizirî, 2012, r. 35)

Ez di ilmê ‘eşqê da seydayê duyemîn im. Her wiha dilê min jî wek behra pêl jê rabûyî teji me‘neyên rêya evîna Xwedê ye. Ev zanyarî û dil teji bûyîna min ku wek behra me‘anîyane ji bo nexweşiyên dilê kesên aqilmend û xwedandilê pak û paqij û şîfadar e. Yanê kesê ku xwedan aqil û dil paqij be wê li pêşber vê ilmê têr zexîre û û alîmtîya min ê ilme ‘eşqê qebûl bike û xwe ji wesweseyên şeytanî dur bêxe.

Hunera îqtîbasê ku Mela di vê beytê da di bikar anîye di Suretê Fecir da derbas dibe. Xweda wiha ferman kirîye:

هَلْ فِي ذَلِكَ قَسَمٌ لِذِي حِجْرٍ⁸⁵

Ma qey ev tiştên ku pê sond hatî xwarin ji bo xwedî’aqilan ra ne hêja ye.?

Tefsîrzan di tefsîra vê ayetê da wiha gotine: Bêguman kesê ku xwedan’aqil û dilramîn be wê bizane ew tiştên ku Xwedê pê sond xwarîye sosret û delîlên wehdenîyet û perwerdekarîya Xwedê dest nişan dîkin. Nexwu muhîm û hêja ye ku pê were sond xwarin.⁸⁶

Têgeha hicr di wateya ‘aqil da hatiye bikaranîn, lêbelê di maneya xwe yê eslî da bi wateya asteng kirine. Jixwe aqil jî di wateya xwe yê ferhengî da eynê wateya astengkirin e jibo ku ‘eqil men’a însanê ji şaş zanîn, şaş fikirîn û tevgerên neqenc dike jê ra hatiye gotin ‘eqil. Dema meriv li tiştên ku Xwedê pê sond xwarî bi ‘eqilanî difikere meriv tê digihêje ku ne xalîyê ji hikmetê ne.⁸⁷

⁸⁴ el-Qadî el-Beydawî, b.n.b, II, r.66.

⁸⁵ Fecr, 89/5.

⁸⁶ es-S’edî, Abdurahman b.Nasir, b.n.b, I,r. 923.

⁸⁷ er-Razî, Fexruddîn, b.n.b, XVI, r.169.

Mela bi vê îqtîbasê balê dikişîne li ser behra ilmê ‘eşqê ku hemû delîl û sosret in. Ew sosret û agahdarîyê ku di ilmê ‘eşqê da dibêjim û radigihînim ji hikmetan xalî nîne. Kesê ku dilramîn û ‘eqil giran be dê seydatîya min ê ilmê eşqê qebûl bike.

2.1.20. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Nûra Xwedê da

Çi xweş nûrek zelal î tu di qelbê min şemal î tu

We qelbî heysu fihî l hubbu misbahin bi mişkafî

(Cizirî, 2012, r. 356)

Ey dildar! Ez li pêşberê nûr û cemala evîna te heyîrî mame, çî nûrek xweş û zelal e. Dilê min ê ku bûye berojê şemla evîna te wek şibakek tarî bi ronahîya çirayê husn û bedewîya te rewneqdar dibe. Cizirî di vê beyta xwe da hunera îqtîbasê ji ayeta ku di Suretê Nûr da derbas dibe hilgirtîye. Xwedê di wî ayetê da wiha ferman kirîye:

اللَّهُ نُورُ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضِ مِثْلُ نُورِهِ كَمِشْكَاةٍ فِيهَا مِصْبَاحٌ الْمِصْبَاحُ فِي زُجَاجَةٍ الزُّجَاجَةُ كَأَنَّهَا كَوْكَبٌ دُرِّيٌّ يُوقَدُ مِنْ شَجَرَةٍ مُبَارَكَةٍ زَيْتُونَةٍ لَا شَرْقِيَّةٍ وَلَا غَرْبِيَّةٍ يَكَادُ زَيْتُهَا يُضِيءُ وَلَوْ أَمْ تَمَسَّهُ نَارٌ نُورٌ عَلَى نُورٍ يَهْدِي اللَّهُ لِنُورِهِ مَنْ يَشَاءُ وَاللَّهُ بِأَعْيُنِنَا وَاللَّهُ بِكُلِّ شَيْءٍ عَلِيمٌ⁸⁸

“ *Ellah rewneqdêrê erd û asîmanan e mînaka nûra wî wekê kuleka ku tê da çirayek vêketî hebe ew çira jî di nêv camê da ew cam mînanê stêrkekî rewneqdar ronahî dide. Ew çira jî darek pîroz e ku dara zeytûnê ye. Ew dar ne li aliyê rojhilatê ye ne jî aliyê rojavayê ye. Her çendan agir negihêje zeyta wî jî ji ber safî û zelalîya wî tu dibêjî qey bi xwe hildibe. Ev nura li ser nurê ye. Xwedê çî kesê bi xweze ku raste rê bike nûra xwe nîşanê wî dide. Xwedê van mîsalan pêşkêşê însanê dike da ku însan baştir rêya Xwedê nas bikin. Xwedê zanayê her tiştê ye. ”*

Li gorê ku tefsîrzan dibêjên nûra qelbê bawermendan hatîye şibandin bi çirayê. Çewa ku ronahîya çirayê di tarîfîyê da hemû tiştê ber biçav rohnî dike her wisa nûra di qelbê bawermendan jî gîyan, beden, his û aqil, xeyal û fikrên wî bi nûra îman û Qur’an û risaleta Pêxember rohnî dike.⁸⁹

Mela jî di vê çarçovê da dilê xwe wekandîye wê şibaka tarî. Evîna me’şuqa xwe şibandîye ronahîya çirayê. Çewa nûra çirê tarîfîyê li ser tiştan winda dike, her

⁸⁸ Nur, 24/35.

⁸⁹ es-S’edî, Abdurahman b.Nasir, b.n.b,r. 569.

wisa nûra evîna dildarê jî qelbê wî rohnî dike bi ronahîya qelbê ruh û beden û his 'eqil û fikr û xeyalên Mela jî masêwayê Xwedê paqij dibe û dibiriqe.

2.1.21. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Du'ayên Kafiran da

Guftem û ra ma du'agoyî tu wa em ey hurê'in

E'redet 'ennî we qalet ma du'a ul kâfirin

(Cizirî, 2012, 259)

Min xwest ku carek ji dildarê ra şewata cism û canê xwe ku bi agirê firaqa wê dişewite û dilê xwe yê ku ji ber hesrata eşqa wê pare par bûye eşkere bikim. Axir min got ey dildara horîzat! Ez ji du'a dikim li hember baqîbûnîya izzet û serwerîya te yê her heyî me. Tu li min were rehmê ez feqîr û jar û dil birinim, ji ber ku zanayê qinyeta dilê minbu bersîva duayê mi neda û got tu li hember qencîyên ku min kirîye nan korîyê dikî. Êdî kesê ku nankorê qencîyan be tu qîmet ji duayên wî ra nîne û nayê qebûl kirin.

Ger bixwanî wer beranî bende em ta zinde em

*Wacibun lî imtîsalu l emrê **ma za te'mûrîn***

(Cizirî, 2012,r. 259)

Ey dildara ku di qedirbilindî û alî cenabîya xwe da wek şahanî! Ez di rêya evin û hebandina te da quwet kêr û tengezar im. Her wiha ji ber dil êşîya vê dildarîyê hal perîşan û dil ji hev ketîme. De ka ezê çi bikim? Ez bende me nikarim bê destura xwedîyê xwe tişteke bikim. Ez bêwar û derbederim, sebr û taqeta min jî nema û kesekî ku alîgirîya min bike jî tune; lê dîsa ez kuştîyê evîna te me bendewarê gazî kirîna te li dîwanê me. Eger tu min ji dergeh û diwana xwe bavê jî dîsa ezê neçim û her gav li ber şîpana te bim. Heya sax jî bim ez bendeyê te me. Pêwîst e ku ez stuxwerê emr û fermanê te bim. Mîrê min! Ferman bike û bênêre ka wê ev emirberê fermana te çewa bi çapikî fermana te pêk bîne.

Ev ayeta ku wek hunera îqtîbasê hatîye bikaranîn di Suretê Nemil da derbas dibe:

قَالُوا نَحْنُ أَوْلُوا قُوَّةً وَأَوْلُوا بِأَسْسِ شَدِيدٍ وَالْأَمْرُ إِلَيْكِ فَانظُرِي مَاذَا تَأْمُرِينَ⁹⁰

⁹⁰ Neml, 27/33.

“Pêşengên civata wê gotin em xwedî hêz û di şerê da berxedêrin. Ferman yê te ye êdî bimêze û bi fikir ka tu yê çî tiştê li me ferman bikî?”

Ev ayet behsa şêwra Belqîsayê di gel giregirên welatê wê dike. Dema ku Suleyman Pêxember ji Belqîsayê ra nameyek wiha dişîne: “Di vê hûn li ser min pozbilindayî nekîn û bi muslimantî werine ba min. Belqîsa jî li ser vê bûyera nameyê ji pêşengên civata xwe dişêwire. Giregirên welatê wê jî hêzdarî û berxwedanîya xwe êşkere dikin. Paşî di her rewşê da stuxwerê pêkanîna biryar û fermanê wê dîyar dikin.”⁹¹

Meriv dikare pêwendîya beyta Mela di gel ayeta ku hatîye îqtibaskirin wiha binirxîne: Çewa pêşengên civata Sebeyê di her halêda dilsozîya xwe yê ji bo Padîşahê welatê xwe ku Belqîsa ye dîyar kirine. Melayê dîwanxweş jî dixwaze ku bi hunera îqtîbasa ji ayetê digel nemayîna sebr û taqetê berxwedêrîya xwe yê di rêya evînê û emirberî ya xwe ji mehbûbê ra dîyar bike.

2.1.22. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Şeva Leyletul Qedrê da

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê

Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hêlalê

Kî bi dil kâfire ê secde nebit cebhet û xalê

Ya nedit Aşehde bi ayatê di wî weqt û mecale

Leyletul qedre b imin ew se ‘et û îd e di salê

(Cizirî, 2012, r. 259)

Eger perde li ber husn û cemala me’şuqa ku qiblegeha ‘aşiqane rabe û yan jî ferezen gava birûyên xwe yên wek kevanekê heyîvê ji ber taca zêrîn û rîşîyên ku tacê dixemilînîn derîne. Ew kîj dilkafire li ber husn cemala wê xwe ragire û li hember xal reşên li ser dêma wî xuya bûye neçe secdeyê. Yan jî tesdîqa wan remzên ku husn û cemala wê nişan didin neke. Bêguman ez bi xwe di heman gavê da şehdeyî didim bi devê xwe û yeqîn dikim bi qelbê xwe ku ew dem ji bo min şeva qedrê ye ku ji hezar mehan qenctir e. Ew sa’et ji bo min cejna meha remezanê ye ku her sal rojîgir bi şadimanî pêşwazî dikin.

⁹¹ er-Razî, Fexruddîn, b.n.b, XII, r. 434.

Wekê ku tê zanîn navê suretekî Qur'ana Pîroz Suretê Qedr e. Ev hevoka Leyletul Qedrê parçeyek ji suretê ye. Mela di vê beyta xwe da hem hûnera telmîhê hem jî hunera îqtibasê bikar anîye Xwedê Te'âla di vê Suretê da wiha gotîye:

إِنَّا أَنْزَلْنَاهُ فِي لَيْلَةِ الْقَدْرِ وَمَا أَدْرَاكَ مَا لَيْلَةُ الْقَدْرِ لَيْلَةُ الْقَدْرِ خَيْرٌ مِنْ أَلْفِ شَهْرٍ⁹²

“Bêguman me Qur'an a Pîroz di wî şeva pîroz da nazil kirîye. Ma qey tu kesê pi te daye zanîn ka ev şeva qedrê çî ye? Şeva qedrê ji hezar mehan qenctir e.”

Şeva Leylet'ûl-qedrê ew şev e ku Xwedê di wî şevê da dest bi daxistina wehyê kirîye. Yan jî Xwedê di carekî da temamê Qur'anê ji “lewh'ûl mehfuz”ê daxistîyê asîmanê dunyayê. Paşî Melekê Cibraîl di navbera bist û sê salê da bi awayê hewceyî, ayet bi ayet suret bi suret berjêrê li ser pêxember kirîye.⁹³

Meriv dikare meqseda Mela bi vê hunera îqtibas û telmîhê wiha şîrove bike. Ji zahîrê tefsîra vê suretê tê zanîn ku Leylet'ûl Qedr ew şev e ku Xwedê dest bi şandina wehya Qur'anê kir ku însanîyet bi rohanîya wehyê ji tarîfîya cehalet û zincîrên kuletîya bendeyan azad bibe û bi navê Xwedayê dilovan ku afirînerê her tiştê ye dest bi jiyanê bike. Piştê daketina wehya Qur'ana Pîroz, dunyayê azadî, îzzet, biratî, edalet û exlaq bi wî nas kir. Mela jî her we yekê bi wateya îşarî dibêje dema husn û cemala mehubê ku Xweda ye û ku mohra tewhîd û sîfatên xwe yê kemal li her derê gerdunê êxistîye xuya bû. Ma qey îmkan heye ku kesek bi kare wî mohra husn û cemalê qebûl neke û xwe radestê hukmê wî neke?

2.2. Hunera Îqtibasê di Helbestên Feqîyê Teyran da

Di bin vê sernavê da ew ayet û hedîsên ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe da wek hunera îqtibasê bikar anîye û li gorê babetên xwe hatine kifş kirin, hatine dayîn.

2.2.1. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Rehmet û Dilovîniya Xwedê da

Lew bum herif lew bûm nedîm

Min 'işqeka dijwar heye

Kovî kirim serfa ezîm

⁹² Qedr, 97/1-2-3.

⁹³ el- Qadî el-Beydawî, b.n.b, II, r. 611.

Min hêj meya pêrar heyê

*Minnet ji **Rahman ê Rehîm***

Min mîrekî settar heyê

(F. Teyran, 2014,r. 104)

Ez bûme hogir û şepal di nêv reqs û semaya evîndaran da. Lewra tîra eşqa Rebbanî li min ketîye, lêbelê serxweşbûnîya min di eşqa dijwar da min ji xelesa reqs û semaya aşiqan kovî kir, dîsa jî ez ji ber kovîkirina xwe ne xembar im. Di gel vê halê ez minetdar im ji Xwedayê dilovan û rehimdar ku hêj serxweşê meya kevnare me. Di gel rehm û mêhrîvanîya wî ew mîrekî settar e.

Hunera îqtîbasa ku Feqîyê Teyran di vê beyta xwe da bikaranîye di Suretê Fatîhe da derbas dibe. Xwedê di wî ayetê da wiha ferman kirîye:

⁹⁴ الرَّحْمَنُ الرَّحِيمُ

“Ew Xwedayê ku rehman e rehîm e.”

Dema ku em li tefsîrên Qur’ana Pîroz temaşa dikin em dibînin ku ev ayeta pîroz wiha hatîye tefsir kirin: Rahman sîfatê Xwedê ye ku berê xwe dide dunyayê; yanê ew Xweda yê ku di dunyayê da rehman û qencîkar e û razîqê hemu benderuhan e. Rehîm jî sîfatê Xwedê ye ku bere xwe dide alema axiretê, yanê ew Xwedayê ku di axiretê da rehmkar û mîhrîvan e ji bo bawermendan. Her çi kesê ku di dunyayê da fîdayê emrê wî be, wê Xwedê Te’âla di uqbayê da jê ra bi rehm û şefqe bibe.⁹⁵

Di Suretê Fatîheyê da Xwedê Te’âla pênc navên xwe ku (*Ellah, Rebb, Rahman, Rehîm Malik*) e zikir kirîye, her wekê Xwedê wiha dibêje: Pêşî min te afirand, wî demê ez îlah im. Paşî min te perwerdekir wî deme ez Xwedê me. Pişt ra te isyanîya min kir, min gunehê te stir kir wî demê ez rehman im. Paşî te tewbe kir, min te bexîşand wî demê ez rehîm im. Paşî pêwîst e ku ceza û xelat bigêhişte te wî demê ez malik im.⁹⁶

Meqseda Feqî bi vê hunera îqtîbasê dibe ku wiha be: Her wekê tê zanîn temamê aleman ji asarên ism û sîfatên Xwedê ne. Xwedayê wacibûl wucûd di alema

⁹⁴ Fatîhe, 1/3.

⁹⁵ Muhemmed ‘Alî Sabûnî, b.n.b,I,r.25

⁹⁶ er-Razî, Fexruddîn, b.n.b, I, r. 268

xeyb û îmkânê da bi ism û sîfatê xwe di hemu merheleyên hebûnê da rehîmdar û settar û bexşende ye. Ez minnetdarim ku benê heyîn û eşqa min bi ism û sîfatên wî ve girêdayî ye.

2.2.2. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Afirandina Însanan da

Avek mehînim kemter im

Min cerg û dil bûne birin

Sewda û dîn û epterim

Pabendê wê nefsa le'în

Muksîyê jar û bedtir im

Ferhemnî xeyre rahimîn

(F. Teyran, 2014,r. 110)

Ez ji avek bêqîmet û tune hatime afirandin û ji ber evin û sewdaserîyê cerg û dilê min bûne bîrîn û bêhiş û ebter im. Ew nefsa le'în dixwaze lingên min li qeydê bixe. Muksî, li hember wan êş û zarîyan jar û xirabhal im. “Ey Xwedayê herî rehîmdar, tu li min rehmê bike.”

Di vê beyta Feqî da hem hunera telmîhê hem jî hunera îqtîbasê hatîye bikar anîn. Dema dibêje avek mehînim im îşaretê wî ayeta ku di Suretê Murselat da derbas dibe dike. Xwedê di wî suretê da wiha ferman kirîye:

أَمْ نَخْلُقُكُمْ مِنْ مَّاءٍ مَهِينٍ⁹⁷

“Ma qey me we ji avek kême afirandîye?”

Her wiha di rêza dawîya beytê da hunera îqtîbasê heye ku ji ayeta ku di Suretê Mûmînûn da derbas dibe, hatîye wergirtin.

وَقُلْ رَبِّ اغْفِرْ وَارْحَمْ وَأَنْتَ خَيْرُ الرَّاحِمِينَ⁹⁸

“Û bibêjê: Xwedayê min! Tu min bibexşe û li min rehmê bike û di halê ku tu qencîrînê rehîmdaran î.”

⁹⁷ Murselat, 77/20.

⁹⁸ Mûmînûn, 23/118.

Feqîyê Teyran di vê hunera telmîh û îqtibasê da balê dikşîne li ser kêmbûnê û zelîliya însanê li hember qudret û rahimdarîya Xwedê. Lewra Xwedê bi avekî bêqîmet însan afirandîye û piştra bi qûwet û hiş û bedewîya şiklî jî xemilandîye. Insan jî li hember wan nimetên giranbiha da nankorîyê dike û dikeve dapika nefsa xwe yê ku wî ji hebandina Xwedê dûr dike. Hal hal e, yê ku însanê ji herîya gunehkarîyê derîne tenê ew Xwedayê herf rehimdar û bexîşkar e. Lewra Feqî di vê halê da bi vê hunera îqtibasê hewara xwe digîhîne Perwerdekarê xwe û dibeje: Ey Xwedayê min ê dilovan û bexşendekar! Tu li min rehmê bike lewra qencfîrîne dilovînan tu yî.

2.2.3. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Tewhîda Zatê Xwedê da

Nazik û mehbûb ciwanik

Qamet û bejna ziravik

Kullu şey'in dê bin halik

Ji xeyrî şahê Qudretê

(F. Teyran, 2014, r. 141)

Feqî di vê beytê da û digel çar beytên pêşîya vê beytê da balê dikşîne li ser fenabûyîna dem û dewranê; lewra dem û dewrana dunyayê gelek dildar û dildêr di qebrê da veşartî ye. Di dawîyê da jî dewrana felekê mehbûba min ê bejinzirav û qametelif, dêmxal û enîqemer, di qebra teng û tarî da veşart. Lêbelê di vî warê da distura Qur'ana pîroz ev e: “Dê her tişt here helakê ji xeynê şahê Qudretê.”

Ew ayeta ku Feqî îqtibas kirîye di Suretê Qeses da derbas dibe. Xwûda wiha ferman kirîye:

وَلَا تَدْعُ مَعَ اللَّهِ إِلَهًا آخَرَ لَا إِلَهَ إِلَّا هُوَ كُلُّ شَيْءٍ هَالِكٌ إِلَّا وَجْهَهُ لَهُ الْحُكْمُ وَإِلَيْهِ تُرْجَعُونَ⁹⁹

“Tu digel navê Ellah gazîyê Xwedayekî din neke. Nîne tu Xweda ji bil wî. Ji xeynê Zatê Xwedê wê hemu tişt fenabin û biçîne helake. Hukmû hukûmranî hey destê wî da ye û di roja qîyametê hunê vegerin li bal wî.”

Feqîyê Teyran bi rêya vê hunera îqtibasê xwestîye ku mirov li hember karesat û bobelatên dem û dewrana felekê berxwedêr bibe her çendan ku mirov mehbuba

⁹⁹ Qeses, 28/88.

xwe yê qametşepal û dilruba jî winda bike, dîsa pêwîst e ku sebirkeş be. Lewra hakimîyeta her tiştê di destê Xwedê da ye û ji bilê zatê wî her tişt namzetê fanîtîyê ye. Dema roj û deqîqa wî were, wê fena bibe. Tiştê herê baş ew e ku mirov xwe bispêre Xwedê û her tiştê bi nav û hesaba wî hesbike û qîmet bide yê.

2.2.4. Îqtîbasên Ayetê di Derbarê Poşmanîya Înkarmedan da

Gelek sotim kirim kibab

Kirîye bi min sed reng xirab

Ya leytenî kuntu tûrap

Wêran ez im malim xirab

(F. Teyran, 2014,r. 160)

Ew dildara qamet mîsal û gerdan bi xal û sahip cemal li min gelek zilm û xirabî kir lewra jî malxirab û wêrane bûm û dîn û harbûm li dinê ketim ji ber êş û îşkenceya dildarê xwezî buma ax û xwelî.

Feqî di vê beyta xwe da hunera îqtîbasê ji Suretê Nebe'ê hilgirtîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

إِنَّا أَنْدَرْنَاكُمْ عَذَابًا قَرِيبًا يَوْمَ يَنْظُرُ الْمَرْءُ مَا قَدَّمَتْ يَدَاهُ وَيَعُولُ الْكَافِرُ يَا لَيْتَنِي كُنْتُ تُرَابًا¹⁰⁰

Bêgumanme we bi 'ezabek nêzik hişyar kirîye. Ew roja ku her kes li tiştên ku her du destên wî li pêşîya xwe şandîye (axretê ji xêr û şeran) dê bibîne. Wî gavê kesê inkarmend dê bibêji xwezîya ez jî bibûma ax.

Feqîyê Teyran bi rêya hunera îqtîbasê halxirabîya xwe wekandîye hal xirabîya inkarmendên ku di roja qiyametê ji ber kiryarîyên xwe destvala mane. Di wê rojê da li hember ezaba dijwar dibêjin: “Xwezî em li dînyayê nehatibûna afirandin û em time tim ax û xwelî buna. Yan jî xwezî em jî wek wan heywanan bûna ku pêştê hesapdayîne bibûna ax û xwelî.”¹⁰¹

Her wekê Feqî jî dibêje xwezî ez jî hember zilma sahip cemal û qamet misal û gerdan xala xwe bibûma ax û xwelî da ku hinde nehatima sohtin.

2.2.5. Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da

Dilo erînî neke gazi

¹⁰⁰ Nebe, 78/40.

¹⁰¹ Muhemmed ‘Alî Sabûnî, b.n.b,III, r. 510.

Cewaba “*len tera*” sazi

Meke fikrê ji Musa yî

Dilê min Turê Sînaye

F. Teyran, 2014,r. 238)

Ey Dil! Tu bi awayek zahirî wek Musa Pêxember bi erînî neke gazî û nebêje: Ya Reb tu zatê xwe nîşanê min bide, lewra Xwedê di Qur’ana Pîroz da gotîye.

Wateya “*Len teranî*” yanê tu nikarî min bibînî, lêbelê dilê min wek Turê Sîna xuyangeha tecelîya Xwedê ye.

Ev ayeta ku “*Mim û Hê*” wek hunera îqtîbasê bikaranîye di Suretê Enfal da wiha derbas dibe:

وَلَمَّا جَاءَ مُوسَىٰ لِمِيقَاتِنَا وَكَلَّمَهُ رَبُّهُ قَالَ رَبِّ أَرِنِي أَنْظُرْ إِلَيْكَ قَالَ لَنْ نَرَاكَ إِلَّا أَنْظُرْ إِلَى الْمَجْدِ فَإِنْ اسْتَقَرَّ مَكَانَهُ فَسَوْفَ نَرَاكَ فَلَمَّا بَجَلَىٰ رَبُّهُ لَلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَىٰ صَعْفًا فَلَمَّا أَفَاقَ قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ إِلَيْكَ وَأَنَا أَوَّلُ الْمُؤْمِنِينَ¹⁰²

“*Dema Musa di wî wexta ku me jê ra qewilkirî, hate (Torî Sîna) Xwedayê wî pêra xeber da. (Musa) Got: Xwedayê mi! Zatê xwe nîşanê min bide ku ez (bikarim) li zatê te temaşe bikim. (Xwedê) got: Tu yê qet zatê min (bi wan çavên fanî nebînî); bes li vî çîyayî (ku ji te qewîtir e) binere, eger ew çîya (dibin tecelîya min da di cêhê xweda) xwe ragire; paşî dibe ku tu min bibînî. Dema ku Xwedê ezameta xwe li çîyê zahirkir çîya û hilweşa û bi erdê ra bû yek. Musa jî bê hiş ket. Êca dema hiş hate serî got: Xwedayê mi! Ez te ji hemû kêmasîyan pak didêrim. Min tewbe (li ber ezameta te ku carek din wan daxwazîyan nekim), ez ewilê wan Xwedabaweran im (ku min bawerî anî bi çavê dinê ne pêkane dîtina te).”*

Feqî di vê çarrêzê da balê dikşîne li ser tefsîra ayeta ku îqtîbas kirîye. Lewra ayet destnîşan dike ku dîtina zatê Xwedê bi zahirî ne pêkan e. Her wiha Feqî dilê xwe wek xuyangeha tecelîya Xwedê dibîne bi vê halê şibandîye çîyayê Turê Sînaye. Dema Xwedê tecelîya xwe li çîyayê zahir kir, çîya di heman demê da hilweşa. Her wisa jî dilê wî bi agirê eşqa îlahî hilweşaye.

¹⁰² E’raf, 7/143.

2.3. Hunera Îqtîbasê di Helbestên Xanî da

2.3.2. Hunera Îqtîbasê di Memû Zîna Ehmedê Xanî da

Di bin vê sernavê da ew ayet û hedîsên ku Ehmedê Xanî di helbestên xwe da wek hunera îqtîbasê bikar anîye û li gorê babetên xwe hatine kifş kirin û hatîye dayîn.

2.3.3. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Navê Xwedê da

Sernameyê name, namê ullah

Bê namê wî na tamam e wellah.

(Mem û Zîn, beyt:1)

Sernivîsa vê kîtêbê navê Xwedê ye. Lewra ev name ku mebest jê kitêba Mem û Zînê ye bi navê Xwedê hatîye destpê kirin. Ez sond dixwûm, kitêbên ku bê navê wî werîn destpêkirin ew nuqsan, kêr û nîvcûyî timînin

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da ji îqtîbasê zêtetir bi rêya telmîhê îşaretê hedîsa Pêxember dike. Qasidê Xwedê wiha gotîye:

كُلُّ امْرِئٍ ذِي بَالٍ لَا يَبْدَأُ فِيهِ بِبِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ فَهُوَ أَتَمُّ¹⁰³

Her çi tiştê xwedî qîmet bi navê Xwedayê dilovanê mihriban neyê destpêkirin ew tişt bêbereket û nivcûyî dimîne.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da wek adetê hemû âlim û nivîskarên cihana Îslamê nameya xwe bi navê Xwedê destpê kirîye. Lewra çevkanîya vê kevneşopîya gelemperî hedîsa Pêxember e. Seydayê Xanî, bi rêya telmîh u îqtîbasê me'neya hedîsê destnişan dike ku destpêka heyatê bi navê Xwedê destpê dike ku tewhîd û hukumranîya wî navnişana her tiştê ye.

2.3.4. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Qur'ana Pîroz da

Mezmûnê murselatê la reyb

Meşhûdê mukaşefatê bil xeyb.

(Mem û Zîn, beyt: 6)

¹⁰³ Ebû Davud Süleyman b. Eş'as es-Sicistani, *Sünen Ebu Davud*, Darûr -Risaletu'l -'Alemye. C. 1ê, Dimeşq, 2009, VII, r. 209.

Ya Rebbî navê te fêhrîsteya temamê kîtêbên semawî ku hatine hinartin û di heqîqeta wanda tu şek û şibhe jî nîne. Her wiha Qur'ana Pîroz bi navê te keşifkarîya alema xeybê dike.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da hunera îqtîbas ji ayeta ku di Suretê Beqereyê da derbas dibe hilgirtîye, Xweda wisa ferman kirîye:

ذَلِكَ الْكِتَابُ لَا رَيْبَ فِيهِ هُدًى لِّلْمُتَّقِينَ¹⁰⁴

Ev kitêba ha ku di lewhu'l-mehfuzê da veşartîye tu gam tê da nîne ji bawermendan ra rêbere.

Her wekê ku ji naveroka beytê hate zanîn Xanî bi hunera îqtîbasê dest nişan dike ku temamê kîtêbên hatine şandin û Qur'ana pîroz şewqa nav û sifetên Xwedê ne.

2.3.5. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Qudret û Kiryarên Xwedê da

Hemîyan bi te ye meddare û debr

Feyyadê riyadê xelq û wel emr.

(Mem û Zîn, beyt:10)

Ey afirîner û perwerdekarê bax û bostanan! Tedbîr û emrê hemû tiştên heyî bi emr û fermana te dizivire. Ev gerdûn û mirov di hemû kar û kiryarîyên xwe da hewcedarê qudreta te ne.

Xanî di vê beyta xwe da ji ayeta ku di Surete E'raf da derbas dibe bi îqtîbasê hilgirtîye. Xwedayê dilovan wiha Ferman dike:

أَلَا لَهُ الْخَلْقُ وَالْأَمْرُ تَبَارَكَ اللَّهُ رَبُّ الْعَالَمِينَ¹⁰⁵

Hem afirandin hem jî sewq û îdara kâinatê her bi destê wî ye. Ellah Te'ala pîrozdêrayî ye perwerdekarê âleme ye.

Meqsed ji xelk û emrê ku di ayete derbas dibe alemê şuhudê û alema xeybê ye.¹⁰⁶

¹⁰⁴ Beqere, 2/2.

¹⁰⁵ E'raf, 7/54.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi bi rêya îqtibasê destnişan dike ku hûkumranê kanînatê her Xwedê ye. Yê ku diafirîne û yê ku perwerde dike her ew e. Mifta temamê sewq û tedbîra âleme bi destê wî ye.

*Emrê te bi lefzê **kun** du âlem*

Mewcud kirin xerez çi Âdem.

(Mem û Zîn, beyt:15)

Ey Xwedayê afirîner! Fermankirina te bi bêjeya bibe du âlem ji tunebûnê anîye heyê ku xerez ji afirandina herdu cîhanan jî meriv in. Lewra yê ku te gerandiye xelîfê rûyê zemîn jî ademîzad in.

Ev beyta Seydayê Xanî îqtibas e ji ayeta ku di Suretê Yasîn da derbas dibe. Xweda wisa ferman kirîye:

إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ¹⁰⁷

Bi rastî fermana Xwedê gava ku bi xwaze tiştêkî bi afirîne tene ew e ku bêje bibe ew tişt jî heman demê da bi demildest çêdibe.

Her wiha di Suretê Beqereyê da jî Xweda wisa dibêje:

بَدِيعُ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضِ وَإِذَا قَضَىٰ أَمْرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ¹⁰⁸

“Xwedayê Te’ala afirînerê erdû esmanan e gava ku bixwaze karekî pêkbîne an tiştêkî bi afirîne jê ra dibêje bibe ew tişt heman demê da çêdibe.”

Çewa ku ji me’ala herd û ayetan jî tê zanîn mebest beyana hêz û qudreta Xwedê yê. Seydayê Xanî jî di vê beyta xwe da bi rêya îqtibasê balê dikşîne li ser hêz û qudreta Xwedê yê ku bêtuxîbe. Lewra çi alema xeybî çi jî ev alema şuhudî be, hemu di bêjeya “**كُنْ**” da veşartîye.

Meqsud û muradê dil tu şayî

*Emma **tu tudillu men teşa yî.***

(Mem û Zîn, beyt:78)

¹⁰⁶ Komîsyon, *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsîr*, II, r. 537.

¹⁰⁷ Yasîn, 36/82.

¹⁰⁸ Beqere, 2/117.

Ey Xwedê! Tu meqsed û mirazê dilan î, lêbelê gava ku tu kî/ê bi xwezî rê li ber كن şaş bikî tu wî rêşaş dikî û bi zilf û xalan qeydbend dikî. Ger ne layîqê dilovînîya te be tu wî digerînî sezawarê qehr û xeşmê.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da îqtibas ji ayeta ku di Suretê Eraf da derbas dibe kirîye. Xweda di wî ayetê da wiha ferman kirîye:

وَاخْتَارَ مُوسَىٰ قَوْمَهُ سَبْعِينَ رَجُلًا لِّمِيقَاتِنَا فَلَمَّا أَخَذَتْهُمُ الرَّجْفَةُ قَالَ رَبِّ لَوْ شِئْتَ أَهْلَكْتَهُم مِّن قَبْلِ وَإِنِّي أَتُهْلِكُنَا بِمَا فَعَلَ السُّفَهَاءُ مِنَّا
إِنْ هِيَ إِلَّا فِتْنَتُكَ تُضِلُّ بِهَا مَن تَشَاءُ وَتَهْدِي مَن تَشَاءُ أَنْتَ وَلِيُّنَا فَاغْفِرْ لَنَا وَارْحَمْنَا وَأَنْتَ خَيْرُ الْغَافِرِينَ¹⁰⁹

“Musa ji nav qewmê xwe ji bo cih peymanê me heftê mêr bijart anî huzura me. Gava ku lerzekê wan girt erd bi wan hejîya, Musa got ey Xwedayê min! Eger te bixwesta te dikarîya berê jî wan û min birîya helakê. Ey Xwedayê min! Ma tu yê ji ber aqilsivikên di nav me da me hemîyan helak bikî? Ev cezakirin tenê ceribandîna û imtihaneka te ye ku tu çi kesê bi xwazî tu bi wî ceribandîna rêşaş dikî û bixwazî jî bi wî awayê tinî rêya rast. Yê xwedî û serkarê me her tuyî êdî tu xeta û gunehê me bibexşîne û li me were rehme ji xwe tu qectirîna bexşînkaranî.”

Xanî di vê ayeta ku wek hunera îqtibasê hilgirtiye wiha dibêje: Ya Rebbî! Afirînerê her tiştê tu yî. Temamê kar û barê gerdunê bi qudreta te çêdibe. Her tişt bi teqdîra te peyda dibe. Tu kî bi bixwazî ezîz dikî û kî jî bixwazî zelil dikî. Xanî di vê beyta xwe da ne ku inkâra cûz'ê ixtîyarî dike lewra mirov di kar û kiryarîyên xwe da ne bi temamî azad in ne jî bi temamî mecbur in.

Her çi ku tu bînê ser hidayet

Vêrra bigirî bi kî îneyet

Hzir wî dibe meqamê malum

Ger xadime wî digre mexdum.

(Mem û Zîn, beyt:80- 81)

¹⁰⁹ Eraf, 7/155.

Ya Xwedayê min! Her çi kesê ku tu bixwazî rê hîdayet bikî û bi dilovanî û alîkarîya xwe dorpêç bikî, tu wî alîmeqam dikî. Ger zelîl be tu ezîz dikî, ger xulam bibe tu digerrînî wezîr.

Di vê beyta Xanî da hem îqtîbas hem jî telmîh heye ku di Suretê Safat da derbas dibe. Xwedê wiha ferma kirîye:

وَمَا مِنَّا إِلَّا لَهُ مَقَامٌ مَّعْلُومٌ¹¹⁰

Nîne ji bo her yek ji me, illa li bal Xwedê meqam û mertebeyek di dîyarkîrî heye.

Tefsîrzanan li ser tefsîra vê ayetê nêrînên jihev cihê ragihandine. Li gorê piranîya tefsîrzanan ev gotin hikayeta îtîrafê ferîşteyan e ji bo kesên ku ji wan ra perestîna dikin. Yanê di ibadetkirina Xwedê da her yek ji ferîşteyan di meqam û mertebekî ku Xwedê ji wan ra dîyar kirî da ye. Nikarin ji wî meqamê derkevin. Hinekan gotine ev gotin qewlê Pexember û bawermend û muşirkane. Yanê di axiretê da ji bona her yek ji me ra meqamek kifşekirî heye ku meqamê hesabê ye¹¹¹

Seydayê Xanî di bin siha vê hunera îqtîbasê da balê dikşîne ku Xwedê serwer û hikumranê gerdunê ye. Herçendan serbestîyekê hindik dabe destê insanê jî lêbelê rêhêdayet û rêşafî destê Xwedê ye. Heta înkarmedî bûn û bawermedî bûn jî bi vîna wî çê dibe.

2.3.6. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Nasîna Zatê Xwedê da

Îrfan talebîd sahip idrak

Der heqqê te gotî “ma ‘erefnak.

(Mem û Zîn, beyt:90)

Ey Xwedayê min! Telepkarên îrfandarîyê û xwedanê îdrak û fehmdarîyê ku (Muhemmed Pêxember) derheqê rêya merîfeta te da wiha gotine: “Me bi heqqî merîfeta te te nas nekir.” Eger ku Xwedê alîkarêya Xanî neke û Mustafa Pêxember jî rehberê wî nebe, ne dûr e ku bi nezanîna xwe ji rêşaf be.

Xanî di vê beyta xwe da hunera îqtîbasê ji hedîsê hilgirtîye:

¹¹⁰ Saffa, 37/164.

¹¹¹ el-Qurtubî, b.n.b, XV,r. 90

“Me bi heqê naskirinate te nasnekir.”

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi vê hunera îqtîbasê balê dikişîne li ser kêrî ku quwetîya îdraka ‘evdan di der heqê naskirina mezinahîya zat û sîfatên Xwedê. Lewra derheq zat û sîfatên Xwedê da naskirina evdan nisbî ye. Heqîqeta zat û sîfatên Xwedê Te’âla her ew dizane.

2.3.6. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên Derbarê Afirandina Qelemê da

Her çi weku bûne bê reqem bû

Lew ewwelê ma-xeleq qelem bû.

(Mem û Zîn beyt:101)

Temamê tiştên heyî di destpêkê da bê reqem û bê rêz û tertîp bûne, lewra Xwedê pêşîya her tiştê qelem afirandîye.

Perwîz Cîhanî di şîroveya vê beytê da wiha dibêje: “Her tiştê ku dihate afirandinê nedibû ku bênişane û bêhejmar û nav be, li ber vê hinde bû ku Xweda berî her tiştî qelem afirand daku pê qelemê nav û nişan yan jî hejmara wan tiştana li lewhê mehfuzê da binitîlîne.”¹¹³

Ev beyta Xanî îqtîbasê ji hedîsê ye ku hatîye ragihandin. Resulê Xwedê wiha gotîye:

¹¹⁴ إِنَّ أَوَّلَ مَا خَلَقَ اللَّهُ الْقَلَمَ، فَقَالَ لَهُ اكْتُبْ، قَالَ: مَا أَكْتُبُ؟ قَالَ: اكْتُبْ الْقَدَرَ، مَا كَانَ وَمَا هُوَ كَائِنٌ إِلَى الْأَبَدِ.

“Bêguman ewilîn tiştê ku Xwedê afirandîye qelem bûye. Xwedê jê qelemê ra got binivîse. Qelêmê got, ez çi binivîsim? Xwedê got qedere binivîse ji ezel heya ebed tiştên ku çêbûye û tiştên ku wê çêbibin binivîse.”

¹¹² Ebu Muhammed Bedreddin Mahmud b. Ahmed b. Musa el-Ayni, *Umdetul Qari Şerhu Sehîh el Buxarî*, I-XXV, Darul fikir, Beyrut, XXII,r.198.

¹¹³ Ehmedê Xanî *Mem û Zîn Ehmedê Xanî*, (Amd.: Perwîz Cîhanî), Weş Nûbîhar, Çapa1ê, Stenbol, 2010, r.154.

¹¹⁴ Muhammed Nasir û din Elbani, *Sahîh el Camî ‘us- Sağîr*, el-Mektebul- İslam, Çapa 3’yan, Beyrut, 1988, 405, 2017.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi îqtibasa hedîsê destnişan dike ku Xwedê Te'âla ferman li qelemê kirîye daku ji ewilê afirandinê heya qîyametê temamê tiştên heyîne bi qeyd û nişan kirina qelemê bêne tedwîn û tertîp kirin.

2.3.7. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Alîkarîya Xwedê ji bo Bawermendan da

Her çi te didî meger her ew bû

Leşker ji cunûdê lem terew bû,

(Mem û Zîn, beyt: 134)

Ma qey her çi tiştê ku bi çavan dihate dîtîn û te didît tenê ew bû? Nexêr ew xwedanê leşkerê nedîyar û xefbû. Di vê beytê da Xanî behsa alîkarîya Xwedê ji bo Pêxember dike. Dema ku li hember inkarmendan şer dikir, Xwedê Te'âla bi awayeke nedîyar alîkarî ji Muhammed Pêxember dişand da ku mûşrikan tarûmar bikin.

Di vê beyta Xanî da ji sê ayetan hem hunera îqtîbasê hem jî hunera telmihê hatîye pêkanîn. Di van ayetan da Xwedê Te'âla wiha ferman kirîye:

﴿مَنْ أَنْزَلَ اللَّهُ سَكِينَتَهُ عَلَى رَسُولِهِ وَعَلَى الْمُؤْمِنِينَ وَأَنْزَلَ حُنُودًا لَمْ تَرَوْهَا وَعَدَّ بَاطِنًا كَفَرُوا وَذَلِكَ جَزَاءُ الْكَافِرِينَ﴾¹¹⁵

“Paşî Xwedê li bal xwe tebat û dil aramî da Pêxemberê xwe û bawermendan û leşkerên nedîyar ku wan nedîti bû ji xeybê ji wan ra daxist bi vê awayê inkarmend cezakirin. Eva cezayê Xwedê ye ku dide kafîran.”

﴿فَأَنْزَلَ اللَّهُ سَكِينَتَهُ عَلَيْهِ وَأَيَّدَهُ بِجُنُودٍ لَمْ تَرَوْهَا وَجَعَلَ كَلِمَةَ الَّذِينَ كَفَرُوا السُّفْلَى وَكَلِمَةُ اللَّهِ هِيَ الْعُلْيَا وَاللَّهُ عَزِيزٌ حَكِيمٌ﴾¹¹⁶

“Wî gavê Xwedê Te'âla dil aramîya xwe li ser pêxember yan jî hevalê wî da anî û piştevanîya wan bi leşkerên ku hûn wan nabînin teqwiye kir. Xwedê bi wê awayê gotin û daxweazîyêwan binxist. Gotina Xwedê bilintirînê gotinane. Xwedê di temamê kare xwe da xwedî hêz û karbîne cihe.”

﴿يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اذْكُرُوا نِعْمَةَ اللَّهِ عَلَيْكُمْ إِذْ جَاءَتْكُمْ جُنُودٌ فَأَرْسَلْنَا عَلَيْهِمْ رِيحًا وَجُنُودًا لَمْ تَرَوْهَا وَكَانَ اللَّهُ بِمَا تَعْمَلُونَ بَصِيرًا﴾¹¹⁷

“Ey gelî ku bawerî anîne! Hûn qencîya ku Xwedê Te'âla li we kirîye bîra xwe bînin. Gava ku leşkerên neyaran li ser weda hatin û me jî li serwan da babelisk û leşkerên ku we nedidîtîn şand. Xwedê ji temamê kar û kiryarên we zêrewan e.”

¹¹⁵ Tewbe, 9/26.

¹¹⁶ Tewbe, 9/40.

¹¹⁷ Ehzap, 33/9.

Seydayê Xanî bi rêya hunera îqtîbasê destnîşan dike ku Xwedê Te'âla tu demê pêxemberê xwe û bawermendên rastgo li hember neyarên dîn bi tenê nehiştîye.

Dibe ku çav nebînîn lêbelê bi yeqînî bizane ku Xwedê di Qur'anê da bi gelek ayetan alîkarîya ji bo pêxember û bawermenda ra bi serîhê ayetê nîşanê me dide.

2.3.8. Îqtîbasên Ayet û hedîsên di Derbarê Muhammed Pêxember da

Ey wasîteyê wucudê kewneyn

Şayîsteyê qurbê qabe qewseyn

(Mem û Zîn, beyt: 161)

Ey pêxemberê ku buye sebebê afirandina herdu cîhanan! Ey Nebîyê ku layîqê nêzikahîya Xwedê Te'âla bûye bi qasê nîzikahîya dû biruyên wek sere du kevanan. Xwedê gelek mucîze ji te ra ihsan kirine.

Di vê beyta hevoka **Qabe qewseyn** wek hunera îqtîbasê hatîye hilgirtin ku di Suretê Necm da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

دُو مَرَّةً فَاسْتَوَىٰ وَهُوَ بِالْأُفُقِ الْأَعْلَىٰ ثُمَّ دَنَا فَتَدَلَّىٰ فَكَانَ قَابَ قَوْسَيْنِ أَوْ أَدْنَىٰ¹¹⁸

Ew ferîşte, di eqî û şeklê xwe da bê kêmasî bû. Êdî ew li ser şiklê xwe yê eslî di bilindîya esmanan da rawestîya û xwe nîşanê pêxember da. Ew ferîşte nêzikê Pêxember bû û wisa nêzikê wî bû bi qasê serê du kevanan yan jî hê bêhtir nêzik bû.

Di kitêbên tefsîrê da li ser nêzikahîya di ayetê da du nêrînên ji hev cêhê hene. Hinek dibêjên yê ku nêzikê Pêxember bûye Melekê Cebraîl e. Hinek jî dibêjin yê ku nêzikê Xwedê Te'âla bûye Pêxember e. Her wekê Ibn Abbas jî wisa gotîye.¹¹⁹

Hinekan jî, qabê qewseynê wiha tefsîr kirine: Pêxember wisa nêzikê Xwedê Te'âla bûye ku bi qasê nîzikahîya “wacib û îmkanê” ku bi wan herdu têgehên merteba ûluhiyet û ubudîyetê tê parastin. Yan jî hê bêhtir nêzik bûye êdî merteba îmkanê fena bûye.¹²⁰

Seydayê Xanî di van çend beytê xwe da behsa mucîzatên pêxember dike, yek ji mucîzatên wî jî çûyîna miracê ye. Dema ku Pêxember diçe miracê Qur'ana pîroz

¹¹⁸ Necm, 53/ 6-9.

¹¹⁹ el-Qurtubî, b.n.b, XVII, r.60.

¹²⁰ Muheyiddin Ebî Muhammed Abdulqadir el Geylanî, *Tefsîr ûl Geylanî, I-V*, Merkezul Geylanî bi hûsil- 'ilmîye, ç 3'yan, Stenbol, 2009, V,r. 444.

wî sehneyê bi wan çend ayetan îfade dike. Yek ji wan ayetan “**qabê qewseynê**” ye ku nizikahîya navbera melekê Cibrîl an jî nizikahîya Pêxember ji bo Xwedê Te’âla destnişan dike; lêbelê wisa xuya dike ku Seydayê Xanî jî li ser nêrîna nêzikahîya pêxember ji bo Xwedê Te’âla ra meşîya ye.

Şeqel qemer a te yek îşaret

Zaxel besera te yek ibaret.

(Mem û Zîn, beyt: 164)

Ey Pêxemberê Xwedê! Xwedê bi gelek mucîzatan li hember neyarên te, te gewî û hêzdar kirîye. Yek ji wan mucîzatan ew e ku bi yek îşareta te hêyiv bû du ker. Ev ayeta ku dibêje “Ma zaxel beser” têra edeb û têgihiştina te yê li hember mezinahîya Zatê Xwedê dike.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da ji du ayetan îqtibas kirîye. Ayeta ewil di surtê Qemer da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

اَفْتَرَبْتَ السَّاعَةَ وَأَنْشَقُّ الْقَمَرَ¹²¹

Dema rabûna qiyamet nêzik bûye û heyîv jihev du ker bûye.

Pûtperestên Mekkehê li Pêxemberê me civîyan û gotin eger tu rastbêj î, nexwû ji me ra heyîvê bike du ker, bila şeqekê wê bikeve li ser çiyayê Ebî Qubeysê şeqê din bikeve li ser çiyayê Qûe’yaqîanê. Pêxember (s.l.x) got, eger ez wisa bikim wê hunê îman bînin? Wan gotin belê êdi şevêkê ku heyîv derketîbû, Pêxember ji Xwedê daxwazî kir ku ew tiştê pûtperest dixwazin bi deste wî ve bîne. Êdî bi yek îşaretê heyîv duker kir û dûra wekê berî heyîv hate hev. Muşrik li hember vê meselê heyîrî man û gotin Muhammed sêhir kir. Wî demê ev ayet nazil bû.¹²²

Di rêza duyemîn da hunera îqtibasê ji ayeta ku di Suretê Necim da derbas dibe hatiye girtin. Xwedê wisa ferman kirîye:

مَا زَاغَ الْبَصَرُ وَمَا طَغَى¹²³

¹²¹ Qemer, 54/1.

¹²² el-Qurtubî, Ebu Ebdullah Muhammed b. Ehmed el- Ensarî, *Tefsîrû'l-Qurtubî*, XVII, r.82.

¹²³ Necm, 53/17.

“Çavên Muhammed Pêxember ne di alîyê rastî da ne jî di alîyê çepî da meyl nedaye. Hem çavên wî ji tiştî dîtî jî derbas nebûye.”

Dema Pêxember di şeva mîracê da mezherê tecellîya nûra îlahî bû, hinek hal û rewşên xeybî dît lêbelê li hember van halên xeybî xwe winda nekîr. Her wiha ji xeynê cemal û celalîyeta Xwedê tişekî wî meşxul nekir.¹²⁴

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi hunera îqtîbaskirina vê ayetê mucîzatên Muhammed Pêxember, edep û cesareta wî dîyar dike. Lewra di wî meqamê da tenê fermanberê Xwedayê xwe bûye. Çavên wî ji bilê nura Xwedê li rast û çep nezivîrîye û têştin pir xweşik ji alema xeybê wî ji tiştî ku pêwîst bû dîtina wî meşxul nekîrîye.¹²⁵

*Ey Padişahê serîrê **Lewlak***

Rabe here Asîmanê çalak.

(Mem û Zîn, beyt:165)

Ey padişahê ku Xwedê li ser textê lewla daye rûniştinê! Rabe bilezîne here asîmanan. Meqsed jê wî çûyîne şeva miracê ye.

Xanî jî wek Melayê Cizîrî hunera îqtîbasê ji hedîsa lewlakeyê hilgirtîye. Ragihandina hedîsa qudsî da Xwedê wiha gotiye:

لَوْلَاكَ لَوْلَاكَ لَمَّا خَلَقْتُ الْأَفْلَاقَ¹²⁶

“Ger tu nebuya, ger tu nebiya, min gerdun nediafirand.”

Ji ber ku em bi hurgirî di rupela 12-13an da li ser şerha vê hedîsê rawestîyane. Emê li vir li ser şerh û şîrovê nesekinin. Lê em dixwazin di îqtîbaskirina vê hedîsê da balê bikşînim li ser ferqa navbera Mela û Xanî da. Mela di îqtîbas kirina xwe yê di vê hedîsê da balê dikşîne li ser sihetdêrana wateya vê hedîsê. Ji ber vê yekê li hev qîyaskirinekî di navbera vê hedîs û hedîsa “ez gencîniyek veşartîbum” dike.

Seydayê Xanî di îqtîbaskirina xwe da “lewlakê” diwekîne kursîyek ango textegahek ku padişah li ser runiştîye. Yanê dibêje eger dunya kursî be padişahê wî

¹²⁴ Tefsîr ûl Geylanî, V,445.

¹²⁵ Tefsîr ûl Geylanî, V, 445.

¹²⁶ ‘Eclûnî, *Keşful-Xefa*, 2123, 491.

kursîyê Muhammed Pêxember e. Elbet babetê ji bo wî ku li Bûraq u Refrefê siwar be û li ber asîmanê pir xweşik ve bilind bibe û ferîşte jî sef sef wî pêşwazî bikin Hate paşî perde li ber rabe û bibe mezherê cemala Xwedê.

2.3.9. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Dilsozîya Evîna Xwedê da

Xelqê ji yuhubûhum di gergûn

Her çi ji ezel bûyî yuhubbûn

(Mem û Zîn, beyt:333)

Ji ber ku wateya vê beytê bi du beytên pişt xwe girêdayî ye, emê bihevra şîrove bikin. Ew kesên ku Xwedê ji wan hez dike û yên ku ji roja elestê ve bûne evîndarê Xwedê bila bên guh bidin vê hîkayetê ku mebest ji hikayetê evîna Xwedê ye. Bila hinek ji wan bi bîhîstina vê hikayetê xwe jibîr bikin yanê fenafillah bin. Bila hinek jî bi dil û can guhdarîya vê hîkayetê bikin da ku rêşaş nebin yanê bibin ehlê şuhûdê. Bila hinek ji wan jî ji eşqê xatir bixwazin lewra eger li gorê pîvanê eşqê tev negerin dibe ku di rêya eşqê da xeniqin.

Ev hunera îqtîbasê ku Xanî di vê beyta xwe da bikar anîye di Suretê Maîdeyê da derbas dibe.

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا مَنْ يَرْتَدَّ مِنْكُمْ عَنْ دِينِهِ فَسَوْفَ يَأْتِي اللَّهَ بِقَوْمٍ يُحِبُّهُمْ وَيُحِبُّونَهُ أَذِلَّةٌ عَلَى الْمُؤْمِنِينَ أَعِزَّةٌ عَلَى الْكَافِرِينَ يُجَاهِدُونَ فِي سَبِيلِ اللَّهِ وَلَا يَخَافُونَ لَوْمَةَ لَائِمٍ ذَلِكَ فَضْلُ اللَّهِ يُؤْتِيهِ مَنْ يَشَاءُ وَاللَّهُ وَاسِعٌ عَلِيمٌ¹²⁷

Gelî kesên ku bawerî anîne her çi kesê ji we ji dînê xwe vegere wê nêzik da Xwedê di şuna wan da xelkeke din ku Xwedê ji wan hez dike bîne û ew jî ji Xwedê hez dikin. Ew li hember bawermendan bi rehm û şefqet in li hember înkarmendan jî xwedan izzet û serbilind in. Di rêya xwedê da têkoşînê dikin ji hetka hetikberan natirsin. Ev qencîya Xwedê ye ji kî/ê ra bixweze dide wî. Xwedê destfirehê qencîyê ye û zanayê bi her tiştê ye.

Her wekê ku ji meala ayetê hate fêhm kirin ku kesên Xwedê ji wan hez dike û ew jî Xwedê hezdikin; pêwîst e ku rehmdar û dilovan, berxwedêr û şerefdar bin. Di oxira dîn da têkoşerên ser bi dêrbin.

¹²⁷ Maîde, 5/54.

Seydayê Xanî bi hunera îqtîbasê balê dikşîne li ser wesfên evîndarên Xwedê ku pêwîst e li ser ehd û peymana roja ku Xwedê got, “Ma ez ne Rebbê we me? Wan jî gotin belê, tu Rebbê me yî.” Ji rûsatîya evîndarîyê netirsîn, lewra ‘eşq bê lewme nabe. Êdî pêwîst e ku ji lewma lewmekaran netirsîn, li hember neyarên eşqê ku nefîs û ezîtîya aşîqê têkoşêr bin. Yan fenafillah bin yan ji derbasê wehdetê şuhûdê bin.

2.3.10. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê ‘Alema Ruhan da

Lewra cûnudê can mucenned

Çêbune di ‘ilme heq muxelled.

(Mem û Zîn, beyt: 567)

Evîn û nevînê her çendan li gorê me hadis bin yanê paşî çêbibin, lê bele di heqîqeta xwe da qedîm in lewra ruh bi komelî di ilmê Xwedê da her heyî bûye hinek li hev hogirin hinek jî lihev neban in.

Seydayê Xanî di rêza beyta xwe da ji hedîsa Pêxember îqtîbas kirîye.

¹²⁸ عَنْ أَبِي هُرَيْرَةَ أَنَّ رَسُولَ اللَّهِ: الْأَرْوَاحُ جُنُودٌ مُجَنَّدَةٌ فَمَا تَعَارَفَ مِنْهَا اِدْتَلَفَ وَمَا تَنَافَرَ اخْتَلَفَ

Ji Ebû Hureyre hatîye ragihandin ku Pêxember wiha gotîye: Ruhê insanan leşkerên komkirine. Hinek ji wan hev hogirin dema hevnas bikin lihev banin hinek ji wan hevdijberin dema hevdu dibînin li hev nayên.

Hinek Zanyarên ilmê hedîsê gotine wateya hedîsê wiha ye: Di pêşîya pêşî da ruh bi awayek komelî hatîye afirandin. Paşî di bedenên da ji hev cuda bûne. Yê ku hev siruşt bin li hev dildar dibin yê ku li hev dur siruşt bin ji hev rik dibin û li hev nabanin.¹²⁹

Seydayê Xanî di bin wateya vê hedîsê da balê dikşîne li ser qedîmbuna ‘eşqa Mem û Zînê û Tacdîn û Sitîyê. Lewra her çendan eşqa wan bi nisbet li bal me taze peydabuyîbe jî, lêbelê Seydayê Xanî angaşte dike ku di ilmê Xwedê yê her heyî da wekê her ‘aşîq û meşuqê ruhê Mem û Zînê jî li hev êwirandîbûne dema ku li dinê hevdû dîtine lihev banîne.

¹²⁸ Newewî, Ebû Zekerîyyâ Yahyâ b. Şeref, *Şerhu Sehîhî Mûslim li Newewî*, 2003, VIII, 2638.

¹²⁹ Newewî *Şerhu Sehîhî Mûslim*, VIII,

2.3.11. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Musa Pêxember da

Qarure ji necmê mun 'ekis bû

Nûrek me bi qelbê mûqtebis bû.

(Mem û Zîn, beyt:690)

Dema ku her çar bihevra li hev rast hatin şûşeya dilê Zîn û Sitîfê bi çirayê agirê 'eşqa Mem û Tacdîn rewneqdar bû. Agirê ruyê wan bi fitîla çîrayen 'eşqa wan hîlbû bi wî agirê bi xwe dişewitîn.

Seydayê Xanî div ê aytê da bi rêya telmîh û îqtîbasa ji ayeta ku di Suretê Taha da derbas dibe kirîye Xwedê wiha gotîye:

إِذْ رَأَى نَارًا فَقَالَ لِأَهْلِهِ امْكُثُوا إِنِّي آنَسْتُ نَارًا لَعَلِّي آتِيكُمْ مِنْهَا بِقَبَسٍ أَوْ أَجْدُ عَلَى النَّارِ هُدًى¹³⁰

“Dema ku ji dur ve agirek dît ji ehlê xwe ra got: Hun li wir bi sekinin, min agirek dît dibe ku ji wî agirê destikek ji bo we bînim yan jî delilek bi bînim da ku rê nîşanê me bide.”

Di tefsîra Fexrudîn Razî (544/1149) da hatîye gotin çar qismên agirê hene

- (a) Agirek bi nûr û çirusk e lê şewitîn jê ra nîne, wek agirê Musa Pêxember.
- (b) Agirê dişewitîne, lê bêşemal û nur e wek agirê dojhê.
- (c) Agirê bi çirusk û nûr e hem jî bi şewat e, wek agirê li dunyayê,
- (d) Agirê ne bi nûr e ne jî bi şewat e, wek agirê daran.¹³¹

Seydayê Xanî di vê telmîh û îqtîbasê da agirê 'eşqa Mem u Tacdîn ku Xwedê nîşanê Zîn û Sitîfê da şibandîye agirê Musa Pêxember ku agirek manewî bûye. Yanê agirê wehyê bû. Xwedê nîşanê wî da daku dilê insanan bi qebesa wehyê ronîdar bike.

2.3.12. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Nûra Xwedê da

Eşq agire ten çiyayê Tûr e

Dil ew şecera bi nar û nûre

Mîşkat e qefes qebes çira ye

¹³⁰ Taha, 20/10.

¹³¹ er-Razî, Fexruddîn, b.n.b, XI, r.282.

Can zeyt e fitile wî xefa ye

Dil şûşeye ev çira di nave

Ser cuz e dil kullê da bela ve

(Mem û Zîn, beyt: 845-847)

Eşq wek agirê ye bedena aşiqê wek çîyayê Turê Sîna ye dil jî ew dara ku bi agir û pêt e, qefesa Singê aşiqê kuleka agirê çirayê meşuqê ye. Canê aşiqê wek zeytê bi fitîla derd û cefayê hildibe. Dilê wî wek şûşeya şemal di nêv da. Her çendan dil di nêv leş û bedenê da parçeyekê piçûk be jî lê êş û jana agirê wî, wî bedena wek çîyayê Turê Sînayê hilwetişîne.

Seydayê Xanî di çend beytên xwe de bi îqtîbasa bêje û wateya ayeta ku di Suretê Nur da derbas dibe xemilandîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

اللَّهُ نُورُ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضِ مِثْلُ نُورِهِ كَمِشْكَاةٍ فِيهَا مِصْبَاحٌ الْمِصْبَاحُ فِي زُجَاجَةٍ الزُّجَاجَةُ كَأَنَّهَا كَوْكَبٌ دُرِّيٌّ يُوقَدُ مِنْ شَجَرَةٍ مُبَارَكَةٍ زَيْتُونَةٍ لَا شَرْقِيَّةٍ وَلَا غَرْبِيَّةٍ يَكَادُ زَيْتُهَا يُضِيءُ وَلَوْ لَمْ تَمْسَسْهُ نَارٌ نُورٌ عَلَى نُورٍ يَهْدِي اللَّهُ لِنُورِهِ مَنْ يَشَاءُ وَيَضْرِبُ اللَّهُ الْأَمْثَالَ لِلنَّاسِ وَاللَّهُ بِكُلِّ شَيْءٍ عَلِيمٌ¹³²

“Ella rewneqdêrê erd û asîmanan e. Mînaka nûra wî wekê kuleka ku tê da çirayek vêketî hebe. Ew çira jî di nêv camê da, ew cam mînanê stêrkekê rewneqdar ronahî dide. Ew çira jî darek pîroz e ku dara zeytûnê ye. Ew dar ne li alîyê rojhilatê ye ne jî alîyê rojavayê ye. Her çendan agir negihêje zeyta wî jî; ji ber safî û zelalîya wî, tu dibêjî qey bi xwe hildibe. Ev nûra li ser nurê ye. Xwedê çi kesê bi xweze ku raste rê bike nûra xwe nîşanê wî dide. Xweda van mîsalan pêşkêşê insanan dike da ku insan baştir rêya Xwedê nas bikin. Xwedê zanayê bi her tiştê ye.”

2.3.13. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Munafîqan da

Menna ‘û muzebzebîn û iblis

Xedda ‘û xeberbezîn û teblîs.

(Mem û Zîn, beyt:1134)

¹³² Nur, 24/35.

Ew Bekoyê Ewan mirovek xêrnexwaz û minafiq û xebergerînbû wek şeytanê xapînok fesadker bû.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi têgeha “muzebzebîn” hûnera îqtîbasa naqis bikar anîye ku di Suretê Nîsa da derbas dibe. Yezdanê Diloan wiha ferman kirîye:

مُدَّبِّبِينَ بَيْنَ ذَلِكَ لَا إِلَى هَؤُلَاءِ وَلَا إِلَى هَؤُلَاءِ وَمَنْ يُضِلِلْ اللَّهُ فَلَنْ تَجِدَ لَهُ سَبِيلًا¹³³

Ew mirovên minafiq di navbera inkarmend û bawermendan da diçin û tèn. Ne li bal wan in ne jî li bal wan. Kesê ku Xwedê wî ji rêya rast derîne êdî tu ji wî ra tu rêyek nabînî.

Xanî di vê beyta xwe da bi pêkanîna hunera îqtîbasê rewş û kiryarîyên Bekoyê ‘Ewan ku wek mirovek xêrnexwaz, xerberbezîn û di rû û xapînok tê simbolîzekirin şîbadîye bi minafaqên ku di navbera kafirî û bawerî anînê da di çin tèn. Bi hîlekarî şeytanî xered û fesadîyên xwe xef dikin.

2.3.14. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Fermana Xwedê û Nefsa Mutmeînne da

Her çend ku zahir iqlê got

Hadir di pê ve ircî got.

(Mem û Zîn, beyt:2086)

Wateya vê beytê bi çend beytên berîya xwe ve girêdayî ye. Seydayê Xanî di wan beytan da bi kurtasî di kesayeta Memê da balê dikşîne li ser Mûrşîdekî heqîqî. Paşî wesfên şêxê xwe wiha dibêje: Ew ruh û rewan e, ez parçekî guştê hişkirî me. Her çendan navê wî li ba we Mem bû, lêbelê di rastîyê de ew padîşahek himmetqebul bû. Li diwana Xwedê mehdervanîya wî dihat hêvî kirin. Dilê wê wek newala muqeddes pîroz bû, ruhê wî wek pêta agirê hil dibû. Ewî şêxê min ê payebilind, ez birime li çiyayê Turê Sînayê û min wek xwe, dîdarê Cemala Xwedê kir. Wî ez wek zerreyekî di bin vê perdê deranîm û gihande rojê ku pertewa nûra Xwedê yanê ez fenafillah bûm. Êdî dema ku me xwest em digel ruh sefer bikin, me ji canfiroşê ev ruh ker gir. Her çendan canfiroşê bi zahirî gote ruhê min “Îqle‘î” yanê dest jê bikêşe di pê ve got “Îrci‘î” yanê vegere li bal min.

¹³³ Nîsa, 4/143.

Seydayê Xanî di vê beyta Xwe da ji du ayetan, hûnera îqtibasa naqis pêk anîye. Yek di Suretê Hud da derbas dibe ku Xwedê wiha ferman kirîye:

وَقِيلَ يَا أَرْضُ ابْلَعِي مَاءَكَ وَيَا سَمَاءُ أَفْلَعِي وَغِيضَ الْمَاءِ وَقُضِيَ الْأَمْرُ وَاسْتَوَتْ عَلَى الْجُودِيِّ وَقِيلَ بُعْدًا لِلْقَوْمِ الظَّالِمِينَ¹³⁴

Hate gotin: Hey erd! Ava xwe biçikîne. Hey asîman! Tu jî barana xwe bisekinîne. Bi vê awayê av çikîya û fermana Xwedê pêk hat. Keştî li ser çîyayê Cudî rûnişt. Û hate gotin: Bila komela cewirkaran ji rehma Xwedê dur û bêpar bin.

Ayeta dudyar jî di Suretê Fecrê da wiha derbas dibe:

ارْجِعِي إِلَى رَبِّكَ رَاضِيَةً مَرْضِيَّةً¹³⁵

Vegere li bal Xwedayê xwe bi awayek tu jê razî û ew jî te razî.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi îqtibasa van herdu ayetan balê dikişîne li ser wehdetû'ş-şuhûdê.

2.3.15. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Eshab ê Kehf da

Gava ku diçîne niv se'îdê

Kelbê me bitin li ber wesîdê.

(Mem û Zîn, beyt:2307)

Ji hêla wateyê da ev beyta ha girêdayê çend beytên pêşîya xwe ne. Xanî di wan beytan da wiha dibêje: Dema ku Zînê xebera kuştina Beko seh kir, ji Mîr Tacdîn ra wiha got: Ey mîrê rêzdar û hişyar! Ez hêvîdar im ku hûn derheqê Bekir ku serekanîya fesadîyê bû inyadê nekîn. Lewra dema Xwedê evin da evîndaran hingê buxz jî da reqîban Xwedê di afirandinê da me ji hev ra garend lazim û melzum. Eger ku em sorgul bin ew jî bo me strî ye, eger em xezîne bin ew jî bo me mar e, lewra gul bi strîyan tên parastin, xezîne jî bi maran tên xwedî kirin. Bekoyê Ewan her çendan pêşî cefakarî da me paşî jî wî ji me ra wefadarî kir. eger ku ew nebûya perde neketîya navbera me di eşqa me têk biçûya her çendan wî ji bo xwe xerabî kir lê ji bo me qencî kîr ew bu wesîla heqîqeta evîna me û bu ehle terîqeta me di rêya me da bu şehîd.¹³⁶

¹³⁴ Hud, 11/44.

¹³⁵ Fecr, 89/28.

¹³⁶ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Weş Nûbihar, Stenbol, 2009,r. 195.

Eger ku hun rast vekolin ew ji qencan e. Nebî hun wî ji meşheda Memê û merqeda me dur bikin. Em bi wî seyê hatine parastin. Gava ku em biçine nêv axê wê bibe seyê li ber derîzana me.

Xanî di vî beyta xwe da îqtîbasa naqis bikar anîye ku di Suretê Kehf da derbas dibe. Xwedê wîha ferman kirîye:

وَتَحْسَبُهُمْ آئِنِقَاطًا وَهُمْ رُقُودٌ وَنُقَلِّبُهُمْ ذَاتَ الْيَمِينِ وَذَاتَ الشَّمَالِ وَكَلْبُهُمْ بَاسِطٌ ذِرَاعَيْهِ بِالْوَصِيدِ لَوِ اطَّلَعْتَ عَلَيْهِمْ لَوَلَّيْتَ مِنْهُمْ فِرَارًا
وَلَمَلَّيْتَ مِنْهُمْ رُعبًا

“Eger ku te wan xurtên eshabê kehf di şikeftê da bidîta di gel ku ew di halê razanê da bûn jî te yê bawer bikira ku ew hişyarin. Lewra çaven wan vekrî bûn. Me wan bi alîyê rast û çep da diqulipandin (daku bedena wan nerize) Seyê wan li ber derîzana şikeftê li ser her du zendên xwe dirêj kirîbû. Eger te ew li ser wî halê bidîtana tu yê bilez û bezji wan birevîya û ji ber dîtina wan wê dile te teji tirs bûya.”

Seyda yê Xanî bi rêya vê îqtîbasê Mem û Zîn şibandîye Eshabê kehf û Bekoyê Ewan jî şibandîye seyê li ber dere şikeftê çewa ku Seyê wan sêsed nehsal xurtên şikeftê parast. Her wiha em jî bi Beko hatine parastin.

2.3.16. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Xwe amedekariya ji bo Mirinê da

Sofî me û sewme'enîş im

Xoş talibe nurê ruyê Zîn im.

Hasil qewimî meqamê mûtû

Ber mucibê qeble en temûtû.

(Mem û Zîn, beyt:1816-1817)

Ez sofî me ji nefsa xwe çume û min dev ji xwe berdaye. Li ibadetxanê runiştîme. Min dilê xwe ji gunehan texlîye kirîye û bi nûra Xwedê ku li ruyê Zîn tecelli bûye tehlîye kirîye. Ez ji bo emrê ku tê gotin bi mirin berîya ku hun nemirin fermanber im.

Ev beyta Xanî ji gotinekî ku wek hedîs hatîye ragihandin hatîye îqtîbas kirin. Lêbelê di rastîyê da ne hedîs e lê di nav ehlê tesewifê da gotinek meşhûr e.

¹³⁷ Kehf, 18/18.

“Bimirin, berya ku hun nemirin.”

Di vê pêkanîna hunera îqtibasê da Xanî destnîşan dike ku Mem di zindanê da di gelek konaxên eşqê da derbas bûye. Wî neynika dilê xwe bi nûra rûyê Zînê cîla kirîye. Dilê xwe ji temamê tiştên fanî xalî kirîye. Derd û kesera wî gihîştina dîwana mîrê mîran e. Dibe ku Seydayê Xanî di şexsîyeta Memê da behsa konaxên eşqa xwe dike ku dilê xwe ji gunehan xalî kirîye û paşî jî bi eşqa Xwedê sîqal kirîye.

2.3.17. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Halê Kafirên Dojehê da

Fil cumle ne murde û ne ehya

Ber mucîbê la yemûtû yehya.

(Mem û Zîn, beyt: 2516)

Di dawîyê da nemirin e û ne jîn e bi hesab, ayeta ku dibêje: “Ew li wir ne dimire ne jî sax dibe.”

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da hunera îqtibasê ji wî ayeta ku di Suretê Taha da derbas dibe hilgirtîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

إِنَّهُ مَنْ يَأْتِ رَبَّهُ مُجْرِمًا فَإِنَّ لَهُ جَهَنَّمَ لَا يَمُوتُ فِيهَا وَلَا يَحْيَى¹³⁹

Bêguman çî kesê gunehkar bi gunehên xwe were huzura Xwedê, dojah her ji bo wî ye. Ew di dojahê da nedimire ku jê xilas bibe, ne jî sax dibe ku jiyanek xweş bibîne ku tê da asan bibe.

Yan jî îqtibasê ji ayeta ku di Suretê E’la da derbas dibe:

الَّذِي يَصَلَى النَّارَ الْكُبْرَىٰ ثُمَّ لَا يَمُوتُ فِيهَا وَلَا يَحْيَى¹⁴⁰

Ne qenc, ewê ku dikeve agirê herê mezin. Paşî ew di dojahê da ne dimire ne jî sax dibe.

¹³⁸ Mela E’lî el- Qarî, Nureddin Alî, b. Muahmmmed, b. Sultan, *Esrarûl Merfû’e Fî Exbarûl Mewdu’e*, Darul- Emane, Beyrut, 1971,r.368. Di heman rupelê da te gotin ku İbn û Hecer gotîye: Ev hedîs mewdu e’

¹³⁹ Taha, 20/74.

¹⁴⁰ E’la, 87/12-13.

Xanî, di vê beyta xwe da peyama dilê xwe bi hunera îqtîbasa ehzen şirove kirîye. Lewra Ev beyta li jor encama çend beytên li pêşîya xwe ne. Di wan beytan da Xanî balê dikişîne li ser fanîbûna gerdunê. Her çendan destpêka wî heyat be jî lê ne dewamî ye lewra dawîya wî mirin e. Bêguman ademîzad dimrin tèn definkirin û dirizin paşî carek din sax dibin. Ew kesê ku dilê xwe ji qirêjîya dinê neşû wê sezawarê dojhê bibe.

2.3.18. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Şeraba Ehlê Bihuştê da

Hêja nebûye rehîqê Mextum

Hêja neçûye meqamê m'elum.

(Mem û Zîn, beyt:2570)

Hêj ew şerap nebûye mîna şeraba mextûm ku şeraba safî û gihiştîye û ji bo tahm û zewqa wî xira nebe devgirtî û sermohirkirî ye. Hêj neçûye meqama nêzikahîya temaşa cemal û celala Xwedê.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da ji du ayetan hunera îqtîbasê pêk anîye. Ayeta yekemîn di Suretê Muteffîfîn da wiha derbas dibe:

¹⁴¹ يُسْقَوْنَ مِنْ رَحِيقٍ مَخْمُومٍ

“Ew ji meyekê safî û sermohirkirî têne avdan.”

Ayeta dudyan a ku hatîye îqtîbas kirin di Suretê Saffat da derbas dibe. Xwedê wiha gotîye

¹⁴² وَمَا مِنَّا إِلَّا لَهُ مَقَامٌ مَعْلُومٌ

“Nîne ji bo heryek ji me îla meqamekî kifşe jê ra heye.”

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi rêya hunera îqtîbasê insan şibandîye meya ku ji tirî çêdibe. Ji bo ku mey ji nîşaneyên tirî xelas bibe û bibe meya safî û devgirtî ku Qur'ana Pîroz wek meya sermohrkirî bi nav kirîye; pêwîst e ku gelek merheleyan da derbas bibe. Her wiha Eger kesê ku bixwaze bigihije kanîya me'rifeta Xwedê û meqamê kifşkirî ku cihê temaşakirina husn û cemala Xwedê ye. Pêwîst e ji

¹⁴¹ Muteffîfîn, 83/25.

¹⁴² Saffat, 37/164.

nişaneyên ezîfîya beşerî dur bibe ango fena bibe daku bi navê baqîbûna Xwedê hey bibe.

2.3.19. Hûnera Îqtîbasê di Dîwana Ehmedê Xanî da

2.3.20. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Ke'be da

Zimzima zemzemeya rahê "Huseynî" ji "Hicaz"

Vexwûnit "Ke'be" yê dil ta bite "Beytul Me'mur"

(Dîwan, 2014,r.108)

Bila ji Hêcazê bi zimzima meqamê Huseynî gazîyê Ke'beya dil bê kirin heya ku dil bi merîfet û ixlas bê te'mîr kirin.

Qur'ana Pîroz wî ayeta ku Seydayê Xanî di vê beyta xwe da wek hunera îqtibasê bikar anîye wiha tîne ziman:

وَالْبَيْتِ الْمَعْمُورِ¹⁴³

"Ez bi Beytu'l Me'murê sond dixwûm."

Tefsîrzan li ser vê ayetê çend nêrîn ragihandîne. Hinekan gotine navê Ke'be ye. Hinekan gotine asîmanê heftan da, di mûqabilê Ke'beya ruyê zemîn da avahîyek wek Ke'be heye ku rojê heftê hezar ferîşteyên Xwedê tewafa wî dîkin. Hinekan jî gotine meqsed jê dilê bawermedan e ku dilê xwe bi merîfet û ixlasa xwedê temîr dîkin.¹⁴⁴ Bi vî sedemê Xwedê bi dilê ku bûye Beytu'l-Me'mur sond xarîye.

Wisa xuya dike ku Xanî bi rêya hûnera îqtîbasê destnîşan dike ku heyânî dil bi merîfet û ixlasa Xwedê bê temîr kirin; hewcedar e ku bi meqamê Huseynî telqîna evîn û merîfeta Xwedê jê ra bê strandin.

2.3.21. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Yusuf Pêxember da

Ew jî bi meta'ê xwe qumaşê te dixwazit

Subhaneke len teyese mîn rewhîke'ebda

(Dîwan 2014,r.138)

¹⁴³ Tûr, 52/4.

¹⁴⁴ el-Qadî El-Beydawî, b.n.b, II,433.

Wek wê pîrejina heweskar ku dema Yusuf Pêxember li bazara firotina koleyan da dihate mezadkirin semyanê di destê pîrejinê da tenê kelafa rîs hebû bi wî kelafa rîs daxwaza Yusuf Pêxember dikir.¹⁴⁵

Xanî jî digel pertalê xwe yê kêmqîmet, telepkarê qumaşê dilovanîya te ye. Tu ji hemû kêmasîyan pak û dur î. Evd tu zemanê ji rehmeta te bêhêvî nabe.

Ev beyta Xanî îqtibas e ji ayeta ku di Suretê Yusuf da wiha derbas dibe:

يَا بَنِي آدَهْبُوا فَتَحَسَّسُوا مِنْ يُوسُفَ وَأَخِيهِ وَلَا تَبْتَئِسُوا مِنْ رُوحِ اللَّهِ إِنَّهُ لَا يَبْتَئِسُ مِنْ رُوحِ اللَّهِ إِلَّا الْقَوْمُ الْكَافِرُونَ¹⁴⁶

Kurên mino! Herin li pê şopa Yusuf û birayê wî bigerin. Ji rehma Xwedê bêhêvî nebin. Bêguman ji komela inkarmendan pê ve tu kes ji rehma Xwedê bêhêvî nabe.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da dest nişan dike ku ew li hember rehma Xwedê wek wê pîrejina ku sermayê di destê wê tenê kelefa rîs bû, lê dîsa daxwazîya kirîna Yusuf Pêxember kirîye. Xanî jî digel vê halê xwe ji rehma Xwedê tu zemanê bêhêvî nabe. Lewra ji inkarmedan pê ve tu kes ji dilovanîya wî bêhêvî nabe. Her wekê ku ayet jî îşaretê bal vê yekê dike.

2.3.22. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Melayêketan da

Etfalê melek hatin westane dibistanê

La îlme lena gotin ebcad bixwe telqînda

(Dîwan 2014,r.141)

Dema Xwedê Te'âla xwest wek xelîfeyê rûyê zemîn Âdem çêbike ji ferîşteyan pirsî û got, ez dixwazim li rûyê erde xelîfeyekî biafirînim. Ferîşteyan gotin, ew mexlûqên ku tu biafirînî wê fesadî bikin û xwînê birêjin; lêbelê em hemdê te dikin. Xwedê got tiştê ku hûn pê nizanin ez dizanim. Xwedê Te'âla Âdem hîne navê her tiştê kir. Paşî gote ferîşteyan wan navan hûn bibêjin. Ferîşte hatin wek zarokên dibistana seretayî li ber Âdem Pêxember sekinin gotin: *Xwedayê me! Ji xeynê zanîna ku te me hînkirîye tu zanîneke me tunîne.*

¹⁴⁵ Kadri Yıldırım, *Dîwan Ehmedê Xanî Külliyyatı, 4, Weş, Avesta, Stenbol, 2014, r.137.*

¹⁴⁶ Yusuf,12/87.

Ew ayeta ku Xanî di vê beyta xwe da wek hûnera îqtibasê bikar anîye di Suretê Beqereyê da wiha dibore.

قَالُوا سُبْحَانَكَ لَا عِلْمَ لَنَا إِلَّا مَا عَلَّمْتَنَا إِنَّكَ أَنْتَ الْعَلِيمُ الْحَكِيمُ¹⁴⁷

Melaîketan gotin Perwerdekarê me! Em Te ji hemû kêmasîyan pak didêrin ji tişta ku te bi me daye zanîn pê ve tu zanîna me tûnîne. Bêguman tu zanayê her tiştê yî û tu hertiştê di cihê wî da çêdikî.

Seydayê Xanî înanê wek fihrisat gerdunê dibîne û vê angaşteya xwe bi rêya îqtibasê bi ayetê piştrast dike. Lewra kemerbestebûna ferîşteyan li hember zanîna Adam pêxember ku Xwedê wî hîn kirî nîşanê wî qasê ye ku adamîzad dibaceya gerdûnê ne.

2.3.23. Îqtibasên Ayetên di Derbarê Afirandina Ademîzadan da

Wekî selsalê fexxar im ti jî nûr im ti jî na rim

Di batin şibhê xundkar im, bi zahir ketme vî şalî

(Dîwan 2014,r.173)

Her çendan bi halê zahîrî ez wek herîya hişka wekê qafîk (ku herîya di agirda hatîye pehtin û wisa heşkbûye deng jê derdikeve) teji agir u nûr xuya bikem jî, lê di eslê meselê da ez padişah im.

Ev beyta Xanî îqtibasê ji ayeta ku di Suretê Rahman da wiha derbas dibe:

خَلَقَ الْإِنْسَانَ مِنْ صَلْصَالٍ كَالْفَخَّارِ¹⁴⁸

Xwedê însan ji çamurekê hişk wek herîya qafîkan afirandîye.

Seydayê Xanî di vê beyta xwe da bi ayeta ku wek hûnera îqtibasê bikar anîye û balê dikşîne li ser şeklê afirandina însanê ku ji çemurek hişk wek herîya qafîkan hatîye afirandin. Paşî jî angaşte dike dibêje her çendan wek şiklê herîyek hişk û qemandî xuya bikem jî lê di heqîqetê ez padişah im lewra her insanek xelîfeyê rûyê zemîn e û bi nûra Xwedê hatîye teji kirin.

¹⁴⁷ Beqere, 2/32.

¹⁴⁸ Rahman, 55/14.

2.4. Hunera Îqtîbasê di Helbest û Mewluda Melayê Bateyî da

Di bin vê sernavê da ew ayet û hedîsên ku Melayê Bateyî di helbest û dîwana xwe da wek hunera îqtîbasê bi kar anîye û li gorê babetên xwe hatine kifşkirin, hatine dayîn

2.4.1. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Tewhîd û Hukimranîya Xwedê da

*Semed û heyy û mecîd î
Qurbetê “heblul werîd” î
Ehed û ferd û hemîd î
Leyîqê hemd û senay î*

(M.Bateyî,2010,r. 51)

Xwedayê min! Tu semed î ku her benderuh hewcedarê te ye. Tu hewcedarê kesê ninî. Daîm û baqî mayîn her ji bo zatê te yê, qencîkar û rumet giran î. Tu zanayê her halê evdê xwe yî. Tu ji heblû'l-werîdê nêziktirîne bendeyên xwe yî. Tu di zat û sîfatên xwe da yekî bêhevêrê û bêşerîk î. Layîqê hedm û spasîyê her tû yî.

Xwedê Te'âla Surtê Qaf da di ayeta ku Melayê Bateyî wek hunera îqtîbasa naqis bikar anîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

¹⁴⁹ وَلَقَدْ خَلَقْنَا الْإِنْسَانَ وَنَعَلْمُ مَا نُوسِسُ بِهِ نَفْسُهُ وَحَنُّ أَقْرَبُ إِلَيْهِ مِنْ حَبْلِ الْوَرِيدِ

“Sond be, bêguman me insan afirandîye û em zanayên ji wesweseya ku nefsa wî xefjê ra dibêje. Em ji şah damarîya wî nêziktirîne wî ne.”

Bateyî di vê beyta xwe da ji tewhîd û zat û sîfatên Xwedê xeber dide: Ellah Te'âla di zat û sîfat û kiryarîyên xwe da yeke bêheval û bêşerîk e û nêzik û qencîkarê bendeyên xwe ye. Zanayê dilxuşûşî nepenîyên evdên xwe ye. Paşî balê dikşîne li ser wateya ayetê ku dibêje: “Em ji şahdamarê insanê bêhtir nêziktirîne insanê ne.” Naveroka beyta xwe bi îqtibaskirina wê ayetê qewî kirîye.

*Walîyê ferz û nivêjî
Tu zû rûhan wî dirêjî
Li menil mulkû dibêjî*

¹⁴⁹ Qaf, 50/16.

Hakimê şah û geday î

(M.Bateyî,2010,r.52)

Ey Xwedayê me! Tu parêzgarê ferz û nimêjê yî, lewra meqsed ji nimêjê berdayîn û qayîlbûna serwerîya te ye. Dayîn û standina ruhan her bi destê te ye. Ey Xwedayê âlemê! Tu yî ku dema rabûna qîyametê dibêjî îro mûlk yê kî ye? Û dîsa bixwe bersiva xwe dide û dibêje, “mûlk her yê mine. Welhasil gede û padîşahî li ber hukmê te yeksan e û serwerîya sirf tenê ji bo te ye.

Melayê Bateyî, di vê beyta xwe da hunera îqtibasa ehzen bikar anîye ku di Suretê Xafir da derbas dibe. Xwedê wiha ferman kirîye:

يَوْمَ هُمْ بَارِزُونَ لَا يَخْفَىٰ عَلَى اللَّهِ مِنْهُمْ شَيْءٌ لِمَنِ الْمُلْكُ الْيَوْمَ لِلَّهِ الْوَاحِدِ الْقَهَّارِ¹⁵⁰

“ *Wê roja ku ew ji gorên xwe dertêne meydanê, tu şitekî ji wan li ber Xwedê veşartî nîne. Ellah Te’âla dê ji wan bipirse îro desthilatdarî ya kî ye. Vêca Xwedê Te’âla bi xwe bersiva xwe dide desthilatdarî yê Xweda ye ku yek e û hêzşikîn e.* ”

Bateyî di beyta xwe da behsê ji serwerîya Ellah Te’âla dike û dibêje: Ew kesên ku di dunyayê da dozgerîya desthilatdarî û zordarîyê dikin û xwe ji perestina Xwedê dewlemend dibînin wê fena bibin. Lewra desthilatdarî her ji bo wî ye. Di dawîyê da beyta xwe bi îqtîbaskirina ayetê qewî dike.

Haşa hebin ‘uzw û cesed

Tehwîlê îmkanê xired

We lem yekûn kufwen ehed

Zatê qedîm her dê hebî

(M.Bateyî, 2010,r. 65)

Haşa Xwedê ji e’za û cism û cesedan û ji guherîn û imkân û sebebên pak û berî ye. Her wisa ne di zat û sîfatên wî da ne jî di kiryarîyên wî da tu misl û hemkuf jê ra tûnîne. Zatê Xwedê qedîm e û ew dê her hebe.

Seydayê Bateyî ji Suretê Ixlasê, bi ayeta çaran iqtibasa tam bikar anîye.

وَلَمْ يَكُنْ لَهُ كُفُوًا أَحَدٌ¹⁵¹

¹⁵⁰ Xafir, 40/16.

“Tu himkuf hemta jê ra nînin.”

Bateyî di vê beyta xwe da bi hunera îqtîbasê balê dikşîne li ser tewhîd û sîfatên Xwedê. Ew xwedayê ku afirînerê gerdûnê ye û ji hemû kêmasîyan pak û durre.

Mulkîyyeta lewh û qelem

Tehtessera û ‘erş û hem

Bal ve xudanî dikey hekem

Bexşendeyê her mensebî

(M.Bateyî, 2010,r.67)

Ey Xwedayê me! Tu yî xwedan û hâkimê lewh ûl mehfuzê û qelem û erş û tehtessera. Rehmet û dilovanîya te temamê meqaman dopêç kirîye

Melayê Bateyî di vê beyta xwe da hunera îqtîbasê ji ayeta ku di Suretê Taha da derbas dibe wergirtîye.

لَهُ مَا فِي السَّمَوَاتِ وَمَا فِي الْأَرْضِ وَمَا بَيْنَهُمَا وَمَا تَحْتَ الثَّرَى¹⁵²

“Her çi tiştê ku di erd û asîmanan da heye û çiqas têştên ku di navbera wanda hene û yê bin erde yê hemû yê Xwedê ne.”

Melayê Bateyî di vê beyta xweda balê dikşîne li ser çar têgehên ku lewh û qelem û tehtessera û erş e. Li ser van têgehên âlimê tefsîr û kelimê, bi rengekî berfireh dabaş kirine. Di Qur’ana pîroz da ev têgehên ha wek sembolên ilm û serwerî û desthilatdarîya Xwedê tîsîr kirin. Bawerîya bi wan ferz e lê esehîya wan her Xwedê dizane.

Bexşendê her ecram û e’rş

Anî zuhûrê mulkê fers

Summestewa balayê erş

Mîrê ezel tuy ya Rebî!

(M.Bateyî, 2010,r.67)

¹⁵¹ Îxlas, 112/4.

¹⁵² Taha, 20/6.

Ey Xwedayê me, ku ezel û ebed her yek in. Te bi dilovanîya xwe erd û esman û temamê cismên asîmanî afirand. Piştra te bi halekî layîqê xwe li ser erşê istiwa kir.

Hunera îqtîbasa di vê beyta Melayê Bateyî da ji ayeta ku behsa istîwayê dike hatîye hilgirtin. Di Qur'anê di çend cîyan da derbas dibe. Emê tenê ayeta ku di Suretê Eraf da derbas dibe neqil bikin.

إِنَّ رَبَّكُمُ اللَّهُ الَّذِي خَلَقَ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضَ فِي سِتَّةِ أَيَّامٍ ثُمَّ اسْتَوَىٰ عَلَى الْعَرْشِ يُغْشِي اللَّيْلَ النَّهَارَ يَطْلُبُهُ حَثِيثًا وَالشَّمْسَ وَالْقَمَرَ وَالنُّجُومَ
مُسَخَّرَاتٍ بِأَمْرِهِ أَلَا لَهُ الْخَلْقُ وَالْأَمْرُ تَبَارَكَ اللَّهُ رَبُّ الْعَالَمِينَ¹⁵³

“Bi rasti Xwedayê we Ellah Te’âla ye, ku erd u esman di şeş rojan da afirandîye. Paşî bi awayekî layîqê xwe li ser erşê istiwa kir. Ew Xwedayê we ye ku rojê bi şeve dide tarîkirin û roj bilez li pê şevê digere. Ew Xwedayê we ye ku roj û heyv û stêrk li ber fermna xwe xizmetkar afirandin. Hişyarbin afirandin û ferman kirin bi deste wî ne. Ellah Te’âla(bi zatê xwe) pîrozdeyî ye. Perwerdekarê hemu alemê ye.”

Di vir da bi hunera îqtîbasê Melayê Bateyî balê dikşîne li ser Tewhîd û qudret û ilmê Xwedê Te’âla. Lewra ye ku bi pîvan û di hev ahengîyeke bê hemta da erd û asîman û pergala zivirîna rojê afirandîye. Her ewe serwer û zanayê her tiştê.

2.4.2. Îqtîbasên Ayet û Hadîsên di Derbarê Dilovanî û Bexîşkarîya Xwedê da

La hewle la quwwete

İlla bîllahîl ‘ezîm

La seyre la seknete

İlla bîke ya ‘Elîm.

(M.Bateyî, 2010,r. 75)

Quwwet û qudret tenê xasê Xwedê ye. Bêdestur bêalîkarîya wî nîne ji kesê ra hewl û quwwet. Ya Xwedayê ku zanayê hemû tiştê! Seyr û sulûk, rawestîna û sekinîn her bi te ye. Yanê eger quwwet û qudreta Xwedayê Te’âla nebe; evd ne dikare xwe ji şerê biparêze ne jî dikare qencîkarî bike.

¹⁵³ Eraf, 7/54.

Melayê Batayî ev beyta xwe bi ‘erebî ristîye û îqtibas ji hedîsa Pêxember kirîye.

عن أبي ذر الغفاري: أوصاني خليلي بسبع: بحُبِّ المساكين، وأن أدنوَ منهم، وأن أنظرَ إلى من هو أسفلَ مني، ولا أنظرَ إلى من هو فوقِي، وأن أصِلَ رَجَمِي وإن جفاني، وأن أكثِرَ من قولٍ لا حولَ ولا قُوَّةَ إلا بالله وأن أتكلَّمَ بمُرِّ الحَقِّ، وأن لا تأخذَنِي بالله لومةٍ لائمٍ، وأن لا أسألَ الناسَ شيئاً¹⁵⁴

Ebû Zer (r.x) got: “Dostê min Resûlullah (s.l.x) tewsîya heft tiştan li min kir.

Hezkirin û nêzikbûna min ji bo feqîr û belengazan

Ez li kesên ji xwe xar mezê bikim, ne ku li ji xwe joran bi nêrim

Serdana li eqreba û lêzimên xwe bikim her çiqas neheqî li min bikin jî.

Pir gotina la hewle wela quwwe te illa billah

Her çiqas tehil be jî heq xeberdem

Di rêya Xwedê da guh nedeme loma lewmekaran

Recûkarîyê ji insanan nekim.”

Bi xakê pakê Yesrîb

Bi bangê subh û mexrîb

*Bi sucdeya **Weqterib***

Bi lewh û ‘erşê ‘ezîm

Batey tu bikî bê xem

Digel sirra xwe merhem

Wexfir li zen bî wer hem

Entel Xefûr-ur Rehîm

(M.Bateyî, 2010, r.80)

Xwedayê me! Tu bi paqijîya wergeha Muhemmed Pêxember bikî ku Medîna Munewer e! Bi xatirê banga sibê u êvarê bikî! Bi ayeta “Wescud Weqterib” û bi

¹⁵⁴ Nureddin ‘Elî bin Ebubekir el-Heysemî, *Mecma’u z-Zewaîd we Menbe’ul Fewaîd*, I-X, Darûl-Kîtabil-‘Erebî, Beyrut, b.d, VII, r 265.

qedrê Lewhu'l-mehfuz u erşê ezîm bikî! Tu bi sira mezinahîya xwe bikî! Ji dilê Batey derd û xeman derînî. Tu bi rehmdêrîya xwe gunehê min bibexşîne. Lewra Tu dilovan û bexşende yî.

Di beyta ewil da hunera îqtîbasê ji ayeta ku di Suretê 'Eleq da derbas dibe hatîye girtin. Xwedê wiha ferman kirîye:

كَلَّا لَا تُطِغُهُ وَاسْجُدْ وَاقْتَرِبْ¹⁵⁵

“Nebî tu îta 'eta wî bikî, xwarî secdeyê bibe û nêzikê Xwedê be.”

Di beyta duduyan da hunera îqtîbasê ji hedîsê wergirtîye.

عن أبي بكر الصديق: أَنَّهُ قَالَ لِرَسُولِ اللَّهِ: عَلَّمَنِي دُعَاءَ أَدْعُو بِهِ فِي صَلَاتِي قَالَ: قُلْ: اللَّهُمَّ إِنِّي ظَلَمْتُ نَفْسِي ظُلْمًا كَثِيرًا وَلَا يَغْفِرُ الذُّنُوبَ إِلَّا أَنْتَ، فَاغْفِرْ لِي مَغْفِرَةً مِنْ عِنْدِكَ وَارْحَمْنِي إِنَّكَ أَنْتَ الْعَفُورُ الرَّحِيمُ¹⁵⁶

“Ji Ebubekir (r.x.l) hatîye ragihandin ku gotîye: Ey Qasidê Xwedê! Duayekê hînê min bike da ku ez di nimêjên xwe da bi wî dû'a bikim. Pêxember got: Bibêje Ya Rebbî! Min li nefsa xwe pir zilm kirîye. Yê gunehan bibexşîne her tu yî. Tu li ba xwe li mi rehme bike: Bêguman tu bexşende û dilovîn î.”

2.4.3. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Ewsafên Muhammed Pêxember da

Ey ne'tê tu ez erşî heta ferşî şehîra

Ez pertewê nura te cîhangeşt munîra

Ey seyyidê âlem bike perwayê esîra

Ey tacê serê şah û selatîn û emîra

Qed kane lekel fedlû lekel cudu kesîra

Ursil te îlel xelqê beşîran we nezîra

(M.Bateyî, 2010,r.83)

Ey Qasidê Xwedê! Wesf û sifâtên te ji asîmanan bigire heya erdê bi nav û deng bûye. Dunya hemû ji ber nûra risaleta te geş û rohnîdar bûye. Ey pêşewayê cîhanê û taca sere mîr û padişahan î, halê kesên ku ji ber evîna nûra te esîr û dîl mane

¹⁵⁵ 'Eleq, 96/19.

¹⁵⁶ el-Buxarî Ebu 'Ebdullah Muhammed b. Îsmail, *Sahîh û Buxarî*, Daru İbnû Kesîr Beyrut, 2002, I, r.834.

bipirse. Yanê roja heşr û mîzanê bibe mehderwanê wan kesên ku di peyrewîya rêya evîna te dîlgirtî û esîr mane. Xwedê gelek ihsan û kerem ji bo te kirine. Xwedê Te'âla, te ji bo mirovahîyê wek mizgîndêr û hişyarker şandîye.

Hunera îqtîbasê di vê beyta Bateyî da di çend ayetan da derbas dibe. Lêbelê ji bo ku tekrar çênebe tenê emê ayeta ku di Suretê Sebe da derbas dibe neqil bikin.

وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا كَافَّةً لِلنَّاسِ بَشِيرًا وَنَذِيرًا وَلَكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لَا يَعْلَمُونَ¹⁵⁷

“*Me tu ji temamê mirovan ra tenê (ji bo bawermendan ra) mizgîndêr û ji bo kafiran ra jî hişyarker şandîye. Lêbelê pirê insanan vê rastîyê nizanin.*”

Seydayê Bateyî di bin ronahîya îqtîbasa vê ayetê da balê dikşîne li ser rastîya risaleta Muhammed Pêxember. Yek ji wesfên wî mizgîndêrîya ji bo peyrewên wî ye. Wesfê duduyan jî hêşyarkerîya ji bo reqîbên wî ye. Bateyî her wekê wiha dibêje, em di rêya evîna te da dîl û esîr in. Hêvîya me ewe ku tu roja qîyametê li dîwana Xwedê mehdervanîya me bike da ku em mezherê mizgîndayîna te bibin.

Melek hatin bi te'cîlî

Du şeqkir sîne cibrîl

Elem neşreh tê tenzîlê

Dikit tewzîh û tibyanê

(M.Bateyî, 2010,88)

Dema ku Muhammed Pêxember hêj piçuk li bal dayîna xwe Helîma Se'dîye bû. Ferîşte bi lezgînî ji asîmanan hatin xar û Melekê Cebraîl dilê wî qelaşt û paqij kir. Xwedê Te'âla Suretê Elemneşrehê berjêr dike û bi aweyê zelal beyena vê mesela şeqkirina singê seyyîdê alemê dike.

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da ji Suretê Inşîrahê îqtîbas kirîye:

أَمْ نَشْرَحُ لَكَ صَدْرَكَ وَوَضَعْنَا عَنكَ وِزْرَكَ الَّذِي أَنقَضَ ظَهْرَكَ وَرَفَعْنَا لَكَ ذِكْرَكَ¹⁵⁸

“*Ma qey me singê te ji bo te venekir û fireh nekir. Ma me barê te yê giran ku pişta te xwehr kirbû ranekir. Ma me navê te li bal Xwedê bilind nekirîye?*”

¹⁵⁷ Sebe, 34/28.

¹⁵⁸ Inşîrah, 94/1-4.

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da bi rêya hunera îqtîbasê bala xwînerên xwe dikşîne li ser Tefsîra Suretê Inşîrah ku Xwedê di wir da behsa dil vekirina Pêxember ji bo qebl kirina wehya Xwedê dike.

Xudanê textê lewlake

Suwarê heft-i eflake

Li erşî merkeza xakê

Ji bo wî hate kêşanê

(M.Bateyî, 2010,r. 88)

Muhammed Pêxember sultanê kursî û meqamê lewlakê ye. Xwedê derheqê wî da wiha gotîye: “*Ger tu nebûya min erş û ferş ava nedikir*”. Her wiha Xwedê Te’âla di şeva mi’racê bi suwarîya buraqê pêxember bilindê heft tebeqe asîmanan kirîye. Xwedê Te’âla jibo xatirê wî bi awayek manewî erş bi ferşê giredaye.

Seydayê Bateyî mînanê Xanî û Cizîrî hedîsa “Lewlake” yê îqtibas kirîye. Metn û şîrova wî hedîsê di rupelên berfîyê da derbas bûye.

Çi xulxul hate ez xebra

Seydayê gunbada xedra

Ke Subhanellezî esra

Ji Qutsê çûye dîwanê

(M.Bateyî, 2010,r. 91)

Ey Seydayê xwedîyê gunbada kesk! Çi bangekî mezin bû ku ji ilmê xeybê hat û tu mezherê wî mucîzeyaya ku Xwedayê pakê ji hemû kêmasîyan di şevê da ji Qutsê tu birfî dîwana xwe û gelek ayetên ku her Xwedê pê dizane nîşanê te kir.

Ev beyta Seydayê Bateyî îqtîbasa ji ayeta ku behsa miracê dike. Xwedê wiha ferman kirîye:

سُبْحَانَ الَّذِي أَسْرَى بِعَبْدِهِ لَيْلًا مِنَ الْمَسْجِدِ الْحَرَامِ إِلَى الْمَسْجِدِ الْأَقْصَى الَّذِي بَارَكْنَا حَوْلَهُ لِنُرِيَهُ مِنْ آيَاتِنَا إِنَّهُ هُوَ السَّمِيعُ الْبَصِيرُ¹⁵⁹

¹⁵⁹ İsra, 17/1.

“ Ew Xwedayê ku evdê xwe Muhammed Pêxember di şevê da ji Mescîdu’l Hiramê bire Mescîd’ul Eqsayê ku me hawirdorê wê pîroz kirîye, da ku em hinek mucîzeyên xwe nîşanê wî bidin. Ew Xweda ji her kêmasîyan pak û bilind e. Bi rastî Ellah Te’âla her tiştê dibihîse û her tiştê dibîne.”

Bateyî bi rêya hunera îqtîbasê behsa şeva mîracê dike. Lewra yek ji mucîzeyên Muhammed Pêxember jî ew e ku di şeva mîracê, Xwedê ji Mekkeyê ew birîye Qudsê û lê wê jî birîye Sidretu’l-mûntehayê û mezherê gelek ayetên xeybî kirîye. Paşî vegerandîye Mekkeyê hêj sibe nebûye.¹⁶⁰

2.4.4. Îqtîbasên Ayetên di Derbarê Fetha Mekkeyê da

Pertewa şem’a cemalê min disojit dem bi dem

Iştîyaqa zulf û xalê têk kirin deryayê xem

Mame ber penca firaqê weslê qet nakit kerem

Ma medet kare me bit *Înna Fetejna* subh û dem

Wer ne sotim ateşê dil şehriyara min nehat

(M.Bateyî 2010,r. 111)

Şewqa delalîya dildarê wek muma ku agir pêketî gav bi gav min dişewitîne. Bêrî kirina zulf û xalên dildarê min noqê behra xeman dike. Lê bele ez çibikim ku ez di nêv pencê veqetîna ji yarê da neçar mame û yar jî deryê kerema weslê ji min ra venake. Gelo dibe ku Suretê Inna Fetejna di sehera sibê were hawara me û deryê kerema wêsalê ji me ra veke. Eger ne wisa be agirê dil, ez şewitandim û yara min ê sifatsah jî nehat.

Seydayê Bateyî wek Melayê Cizîrî îqtîbasa ayeta Inna Fetejnayê kirîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

إِنَّا فَتَحْنَا لَكَ فَتْحًا مُّبِينًا¹⁶¹

“Bi rastî me ji bo te bi awayek vekirî rêya girtina Fetha Mekkeyê vekirîye.”

¹⁶⁰ eş-Şeyx Muhemmed Xwûderî, *Nûrul yeqîn Fî sûretê Seyyid ul Mûrselîn*, Darûl Merîfe, Beyrût, b.d,r 54.

¹⁶¹ Feth:, 8/1.

Bateyî di di vê beyta xwe da bi hunera îqtîbaskirinê wiha hêvî û dû'a dike: Çewa Xwedê Te'âla bi mizgînîya daketina vê Sureyê xewn û îştîyaqa Muhemmed Pêxember û sehabîyên wî pêkanî û ji wan ra derfîyê Fetha Mekkehê vekir, her wisa tu bi sirra vê Suretê derfîyê ghiştina meşuqê ji min ra vekî da ku ez ji derfîyê xem û şewitîna agirê veqetîne xilas bibim.

2.4.5. Îqtîbasa Ayetê di Derbarê Jina Ebû Leheb da

Hûn bejine munzeyyiran

Ey meclîsa yar û biran

Bateyî kusa çît leşkeran

Fî cîdî heblûn mîn mesed

(M.Bateyî, 2010,r.118)

Ey civata dost û biran! Hûn bêjine wan kesên ku xelkê hişyardikin deka ezê çewa biçime wî eskerîya ku di stûyê wan da werîsekî mîna wê werîsa ku di gerdana ezingkêşa jina Ebu Leheb da heye.

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da ji Suretê Mesed da hunera iqtîbasê hilgirtîye.

162 وَأَمْرًاؤُهُ حَمَّالَةَ الْحَطَبِ فِي جِيدِهَا حَنْثَلٌ مِنْ مَسَدٍ

Dema ku jina Ebû Leheb dikeve dojhê di gerdana wê da werîsek fitîlandî ji heye.

Dema ku meriv li vê beyta Bateyî bi nêrînek kûr dimêzîne, meriv dikare bibêje ku Bateyî di ilmê rewanbêjîyê da xweş mahir e. Lewra beyta xwe bi hunera îqtîbasê ji pertewa rewanbêjîya di ayetê da çirisandîye. Wisa xuya dike ku Bateyî cefadêrîya eskerên ku di beyta xwe da jê xebirdayî, şibandîye cefadêrîya jina Ebu Leheb ku jinek tevdêrkerbû û ezyedêrê Resulê Xwedê bû. Di her firsetê da bi werîsên ji lîfên xurman darên istîrî dikêşa li ser rêya wî. Yanê çewa ew jinika di dinyayê da bi werîsa xwe yê ku pê tehdeyî dikir, Xwedê Te'âla wê werîsê wek gerdanekê li stuyê wê fitilandî tavêje dojhê. Wê halê leşkerên ku tehdeyê dikin wek wê be.

2.4.6. Îqtîbasên Ayetên di Debarê Rêya Hîdayetê da

¹⁶² Mesed, 111/4-5.

Hêvîdar î n em ji te şahê kerîm

Îhdîna ya Reb sîrat-el musteqîm

(M.Bateyî, 2010,r.176)

Ey Xwedayê me yê kerîm û dilovan! Em hêvî dîkin ku tu me ji rê şaşîyan biparêzî û me hidayetê rêya rast bikî ku rêya Qur'an û sunnetê Pêxember e.

Ev beyt îqtibasê ji ayeta ku di Suretê Fatîheyê da derbas dibe. Xwedê Te'âla wiha ferman kirîye:

اٰهْدِنَا الصِّرَاطَ الْمُسْتَقِيْمَ¹⁶³

“Rêya rast nîşanê me bide.”

Bateyî di vê beyta xwe da hunera îqtîbasa tam bikar anîye. Hikmet jî vê îqtibasê ew e ku bala xwînerên xwe dikşîne li ser ayetên ku Xwedê Te'âla evdên xwe bi wan ayetan hîne duayê dike.

2.4.7. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Âdem Pêxember da

Ji sirra neqşê subbûhî

Mu'eyyen tête te'limê

Ji şeklê Âdem û Nuhî

Çi bejim husne teqwîmê

Nefextû fihî mîn rûhî

Beîde bête tefhîmê

(M.Bateyî, 2010, r. 165)

Ew Xwedayê ku ji hemû kêmasîyan pak û berî, bi ferîşteyên xwe sirra afirandina Âdem Pêxember da hînkirin. Xwedê Te'âla husna sûret û sîreta Âdem wisa delal û xweş neqîşandîye ku ji bo wî wiha gotîye: Min ji ruhê xwe can da Âdem. Lêbelê e'qil di fêmkirina wî neqîşandinê da kêr dimîne

¹⁶³ Fatîhe, 1/6.

Di vê beytê da Bateyî bi hevoka “Nefextû fihî mîn rûhî” hunera îqtîbasa tam bi kar anîye ku di Suretê Hicr da derbas dibe. Xwedê Te’âla wiha ferman dike:

فَإِذَا سَوَّيْتُهُ وَنَفَخْتُ فِيهِ مِنْ رُوحِي فَقَعُوا لَهُ سَاجِدِينَ¹⁶⁴

“Dema ku min şiklê wî(Âdem) çekir û ji canê xwe can pişkire bedena wî. Êdî hûn ferîşte jê ra secda rêzdarîyê bibin.”

Melayê Bateyî di vê beyta xwe da bi rêya iqtîbasê qedr û şerafa ademîzadan dîyar dike. Lewra sirra di çêkirina Âdem ji herîyê ew e ku Xwedê Te’âla ji canê xwe can daye bedena wî bi vî awayê, qedir giranîya wî bi ferîşteyan dide hîn kirin.

Îhbîtû minha cemî’en hate emr

Adema dê bêteve lêkin bi sebr.

(M.Bateyî, 2010, r. 187)

Dema ku Âdem û Hewa bi weswesa şeytanê ji dara qedexekirî xwarin, Xwedê Te’âla ferman kir ku berjêrê li ser rûyê erdê bibin.

Bateyî di vê beyta xwe da ji ayetekî ku di Suretê Beqere da derbas dibe wek hunera îqtîbasê bi kar anîye. Xwedê Te’âla wiha ferman kirîye:

فَلَمَّا أَهْبَطُوا مِنْهَا جَمِيعًا فَإِمَّا يَأْتِيَنَّكُمْ مِنِّي هُدًى فَمَنْ تَبِعَ هُدَايَ فَلَا خَوْفٌ عَلَيْهِمْ وَلَا هُمْ يَحْزَنُونَ¹⁶⁵

“Me got: Hûn hemû ji bihuştê peyayê rûyê erdê bibin. Eger ji ba min ji we ra rêyek rast were, çi kesê bibe peyrewê wî rêya min ê rast, êdî li ser wan tu tirs tune û ew xemgîn jî nabin.”

Bateyî di vê beyta xwe da bi rêya hunera iqtîbasê serpêhatîya Âdem Pêxember bi weyha Qur’ana Pîroz piştrast dike.

Pir girî û xweş girî bê hed gelek

Newheyê inna zelemna çû felek

(M.Bateyî, 2010,r.186)

¹⁶⁴ Hicr, 15/29.

¹⁶⁵ Beqere, 2/38.

Piştê ku ji bihuştê peyayê erdê bûn Ji ber bê emirîya Xwedê di gavê da poşman bûn. Ji Xwedê lava kirin ku wan bibexşîne êdî li ser poşmaniya xwe bê hed û hesab girîn heta ku dengê hawara wan “*Me li xwe zilm kirîye*” gihîşte ersê ezîm.

Hunera iqtîbasa di vê beytê ji ayeta ku di Suretê E’raf da derbas bûye hatîye girtîne ku Xwedê Te’âla wiha tîne zimên:

قَالَ رَبَّنَا ظَلَمْنَا أَنفُسَنَا وَإِن لَّمْ تَغْفِرْ لَنَا وَتَرْحَمْنَا لَنَكُونَنَّ مِنَ الْخَاسِرِينَ¹⁶⁶

Âdem û Hawa gotin Xwedayê me! Me zilm li nefsa xwe kir. Eger tu me nebexşînî û li me rehmê nekî teqez emê bibin ji zîyankeran.

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da pêşî qonaxa serpêhatiya poşmaniya Âdem û Hawa tîne ziman paşî jî bi rêya hunera iqtibasê ku dibêje: “Ey xwedayê me! Me li xwe neheqî kir” delil û nişan tewbekirina wan destnîşan dike.

Ummeta Ehmed nivîsî ehle nûr

Ummet’un muznîbet’un Rebb’un xefûr.

(M.Bateyî 2010,r.183)

2.4.8. Îqtîbasên Ayet û Hedîsên di Derbarê Mucîzeyên Pêxember da

Xwedê Te’âla bi Qelemê daye nivîsandin ku Ummeta Muhammed Pêxember ehlê nûrê û ummetek zêde gunehkare û Xwedê Te’âla jî perwerdekarekî bexşîner e.

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da hunera iqtîbasa temam bi kar anîye ku di hedîsekî ji Pêxember hatîye ragihandin da wiha derbas dibe:

عن أنس بن مالك: دخلت الجنة، فرأيت في عارضتي الجنة مكتوباً ثلاثة أسطر بالذهب: السطر الأول لا إله إلا الله محمد رسول الله،

والسطر الثاني ما قدمنا وجدنا، وما أكلنا رجماً، وما خلّفنا حسبرنا، والسطر الثالث أمة مذنبّة وربّ غفور¹⁶⁷

“Ez ketim bihuştê min dît ku li ser serdara du derîyên bihuştê sê rêzên zêrîn nivîsandîye:

Rêzaya yekî: Ji xeynê Xwedê nîne tu îlah û Muhammed Qasidê wî ye.

¹⁶⁶ E’raf, 7/23.

¹⁶⁷ el-Elbanî Muhammed Nasiruddin, *Daîf’ul Cami’is-sexir we zîyadetihî*, Mektebetul- İslamîyye, r.435, 2962.

Rêza dudyan: Tişta ku me di pêşîya xwe da şandî me dît, tişta ku me xwarî ji me ra sud maye. Tişta ku me li pê xwe heştî me zîrar kir.

Rêza sisyan: Ummet gunehkare û Xwedê bexîşkar e.”

Bateyî di vî derê da bi rêya hunera iqtîbasat tam destnîşan dike ku çewa Muhammed Pêxember qenctîrînê embîyan e. Her wisa ummeta wî jî her çendan gunehkarbin jî lê qenctîrînê ummetan e.

Ehmeda çavête ma zaxel beser

Yek îşarata te înşeqqel qemer

(M.Bateyî, 2010, 232)

Ey Resulê Xwedê! Dema ku Xwedê Te'âla di alema melekûtê da şeva mîracê nûra xwe yan jî nîşanên pir bi sosret nîşanê te da, di halê da çavên te rast û çep meyil neda, her wiha dema te ji Rebbê xwe xwest ku li hember inkarmendan mucîzeyek bide te û bi yek îşareta te Xwedayê te heyîv du ker kir.

Melayê Bateyî di vê beyta xwe da bi du ayetan hunera iqtîbasê bi kar anîye. Xwedê wiha ferman kirîye:

¹⁶⁸ مَا زَاغَ الْبَصَرُ وَمَا طَغَى

“ Çavên Muhemmed Pêxember (rast û çep) meyil nedaye û ji (ya dîtî) derbas nebûye.”

¹⁶⁹ افْتَرَبَتِ السَّاعَةُ وَانْشَقَّ الْقَمَرُ

“ Qiyamet nêzik bûye û heyîv bûye du şeq.”

Bateyî di beyta xwe da bi rêya hunera iqtîbasa ji van herdu ayetên li jor balê dikşîne li ser mucîzeyên Pêxember

Ateşê Musa çibû? Ruxsarê tu

Weduha nura dilê hişyarê tu

Herdu âlem çî? Siha iqbalê tu

¹⁶⁸ Necm, 53/17.

¹⁶⁹ Qemer, 54/1.

Sondê weleylê bi zulfû xalê tu

(M.Bateyî, 2010, 232)

Ey Resulê Xwedê! Ew agirê ku Nebî Musa li Turê Sînayê dîtibû, ew ne agir bû belkû nûra rûyê te bû. Her wiha ew sonda ku Xwedê Te'âla bi ayeta "Wedduha"yê xwarîye ne ku meqsed jê dema dana sibê ye. Lewra armanc jê nûra dilê te ye ku hişyar e. Herdu cîhan ku dunya û axirete ji bilê siha berdayîna te pê ve tişteki din nîne. Her wiha sonda ku Xwedê Te'âla bi ayeta "weleylê" xwarîye armanc pê şev nîne belkû meqsed zulf û xalê rûyê te ne.

Melayê Bateyî di van herdu beytên xwe da ji Suretê Duha du ayet iqtîbas kirîne:

170 وَالضُّحَىٰ , وَاللَّيْلِ إِذَا سَجَىٰ

"Ez sond dixwûm bi dema sibê ku roj xuya dibe û bi şeva dema tarî dibe."

Bateyî hunera iqtîbasê di wateyeka mecazî da bi kar anîye. Lewra herdu ayetên ku iqtîbas kirîye ji wateya wanê bingehîn derxistîye û di wateyek din da bi kar anîye. Bateyî angaşte dike ku armanc ji weduhayê ne dema sibê ye belkû nûra heqîqeta Muhammedî ye her wiha armanc ji ayeta welleylê ne şeva tarî ye belkû zulf û xalê rûyê Muhammed Pêxember e.

Ma remeyte îz remeyte gûşîdar

Deste wî destê Xwedê der kar û bar

(M.Bateyî, 2010,r.177)

Ey guhdêr! Xwedê Te'âla got: Ey Muhemmed! Dema ku te bi destê xwe xwelî avête li ser çavên kafiran, di heqîqetê da Xwedê ew xwelî gihiştande kafiran. Destê Pêxember bi qudret û hêzdarîya Xwedê kar dike.

Bateyî di vê beyta xwe da hunera iqtîbasê ji vê ayeta Suretê Enfalê wergirtîye.

171 فَلَمْ تَقْتُلُوهُمْ وَلَكِنَّ اللَّهَ قَتَلَهُمْ وَمَا رَمَيْتَ إِذْ رَمَيْتَ وَلَكِنَّ اللَّهَ رَمَىٰ وَلِيُبْلِيَ الْمُؤْمِنِينَ مِنْهُ بَلَاءً حَسَنًا إِنَّ اللَّهَ سَمِيعٌ عَلِيمٌ

¹⁷⁰ Duha, 93/1-2.

¹⁷¹ Enfal, 8/17.

“We kâfir nekiştin. Lê di heqîqetê da Xwedê ew kuştin.(Hem Ya Muhemmed!) Dema ku te xwelî avête li ser çavên kafîran, te neavêt. Lê di eslê xwe da Xwedê avête wan. Xwedê wisa kir daku bawermendan bi awayekî qenc biceribîne. Bi rastî Xwedê her tiştê seh dike û baş dizane.”

Seydayê Bateyî di vê beyta xwe da bi hunera îqtibasê balê dikşîne li ser peyama ku di ayetê da veşartîye. Yanê ayet destnişan dike ku çi qas serfirazî û sernizmî çêbin bêguman bi vîna Xwedê çêdibin.

ENCAM

Me di vê xebata xwe da li ser çar berhemên şairên ku wek dîwarên Edebîyata Kurdî ya Klasîk hatine qebl dêran vekolîn kirîye. Ji van âlim û edîban yek Melayê Cizîrî ye ku di Edebiyat a Kurdî ya Klasîk da yekem car e ku dîwaneke muretteb nivîsandîye. Yê duyem Feqîyê Teyran e ku wek temsîlkarê edebiyat gelêrî hatîye pejirandin. Yê sêyem Ehmedê Xanî ye ku di edebiyata kurdî da yekem kes e ku bi awayek rêk û pêk mesnewîyek bi navê Mem û Zîn nivîsandîye. Yê çarem Melayê Bateyî ye ku di edebiyata Kurdî da yekem Mewlîdname nivîsîye.

Heta niha gele xebat li ser berhemên hatine kirin. Hêj divê ku gelek xebat jî bêne kirin Mijara ku em li ser xebitîne hunera îqtibasê ye.

Her şairek an jî nivîsarek ilhama xwe ji çavkanîyekê digire li gorê wê çavkanîyê helbest û nivîsên xwe dişekilîne û naveroka berhemên xwe bi unsurên wê qewî dike an jî dixemilîne. Li ser vê bingehê ji encama vê vekolîna ma tête zanîn ku çavkanîyên îlhamgirtina Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran û Melayê Bateyî medresa Qur'an û sunetê ye.

Di berhemên van edîban da şewqa tesîra Qur'an û hedîsê bi wasîte an jî bêwasîte bi awayek zelal xuye dike. Lewra di diwan û helbestên xwe da çewa ji ayetê îqtîbas kirine her wisa ji te'bîrên fiqhê û tesewîfê bigre heya bêwijên kelam û tefsîrê jî bi kar anîne. Di gelek beytên xwe da bêjeyên ilmên kelamê di serî da navê Xwedê wek *Ellah, Xeffar, Wahid, Ehed Wedud, Cebbar, Fatir Xaliq, Heq Metlub...* hwd derbas dibe. Tebîrên ilmê tefsîrê wek Qur'an, Furqan, tenzîl, ayet û navên Suretên Qur'anê wek Fatihe Yasîn, Mishef, Taha, Enam û Re'd û Feth û Hamîm derbas dibe Her wisa di gelek beytên xwe da tebîrên fiqhî wek hec, zekât, selem... hwd bi kar anîne.

Di vê tabloyê da hejmara ayet û hedîsên ku hatine îqtîbaskirî hatîye dayîn. Kîjan helebestvanê çiqas ayet û hedîs wek hunera îqtîbasê bi kar anîye di vê tabloya jêr da hatîye dayîn.

Helbestvan	Îqtîbasên Ayetê	Îqtîbasên Hedîsan
Melayê Cîzîrî	29	4
Feqîyê Teyran	6	---
Ehmedê Xanî	22	6
Melayê Bateyî	17	5

Her wekê ku ji tabloyê tê zanîn bi tevahî 74 ayet 15 jî hedîs hatine îqtîbas kirin. Ev nîşanê wî qasê ye ku yek ji serkanîya Edebîyata Klasîk ya Kurdî ayet û hedîs in. Yê ku herî zehf ji Qur'anê îqtîbas kirîye Melayê Cîzîrî ye. Piştê wî Ehmedê Xanî ye Di rêza sêyemîn da Melayê Bateyî heye. Li gorî wan yê herê kêma îqtîbas kirîye Feqîyê Teyran e.

Ayetên ku herî zêde hatine îqtîbaskirin ayetên derbarê tewhîda Xwedê da ne. Di îqtîbaskirina hedîsan da hedîsa ku herî zêde hatîye îqtîbas kirin hedîsa “kuntu

kenzen” û hedîsa “Lewlake”yê ye ku yek wehdet’ûl wucudê sembolize dike yê dî jî heqîqeta Ehmedîyeyê destnîşan dike.

Lê belê piranîya wan hedîsên ku dî dîwan û helbestên xwe da îqtîbas kirine li gorê pîvanên ilmê hedîsê yan mewdu’ in yan jî ze’îf in. Wi demê pirsekî wiha bête kirin gelo çima wan ew hedîsên zeîf an jî mewdu’ îqtîbas kirine? Li gorê qin’eta min ji bo ku ehlê tesewifê ji elfazan zêdetir li deryayê me’anîyan mêze dikin û difikirin, lewra jî temaşa pîvanên muheddîsan nekirine.

Her çendan di ilmê rewanbêjîyê da tê gotin ku şair ji bo peyvên helbesta xwe bixemilîne hunera îqtîbasê bi kar tîne, lêbelê em di vê vekolîna xwe da gihîştine vê qin’etê ku pênasekirina hunera îqtîbasê tenê ji bo xemilandina rûyê peyvên helbestê kêr dimîne. Lewra dema ku Pêxemberê me (s.x.l) di roja herba Xeyberê di xeberdana xwe da ji Qur’anê îqtîbas hilgirtîye ne tenê ji bo xemilandina peyvên xwe bi kar anîye. Zêdetirîn ji bo ku dijminên xwe bitirsîne û îşaretê destegîrîya Xwedê ji bo bawermendan û dilsozîya xwe yê bi Xwedê diyar bike.

Eger ku em bêne li ser pîrsa ka gelo armanc û hikmeta van şairên me ku di berhem û dîwanên xwe da ayet û hedîs wek hunera îqtîbasê bi kar anîne çî ye? Em dikarin wekê bersiva vê pîrsê bi çend xalan armanc û hikmeta îqtîbaskirina ayet û hedîsan binirxînin.

- 1- Şair ji bo ku di zat û sîfatên Xwedê da sirê tewhîdê eşkere bikin û dilsozîya xwe yê ji bo Xwedê diyar bikin di helbestên wek tewhîd, mûnace’et û ne’tan da ayet û hedîs îqtîbas kirine.
- 2- Şair ji bo ku fikr û meşrebên xwe (wehdet’ul-mutleq, wehdetu’ş-şuhûd û wehdetu’l-wucud) bi ayet û hedîsê qewî bike hunera îqtîbasê bi kar anîne.
- 3- Ji bo serkeftina kesayetên ku kurkên rêberîya milletê bi aweyek rewa hildane li ser mile xwe an ji bo medh û pesnê wan bide di helbestê xwe da bi rêya duayê hunera îqtîbasê bi kar anîne.
- 4- Şairan ji bo ku pêsn û wesfên Muhmmmed Pêxember bidin, ji ayet û hedîsên ku behsa wesf û mucizatên wî dikin îqtîbas kirine.
- 5- Helbestvan ji bo dilê xwe ji ber derdê eşqê kovan bike carnan jî ji bo tesellîkirina dilên rêwîyên eşqê ji ayet û hedîsan îqtîbas kirine.

- 6- Helbestvan Ji bo ku bala peyrewên xwe bikişîne li ser tefsîra ayetê hûnera îqtibasê pêk tîne wateya wî yê naguharîne. Di Qur'an û hedîsê da bi çî wateyê hatibe bikaranîn di wî wateyê da tê bi kar anîn.
- 7- Helbestvan carnan hinek ayet an jî hedîsan di wateya wî ya eslî derdixîne û bi awayek mecazî di wateyek din da bi kar tîne.

Wek hevoka dawî ji vê xebata me yê ku li ser hunera îqtîbasa ji lefzê ayet û hedîsê hatîye kirin tête zanîn ku pêwîst e meriv van berhemên tenê bi çavên berhemên helbestên ji rêzê mêze neke, lewra şewqa xwe ji wehyê digirin. Her wiha hewce ye ku bi şiwazên felsefî, civaknasî jî bene tehlîl kirin.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê.
- Bozarşlan, E. *Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, (2005). Stenbol: Weşanên Deng.
- Cevizci, A. (2000) *Felsefe Terimler Sözlüğü*, Stenbol: Weşanên Paradigma.
- Ciwan Mûrad, (1997). *Ehmedê Xanî, Jiyana Berhem û Helbestên Wî*, Stockholm: Weşanên Doz.
- Doru, N. (2012). *Melayê Cizîrî, Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Stenbol: Weşanê Nûbiharê.
- Durre Abdurrahman, (2002). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Avesta.
- e's-Suyûtî, C. (2008), *El-Îtqan Fi-Ulûmi'l-Qura'n*, Beyrut. Darû'r-risale.
- Ehmed Abdu Seyfedin, (2007). *Ferhenga Ronak*, Dimeşq: Darû'z-zaman.
- Ehmedê Xanî, (2012). *Mem û Zîn Ahmed-î Hânî*, Ankara: T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı.

- el-Alusî,(1999) *Ruhu'l-Meanî Fi Tefsîrî'l-Qur'ani'l-'Azîm we Seb'i'l-Mesanî*, Beyrut: Weş. Dar û İhya Et-turasûl- Erebi.
- el-Beydawî Elqadî. (2003). *Enwar û Tenzil we Esrarul Te'wîl*, Beyrut: Darul Kutup el-'ilmîye
- el-Buxarî Ebu E'bdullah Muhammed B. İsmail, (2002). *Sahîh û Buxarî*, Beyrut: Daru İbnû Kesîr
- el-Cezerî, Ebdusselam. (2004). *el-Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwani's-Şeyxî'l Cezerî*, (Amd.: Tehsîn İbrahîm Doskî), Duhok: Weşanxaneya Spîrêz.
- el-Razî Fexruddîn. (2012). *Tefsîru'l Kebir We Mefatîhû'l-Xeyb*, Qahîre: Darul Hedîs.
- en-Newewî, El-İmam, (2003). *Şerhu Sehîh Muslim Li Newewî*, Qahîre Daru İbn Heysem,
- Êsî Mela Hûseyin-Girdarî Mela Seîd- Bêrkevanî: Mela Muhemmed. (2008). *Wergera Qur'ana Pîroz bi Zimanê Kurdî*, Stenbol: Weşanê Bang.
- eş-Şeyx Muhemmed Xwûderî, *Nûru'l Yeqîn Fî Sîretê Seyyîd'ul Mûrselîn*, Beyrût: Weşanên Darûl Merîfe.
- ez-Zemaxşerî Muhammed, B.'U, B. M, *Etwaq û Zeheb Fil Mewaîzî Wel-Xuteb*, Mektebe -Tu Lisani'l Arab, Qahîre.
- ez-Zivingi, Ahmed İbn Mela Muhammed, (2013). *EL-'Iqdu'l-Cewherî Fi Şerhî Dîwani's-Şeyxî'l Cezerî*. Nûbihar: Stenbol.
- ez-Ziwingî, Ehmed Bin Mela Muhemmed, (1958). *EL-'Iqdu'l-Cewherî Fi Şerhî Dîwani's-Şeyxî'l Cezerî*, Qamişlo: Matbaatu Rafideyn.
- İbn Manzûr, (2013). *Lisanu'l-A'rab*, Beyrut: Daru'l- Kutupî'l-İ'lmîye.
- İbnu'l-Arabî, Muhyeddin. (1998). *Futûhâtu'l-Mekkiyye*, c. I-VIII, Beyrut.
- Kemikli, B. (2017). *Türk İslam Edebiyatı Giriş*, Weşanên Emin. Bursa.
- Komisyon, (2017). *Kuran Yolu Türkçe Meal ve Tefsîr*, Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları
- Kurtubî, Muhammed B. Ahmed, (2004), *el-Camiu Li Ahkâmi'l-Kur'ân*, Beyrut.

Mela Ehmedê Zivingî (2013), *Gerdenîya Cewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Amd û Wergera ji Erebî: Emîn Narozi), Stenbol: Avesta.

Mela Mehdî Amedî, (2010). *Beyanu'l-Qur'an bi Zimanê Kurdî*, Diyarbakir: Mektebetû Seyda.

Mela Musa Celalî, (2018). *Feydul Qedîr Şerh Kîtab-i Mem û Zîn*, Stenbol: İhvan Neşrîyat.

Melayê Cizîrî, (2004), *Dîwan*, (Transkrîpt. Arif Zêrevan), Stockholm. Weşanên Nefelê.

Melayê Cizîrî, (2012), *Dîwan*, (Berhevkar: Tehsîn İbrahim Doskî), Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Perwîz Cihanî, (2010). *Mem û Zîn*, Stenbol: Nûbihar.

Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li Ser Pirsên Zaravayê Kurmancî, (2009). Kurmancî, Hejmar 1-40, Avesta.

Sadinî, M.Xalid (2010). *Mela Huseynê Bateyî, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Stenbol: Nûbihar

Sadinî, M.Xalid, (2014). *Feqîyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Septioğlu, Abdulmukit. (2005). *Melayê Cizîrî Divanî'nun Şerhi*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Sönmez N. (2018). *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî*, Diyarbakır: Weşanên Pirtûkxana Seyda.

Sönmez, N. (2018). *Karşılaştırmalı Hitabet-Cahîliye Dönemî İle İlk İslam Dönemi* Stenbol: Weşanên Rağbet.

Şemrexî, Hüseyn, (2009). *Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Teftezanî Sadettîn, *Muxteserûl-Meanî*, Stenbol: Weşanên Pirtûkxaneya Salah Bilici.

Tunç, O. (2008). *Mela Ahmedê Cizîrî, Dîwan*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Yıldırım, K. (2014). *Dîwan, Ehmedê Xanî Külliyyatı: 4*, Stenbol: Weşanên Avestayê.

Yöyler, C. (1992) *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.



JÎYANAME

Di sala 1981an da li gundê Hirîtê ku li ser navçeya Hizana Bidlîsê ye ji dayîk bûye. Dibistana seratayî li heman gundê qedandîye. Perwerdehîya amadeyî li Bidlîsê teman kirîye. Piştê qedandina xwendina medreseyê mekteba bilind beşa îlahîyatê diqedîne. Di sala 2004ê da dest bi melatîya fermî dike. Di vê navberê da di sala 2016ê da ji Zanîngeha Anatolîyayî beşa Civaknasîyê diqedîne. Niha jî li Wanê di Mizgefta Muftî Masum Efendî da melatîya bi resmî dike.

Di asteka bilind da kurdî û ‘erebî heta radekî jî farisî dizane.





VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



21/02/2020

Tez Başlığı / Konusu

İQTİBAS DI EDEBİYATA KURDÎ YA KLASİK DA

(HELBESTÊN MELAYÊ CİZİRÎ, FEQİYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ Û MELAYÊ BATEYÎ)

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 100 sayfalık kısmına ilişkin, 21/02/2020 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 7 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 7 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi inceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içmediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

21/02/2020
Veysi İNCİ
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Veysi İNCİ
Öğrenci No : 17950001018
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

21/02/2020

ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR

21/02/2020

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı